
ROJEV



## "Di Kurdistana serbixwe de jin wê azad bin"

**HUNERMENDÊN** jin ên Kurd di derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de ji Heftenameya Basê re axivîn. Hunermendên jin ên Kurd destnîşan dikin ku jin wê di Kurdistana serbixwe de azad bibin. Hunermendên jin dibêjin, "Bê dewletî bindestî ye, referandûma serxwebûnê dê deriye azadiyê ji Kurdan re veke." **RÛPEL 04**

HUNER



## "Vegera welêt afirandina mûzîkeke nû bû!"

**HUNERMENDÊ** Kurd ê navdar Delîl Dîlanar di derbarê muzîk, film û xebatên xwe de bersiva pirsen me da. Delîl dibêje; "Ez dixwazim bi hunera xwe ji bo gelê Kurd bixebitim. Ji bo rewşa xelkê xwe, bi riya hunerê çi ji destê min bê ez ê bikim û bînim ziman. Dema hunermend girêdayî partiyeke siyasî be nikare ji bo miletê xwe bixebite."**RÛPEL 06**

KIRMANCKÎ




## Qiseykerdişêkê Tarîxî ra Çend Anektodî

**Wa** û birayê mi tu kes yew dewlete û cuyêka azade pêşkêşê ma nêkeno,dîyarî nêkeno. Eke ma eğit ê ma naye ronenê, ma wayîrê ci benê. Muhîm nîyo kam dewlete se vana. Esas muhîm no yo ke miletê kurd çi vano, dayîkê şehîdan, keyeyê pêşmergeyan û pêşmergeyî bi xo çi vanê? Ma wina fikirîyenê. **RÛPEL 13**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ
Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 33
11-17 ÎLON 2017
www.basnews.com

HEVKARIYA KURDISTANIYAN Û ŞOREŞA MEZIN R2

# ŞOREŞA ÎLONÊ BINGEHA SERXWEBÛNÊ

**> ŞOREŞA BI SERKÊŞIYA NEMIR MELE MISTEFA BARZANÎ**

Di dîroka Kurdistanê de, li her çar parçeyan bi dehan caran Kurdan serî hildan û tu caran bindestî qebûl nekirin. Ji wan serhildan, raperîn û xebatên di dîroka Kurdistanê de ku nîşana qebûlnekirina bindestî û daxwaza azadiyê bûn, yek jî jê Şoreşa Mezin ya Îlonê ye ku Nemir Mela Mistefa Barzanî û Partî serkêşiya wê dikir.


**> HER ÇAR BEŞ JÎ BEŞDARÎ ŞOREŞÊ BÛN**

Şoreşa Mezin a Îlonê, 11 Îlona 1961an bi serkêşî û rêbertiya Generel Mele Mistefa Barzaniyê Nemir dest pê kir. Şoreşa Îlonê di dîroka tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê de dirêjtirîn şoreş e ku 14 salan kêşa. Kurdên ji her çar parçeyên Kurdistanê cihê xwe yê di vê qonaxa dîrokî de girtin û beşdarî vê şoreşa niştimanî bûn.

PARLAMENTERÊ ERMENÎ MARKOS:

## Kêmnetew û olên cuda li Kurdistanê qedir dibîn in!

Parlamenterê Ermenî li Parlamentoya Kurdistanê Yurwant Nisan Markos li ser referanduma serxwebûnê ji Heftenameya Basê re axivî. Markos dibêje, Ermenî li Îraqê di asteke kêm de dihatin dîtin û radigihîne ku li Herêma Kurdistanê rewş berovajî vê ye û wiha pê de diçe: "Kêmnetew û olên cuda li Kurdistanê qedir dibînin. Pêkvejiyan her diçe xurttir dibe. Di dahatûyê de em ê li dewleteke demokrat bijîn." Herwiha Markos mînaka dewletbûna Ermeniyan jî dide û dibêje: "Serxwebûn weke Ermeniyan mafê Kurdan e jî."



R3



**EKREM ÖNEN** >02

Referandûm: Ji bo çi welatên ereba bêdeng heta hinekî sergirtî piştgirî û Tirkiye-Îran dijberiyê nîşan didin?



**HOŞENG OSÊ** >03

Öcalan, PKK û "Alewîzim"



**FIRAT CEWERÎ** >06

Em ê bên

ROJHILAT LI SER PIYAN E R07



## Li ser sînor rojane kolberên Kurd tên qetilkirin

Li bajarê Bane yê Rojhilatê Kurdistanê xwepêşandan û meşên girseyî li dijî kuştina kolberan hatibûn organîzekirin, lê rastî êrîşa hêzên ewlehiyê yên Îranê hatin û komek ji welatiyên sivîl birîndar bûn û hejmareke xelkê sivîl jî hatin girtin. Herwiha çalakvanên bajarên Pîranşar, Ormiye, Sine, Serdeşt û Merîwanê jî piştevaniya xwe ji bo hêrsa Baneyiyan nîşan da.

CÎHAN R08




## Lûtkeya hêzên pêş dikevin: BRICS

Lûtkeya BRICS(Brazil, Rusya, Hindistan, Çîn û Afrîqaya Başûr) bi serpereştiya Çînê di 3 - 5ê Îlonê de hat lidarxistin. Lûtkeyê li bajarê Şiamin ya eyaleta Fucien a Çînê 3 rojan berdewam kir. BRICS di van deh salên derbasbûyî de rêjeya aboriya xwe ji sedî 12an, derxist ji sedî 23an. Ev dem weke 'deh salên zêrîn' tê binavkirin.

PROF. DR. SALİH AKIN R12



## Çarenûsa Kurdî bi statuya Kurdan ve girêdayî ye

Zimannas Prof. Dr. Salih Akın ku li Zanîngeha Rouen (Fransa) zimanzan e û bi salan e li zimanê Kurdî xebat û lêkolînan dike û kedeke mezin daye, ji Heftenameya Basê re axivî. Akın dibêje; "Hêvî ev e ku Başûr bibe modelek ji bo siyaseta zimanî ya neteweyî, pêşeroja Kurdî ronî bike. Divê neyê jibîrkirin ku çarenûsa Kurdî bi statuya Kurdan ve girêdayî ye.



**EKREM ÖNEN**

Referandûm: Ji bo çi welatên ereba bêdeng heta hinekî sergirtî piştgirî û Tirkiye-Îran dijberiyê nîşan didin?

Piştî ku Kurdistana Başûr biryara referandûmê aşkere kir bi yek carê Tirkiye û Îranê dijberiya xwe aşkere kirin û ketin nava tevgerekê ku rê li ber referandûmê bigirin. Pêşî raste rast bi kurda re têkilî danîn ku kurda qani bikin da dev ji referandûmê berdin. Ev muhawela wan bi ser neket, paşê fort li kurda kirin ew jî bi ser neket, pişt re xwestin bi rêya DYA û Rûsya nehêlin kurd referandûmê bikin ew jî bi ser neket niha jî Tirkiye û Îran bi xwe li rêyan digerin çawa bikaribin nehêlin referandûm çêbibe. Lê li hember vê helwesta Îran û Tirkiyê helwesta welatên ereb eksî wê ye, hinek welatên ereb bê deng, hinek ji welatên ereba sergirtî piştgiriıyê didin kurda. Li ser vê helwesta welatên ereba serokê herêma Kurdistanê birêz Mesud Barzanî di hefta borî de spasî welatên ereb kir ji ber helwesta wan. Ji bo çi helwesta Tirkiye, Îran û welatên ereba weha ye? Yek jê Tirkiye û Îran herdu perçê Kurdistanê yên mezin dibin destê wan de ye û kirina referandûmê ji xwe re tehdît dibînin ku wê tesîr li perçeyên Kurdistanê ku dibin destê wan de ye bike, her weha dewleteke kurd li herêmê hesabê Tirkiye û Îranê yê geopolîtîk serobinî hev dike. Ji aliyekî din du welatên ereba ku du perçê Kurdistanê dibin destê wan de ye weke dewlet ku niha hene nikarin dewam bikin. Dizanin hew dikarin kurda weke berê dibin destê xwe de bihêlin. Li herêma rojhilata nêzîk, navîn û Cizîra Erebî, ereb herdem û niha jî li faris û tirka weke dijmin dinêrin, tu cara ew ji xwe re dost nehesibandine. Ev weke tradîtsiyonal ku ereb sunî ne û îslam ji xwe re weke îdeolojî bikaranîn û herdem li dijî xelîfeta osmanî ne. Sunî ne û li dijî senteza îslama tirk û şîiyeta farisa ne. Ji alî millî de nasyonalîstên ereb tu caran hikumdariya tirka û farisa li ser welatên ereb qebûl nakin tiştekî din yê girîng jî pirsa mentalîtetê ye, ereb weke millet di mentalîteta wan de tolerans û jiyan bi milletê dervî wan re heye û milletê dervî xwe wek heye qebûl dike û rêzê jê re digire lê li cem tirk û farisa ev mentalîte nîne. Tirk û faris heya ji wan tê dixwazin milletên dervî xwe înkar bikin û wan di nav xwe de bi mehînin. Nasyonalîzma ereb pragmatîk nêzî dewleta Kurdistanê dibe. Ew dihesibîne dewleteke kurd dibe hudûd di navbera wan û tirk û farisan de her weha tirk û farisa li herêmê zeîf dike û tirk û faris li herêmê hew dikarin weke hêzên herêmî li hember ereba tevbigerin. Bi kurtî ereb dihesibînin dewleteke kurd balansa herêmê ser û binî hev dike û vê ya di berjewendiyên xwe de dibînin. Ereb heger ne ji kurda bêhtir bi kêmayî bi qandî kurda xezeba tirk û farisan dizanin. Ereb weke stratejîk kurda ji xwe re alternatîv nabînin bes tirk û farisa ji xwe re alternatîv dibînin. Ji ber wê pragmatîk nêzî pirsa referandûmê dibin. Heger kurd bikaribin vê nakokiyê baş bibînin û bi karibin, siyaseteke bi perspektîve. Pir aşkereye heger ne DYA û Rûsya ba Tirkiye û Îranê wê bi artêşên xwe mudaxeleyî Başûr û Rojavayê Kurdistanê bikirina lê nikarîbûn diyare DYA û Rûsya di bin ebeyê de ço rê Tirkiye û Îranê dan. Beriya demekê hevpeyvîn bi wezîrê derve yê Rûsya Lavrov re hebû li ser referandûmê pirs jê hat kirin, Lavrov got; “Tirkiye û Îran dijberiya referandûmê dikin” Lavrov her weha got; “Referandûm îfada daxwazên milletê kurd e. Em rêzê li îradeya milleta digrin” cihê balkêşiyê ew e ku Lavrov got; “Tirkiye û Îran dijberiya referandûmê dikin” behsa kesekî din nekir. Heta beriya demekê aşkere bû metirsiya kurda ji ber referandûmê hebû ku Tirkiye û Îran dikarin mudaxele bikin. Aşkere bû ku nikarin û rewşa herêmê niha ji bo referandûmê di lehê kurda de ye. Divê kurd netirsin tişta di dest tirk û îraniya de ma ye medya û provakasyona bikin çi li ser navê kurda çi li ser navê îslamê ev jî nikare pêşiya referandûmê bigire. Medya kurd niha divê zimanekî konstruktîv di derbarê nakokiyê nav mala kurda de bi kar bînin divê medya kurd dev ji zimanê dekonstruktîv berde ev ziman kurda perçe dike ji hev dur dixe û dike dijminê hev. Bi ya min kurd niha li medya miqatebin pirsgirêkê din nabin asteng ji referandûmê re. Tenê medya zimanê konstruktîv bi kar bîne û kurda mobîlîzeyî referandûmê bike. Ji ber pir aşkereye niha tirk û iranî gelekî li ser medya dixebitin û heta derecakê tesîrê li medya kurdî jî dikin ku heta ji wan tê di medya kurdî de zimanê dekonstruktîv hakim be da ku kurd li hev nekin û rêjeya erê di referandûmê de kêm bikin. Lê tîr ji kevan derketiye, ne medya û ne jî Tirkiye û Îran nikarin rê li ber referandûmê bigirin. Dinya li pişt kurda ye heger kurd pişta hev bigirin.

Bingeha serxwebûnê

# Şoreşa Îlonê ya Mezin



## Devera Barzan her tim rastî êrişên hov hat

Sala 1932an yekemîn şoreşa Barzan dest pê kir û êdî ji wê salê û pê ve devera Barzan bûye armanca leşkerên hikumeta Iraqê û Îngilîzan. 12 Tîrmeha 1943an Brîtanya û hikûmeta padîşahî ya Iraqê êrişeke hov birin ser devera Barzan û 50 hezar dînar xelat diyar kir bo wan kesên ku karibin Barzaniyê Nemir radest bikin an serê Bazaniyê Nemir ji bo Bexda û hevpeymanê wê Îngîlîzan bibin. Piştî berxwedaneke mezin û bi alîkariya hin têkoşerên hizba Hîwa ku yekemîn hizba siyasî di dîroka Kurdistana Iraqê de ye, malbatên Barzaniyan karîn derbasî bajarê Şîno Rojhilatê Kurdistanê bibin. Piştî ku Barzaniyê Nemir piştî amadekariyên xwe pêkanîn û bi hezaran Pêşmerge li derdora xwe kom kirin, 28ê Tîrmeha 1943an careke din vegeriya devera Barzan û serkêşiya şoreşa duyem a Barzan kir ku di navbera salên 1943-1945an de pêk hat. Di vê heyamê de jî Barzaniyê Nemir karî ku devereke mezin ji herêmê têxe bin kontrola xwe. Lê êrişên hêzên Iraqî ku bi piştevaniya firokeyên şer ên Brîtanyayê pêk dihatin, ranewastiyan û dîsa êriş kirin. Lêbelê ev êrişên hov jî ji aliyê Nemir Mele Mistefa Barzanî û Pêşmergeyên Kurdistanê ve hatin pûçkirin.

NÛRÎ BÊXALÎ - MURAT ÖZDEMIR

Li Herêma Kurdistanê roja 25ê Îlonê ji bo serxwebûnê, referandûm pêk tê û niha amadekarî bi hemû lez û beza xwe berdewam dikin. Heta ku Kurd xwe bigihînin vê asta berbanga serxwebûnê berdelên gelekî giran û xebat û kedeke gelekî mezin hatiye dayîn. Di dîroka Kurdistanê de li her çar parçeyan bi dehan caran Kurdan serî hildan û tu caran bindestî qebûl nekirin. Niha jî xebata miletê Kurd a ji bo azadî û rizgariya xwe berdewam dike û li Herêma Kurdistanê ev xebat hatiye ber ragihandina dewleta serbixwe ya Kurdistanê. Ji wan serhildan, raperîn û xebatên di dîroka Kurdistanê de ku nîşana qebûlnekirina bindestî û daxwaza azadiyê bûn, yek jî jê Şoreşa Mezin ya Îlonê ye ku Nemir Mela Mistefa Barzanî û Partî serkêşiya wê dikir.

**Dirêjtirîn şoreş, di dîroka Kurdistanê de**

Şoreşa Mezin a Îlonê, 11 Îlona 1961an bi serkêşî û rêbertiya Generel Mele Mistefa Barzaniyê Nemir dest pê kir. Şoreşa Îlonê di dîroka tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê de dirêjtirîn şoreş e ku di navbera salên 1961-1975an de, 14 salan kêşa. Kurdên ji her çar parçeyên Kurdistanê cihê xwe yê di vê qonaxa dîrokî de girtin û beşdarî vê şoreşa niştimanî bûn.

**Ji hemû ol, netew û çînan xelkê cihê xwe di şoreşê de girt**

Şoreşeke netewî û niştimanî bû ku tevahiya miletê Kurdistanê bi netewe û ol (Misilman, Mesîhî, Êzidî û Kakeyî) û çîn û texên, bi rewşenbîr û hunermend, bi cotkar û xwendekar, bi jin û mêr, bi êl û eşîr û bi serkirdayetî û rêbertiya Barzaniyê Nemir, tevlî şoreşê bûn.

Şoreşa Îlonê yekemîn şoreşa Kurdan e di dîrokê de ku karî sê caran li pey hev hikûmet û desthilatdariya Bexdayê neçar bike ku danûstandin û guftugoyan di gel kurdan bike. Herwiha du Serokkomarên Iraqê neçar kirin ku ji bo guftugoyan li gel serkirdayetiya şoreşê bikin, bên devera şoreşê. Yekemîn şoreş û yekemîn serkirdayê Kurdan e ku di dema şoreşê de qet û qet neçû paytexta Iraqê û di bin alaya Iraqê de digel desthilatdar û hikûmranên dagirker rûnenişt.

**Pêşdebirina civakê jî taybetmendiyeke şoreşê bû**

Şoreşa Îlonê xwedî gelek taybetmendiyan e ku yek ji van jî ew e; Ev şoreş 14 salan berdewam kir û li hember jî dewleta dagirker jî dest bi karên kirêt û hov kir. Ku di vê heyamê de Barzaniyê Nemir û Îdrîs Barzanî ji aliyê sazî û dezgehên dewletê yên ewlehî û îstîxbaratî de armanc hatin girtin. Herwiha digel xebata çekdarî, mil bi milê xebata siyasî û pêşmergeyatî di vê heyama şoreşê de girîngiyeke mezin ji bo xwendin, zanîn û pêşdebirina rewşa civakî berê xelkê xwe bide xwendinê û zaningehan veke.

Yekemîn şoreşa Kurdan e ku rastî zêdetirîn xiyanetê hat, lêbelê bi hêz û yekgirtina xwe dev ji têkoşîna xwe berneda û domand. Di heman demê de di dîroka Kurdan de yekemîn şoreş e ku karî desthilata dagirger neçar bike ku dayîna mafên Kurdan û bi awayekî yasayî û bi rêya rêkeftineke dîrokî ku 11ê Adara 1970an pêk hat, otonomiyê bo Kurdistanê bistîne.

**Têkoşîn ji lokaliyê derdikeve**

Eger di dîroka Kurdistanê de rûdaneke girîng ji aliyê siyasî û civakî ve hebe, Şoreşa Îlonê yek ji wan rûdanên girîng û dîrokî ye. Wê şoreşê karî Kurdbûna Kurdan di çarçoveya hizr û ramaneke nasyonalîstî ya modern de formûle bike. Yanê em dikarin bêjin ku Şoreşa Îlonê di bingeha xwe de manîfestoya Kurdbûnê ye ku karî têkoşîna Kurdan a lokalî bike tevgereke Kurdistanî.

Şoreşa Îlonê bi serkêşiya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û bi rêbertiya Nemir Mele Mistefa Barzanî bi xesletên xwe yên gelêrî û niştimanî, despêkeke mezin, şoreşgerî û derbaskirinê bû, bo qonaxa hestên netewî û herwiha ji bo hizr û ramanên kurên niştiman û netewî û careke din xwedîderketin li nasnameya Kurdbûnê.

Barzaniyê Nemir ji malbateke diyar a Kurdan û ji devereke berniyas a Kurdistanê ye ku di dîroka Kurdistanê de roleke mezin lîstiye, lê Nemir Mele Mistefa Barzanî bi ramanên xwe yên netewî û niştimanî, bi pişkdariya gelêrî di şoreşê de, kirina her devereke Kurdistanê bo sengerê şoreşê û çeperên Pêşmerge, karî ku bibe semboleke netewî, niştimanî û pênasê Kurdiniyê.

**Şoreşa Mezin a Îlonê û destkeftên wê**

Ji hevdû cudakirna kar û xebatên hîzbî û leşkerî û medenî di sînorê şoreş û navçeyên azadkirî de. -Pêkînana encûmenên yasadanan û rêvebirin, mîna pêngavek ji bo bi sîstematîkkirina karê deshilatdarî û hukmiraniyê di navçeyên şoreşê de. -Damezirandina dadgeha bala ya tawanan ku bikare kêşe û arêşeyên xelkê di bin sîbera şoreşê de bi awayekî yasayî û dadwerî bên çareserkirin. -Vekirina xwandingehan bi zimanê Kurdî, ji qonaxa seretayî heta zanînegehê û giringîdayîn bo proseya perwerde û fêrkirinê. -Pêşvebirna bizav û çalakiyên rewşenbîrî, hunerî û edebî yên Kurdî. -Avakirina sîstemeke saxlemî û giringîdan bi rewşa saxlemî. -Teqekezkirin li ser maf û daxwazên wan netew û olên ku li Kurdistanê dijîn û pişkdarî di şoreşê de kiribûn. Yanê parastina nasnameya nîştmanî û demokratî ya şoreşê.

Xurtkirina peywendî û têkelîyên siyasî û dîplomasî di navbera şoreşa Kurdistanê û dewletên dost û tevgerên siyasî û demokrat ên herêmê û cîhanê de. An ku bûna siyaseteke dîplomasî ya bihêz ligel cîhanê. -Damezrandina saziyên xwendinê, ciwanan û jnan û herwiha giringîdan bi çalakî û tevgera medenî û cemawerî. -Pêdana rol û berpirsyarî yên mezin bi têkoşerên wan ol pêkhateyên cuda yên Kurdistanê ku cihê xwe di şoreşê de girtibûn. -Xurtkirin û mikumkirina têkilî û peywendiyên di navbera şoreşê û hêz, alî û cemawerên parçeyên din ên Kurdistanê de. -Ji bo ku şoreşa Îlonê şoreşeke nîştmanî û demokrat bû, bawerî bi pêkvejiyan, wekhevî û hevxebata demokratî hebû, derên xwe li ber hemû hêzên demokrat û azadîxwaz yên Iraqê vekir ku di bin sîbera şoreş û li navçeyên azadkirî yên Kurdistanê, xebatên xwe bidomînin.

Zêdebarî hewlên hikumeta Iraqê ji bo çêkirina nakokiyên netewî di navbera şoreş û xelkê Iraqê de, lê bi hîkmeta Barzaniyê Nemir û prensîpên şoreşgerî, şoreşa Îlonê karî ti gavan xebat û têkoşîna xwe neke sedema şerekî netewî di navbera Kurd û Ereban de. Şoreş li ser hêla nîştmanî û demokratî û bi daxwaza aştiyê domand. Ev yek jî bû çand û sermayeke mezin ji bo Kurdan û heta niha jî pê şanaz in. -Nemir Mela Mistefa Barzanî ku rêbertiya wê şoreşa mezin dikir, lê tevî xebata pêşmergayetî û şerê çekdarî li hember zilm û zordariya hikumeta Iraqê, lê ti gavan derî li ber guftugo û danûstandinên aştiyê negirt. Ji ber vê yekê jî hikumeta Iraqê şandeyên xwe ji bo deverên şoreşê bi rê dikir bêyî ku yek carê jî Barzaniyê Nemir biçe bexdayê.

**Dîrokeke tijî bi serhildan û raperînan**

Piştî derbasbûna 56 sal bi ser Şoreşa Îlonê de, pêdivî pê heye ku em berê xwe bidin dîroka rabûn, serhildan, raperîn û rizgarîxwaziya Kurdan a li Herêma Kurdistanê.

Piştî herifîna Împaratoriya Osmanî di sala 1918an de û bi avakirina wîlayeta Mûsil û li her sê wîlayetên Mûsil, Bexda û Besrayê dewleteke nû bi navê ‘Iraq’ê hat avakirin. Di vê bûyerê de gelek ji bo Kurdan hatin dayîn, ji bo naskirina mafên wan ên netewî û niştimanî. Lê li gor berjewendiyên dewletên mezin, bi rêkeftina Lozanê ew xewn û hêviya Kurdan hat jinavbirin û herwiha Brîtanyayê li gor berjewendiyên xwe Iraq weke welatekî padîşahî hat damezirandin. Sala 1921an Melîk Feysel bi fermî bû melîkê Iraqê û Kurd jî bi zorê di nav vê dewleta nû de hatin hiştin.

Şêx Mehmudê Hefîd sala 1919an û her di destpêka wan qomployên navdewletî de, dest bi serhildan û şoreşê kir. Di wê demê de, Şêx Ehmedê Barzan hêzeke Barzaniyan bi serkirdayetiya Barzaniyê Nemir ji bo piştevaniya şoreşa Şêx Mehmûd rê kir ji bo Silêmaniyê û di sala 1922an dewleteke serbixwe ragihand.

Nemir Mela Mistefa Barzanî di navbera salên 1900–1921 de digel hêzên xwe bo Tirkiyê di hawara padîşayê Ermenyan (Endirîk) çû û karîn Endirîk û malbata wî û hejmareke zêde ji Ermenyan ji komkujiyên wê demê rizgar bikin û ew gihandin Sûriyê. Piştî vegera wê hêzê û heta ku gihiştin sînorê Zaxo, 14 Pêşmergeyên wî şehîd bûn.

Şoreşeke netewî û niştimanî bû ku tevahiya miletê Kurdistanê bi netewe û ol (Misilman, Mesîhî, Êzidî û Kakeyî) û çîn û texên, bi rewşenbîr û hunermend, bi cotkar û xwendekar, bi jin û mêr, bi êl û eşîr û bi serkirdayetî û rêbertiya Barzaniyê Nemir, tevlî şoreşê bûn.

## Rola Barzaniyê Nemir di damezirandina Komara Kurdistanê de

Nemir Mela Mistefa Barzanî roleke mezin di avakirina Komara Demokrat a Kurdistanê de li Mahabadê ku bi serokatiya Qazî Mihemed hat avakirin, leyîst. Herwiha 16ê Tebaxa 1946an Partiya Demokrat a Kurdistanê damezirand û ev partî bû çavkaniya xebat û hêviya Kurdan.

Piştî ku Komara Kurdistanê ya sava hat rûxandin, Barzaniyê Nemir tevî 500 Pêşmergeyên xwe 18ê Hezîrana 1947an di nav şer û pevçûnên dijwar de bi hêzên Iraq, Îran û Tirkiyê re, derbasî axa Yekitiya Sowyetê bû. Piştî mana 11 salan li Yekitiya Sowyetê, ku di wê demê de kudeta bi ser hikûmeta paşayetî ya Iraqê de hat û hikûmeta Komarî hat avakirin, li ser daxwaza hikûmeta nû ya Iraqê 6ê Cotmeha 1958an Barzaniyê Nemir digel hevalên xwe weke qehreman û serkirdeyekî niştimanî vegeriya welat û li Besrayê ji aliyê xelkên Iraqê ve bi coş û bi kelecaneke mezin hat pêşwazîkirin.



## Her çar parçeyên Kurdistanê beşdarî Şoreşê bûn

Tevî ku di destûra nû ya Iraqê de nemaze jî di benda 3an de mafên Kurdan hatin çepisandin, di demeke kurt de hikûmeta Iraqê ji soz û belenên xwe vegeriya û çalakiyên siyasî yên Partiya Demokrat a Kurdistanê rawestandin. Piştî wê jî bi fermî biryara hilweşandina vê hizba niştimanî ya Kurdan hat dayîn û hikûmeta Iraqê ket nav dijminatiya daxwaz û mafên Kurdan. Ji ber wê yekê jî nemir Mele Mistefa Barzanî û rêhevalên wî neçar man ku xebat û çalakiyên xwe yên siyasî bi nehênî berdewam bikin. Di pey re hikûmeta Iraqê roj bi roj fişar li ser Kurdan zêde kirin û êrişî Kurdistanê kir. Barzaniyê Nemir û Partî neçar man ku êdî bikevin nav şoreş û berxwedanê. Yekem pêla agir ya Şoreşa Îlonê jî bi fermî 11ê Îlona 1961an li Zaxoyê dest pê kir û piştî wê belavî seranserê Kurdistanê bû, Kurdên her çar parçeyên Kurdistanê beşdarî şoreşê bûn û mil bi milê Nemir Barzanî û hêzên Pêşmerge cihê xwe yê li gel şoreşê girtin ku niha di encama wê têkoşîn û berdelên giran de Herêma Kurdistanê ber bi serxwebûnê ve diçe.

Şoreşa Îlonê xwedî gelek taybetmendiyan e ku yek ji van jî ew e; Ev şoreş 14 salan berdewam kir. Herwiha digel xebata çekdarî, mil bi milê xebata siyasî û pêşmergeyatî di vê heyama şoreşê de girîngiyeke mezin ji bo xwendin, zanîn û pêşdebirina rewşa civakî berê xelkê xwe bide xwendinê û zaningehan veke.

Parlementerê Ermenî li Parlementoya Kurdistanê:

# Kêmnetew û olên cuda li Kurdistanê qedir dibînin!





"Dewleta serbixwe ya Kurdistanê dê nebe dewleteke tundrew a Îslamî ku Ermenî xwe jê biparêzin. Kêmnetew û olên cuda li Kurdistanê qedir dibînin. Pêkvejiyan her diçe xurttir dibe."

**KARZAN SEBAH HEWRAMÎ**

Li Herêma Kurdistanê ji bo roja pêkanîna referandûma serxwebûnê rojên jimartî man. Amadebaşiyên bo referandûmê bê rawestan didomin û him siyasetmedar him jî gel di wê baweriyê de ye ku dê dengên 'Erê' serbikevin. Di vê çarçoveyê de em bi parlementerê Ermenî yê Kurdistanê Yurwant Nisan Markos re li ser referandûm, helwesta Ermeniyan û kêmneteweyên ku li Herêma Kurdistanê dijîn çi hêviyan ji Kurdistanê dikin axivîn. Markos dibêje Ermenî li Iraqê di asteke kêm de dihatin dîtin û axaftina xwe wiha didomîne: "Lê belê li Herêma Kurdistanê rewş berovajî vê ye. Kêmnetew û olên cuda li Kurdistanê qedir dibînin. Pêkvejiyan her diçe xurttir dibe. Di dahatûyê de em ê li dewleteke weke Almanya bijîn, ne dewleteke tundrew a Îslamî." Markos mînaka dewletbûna Ermeniyan dide û dibêje: "Serxwebûn weke Ermeniyan mafê Kurdan e jî."

Karzan Sebah Hewramî

**Demeke kurt ji referandûmê re ma. Hûn weke Ermeniyên li Herêma Kurdistanê dijîn referandûmê çawa dinirxînin. Iraqî qala yekpariya Iraqê û pêkvejiyanê dikin. Li gor we çareseriya bi Iraqê re pêkan e?**

Em weke pêkhateyên Ermenî piştgiriya referandûmê dikin. Ji ber ku di sala 1915an de Osmaniyan li hember Ermeniyan jenosîd pêk anî. Kurd jî weke me di gelek komkujî û qeyranan re derbas bûn; weke Helepçe, Enfal û karesata 2014an a Şingalê. Ji ber wê jî çawa mafê Ermeniyan ê dewletbûnê hebe wisa yê Kurdan jî heye ku bibin xwedî dewlet. Herwiha Herêma Kurdistanê cihê pêkvejiyana Ermenî, Xirîstiyan, Kurd, Aşûrî û Tirkmenan e. Niha rast e em li Iraqê ne û Iraqê jî fikra Îslamiyetê weke bingeh bi fermî ji xwe re hilbijartiye. Rewşa olên cuda û kêmetewan ne diyar e. Kurdistana ku wê bê avakirin divê nebe kopyaya Iraqê. Em niha doza azadî û filitina yasayên heyî dikin. Em doza Kurdistana serbixwe dikin. Dema serxwebûn hat ragihandin bêyî cudahî hemû pêkhate em ê di bin sîwaneke hevpar de ligel hev bijîn. Dema Kurdistana serbixwe hat ragihandin dê pêkhateyên Kurdistanê jî weke hemû hemwelatiyên Kurdistanê bi awayekî azad bijîn.

**Li gor we dema dewleta Kurdistanê hatiye?**

Dewletbûn biryareke ku wê tu carî poşmanî jê çêne be ye. Xebatên ji bo vê û amadekariyên referandûmê dest pê kirin. Gelê li Herêma Kurdistanê dijî jî piştgiriya vê yekê dike. Berê li herêmê tenê Fransa û Brîtanya hebûn, niha Rusya û DYA jî hene. Denklem guherî êdî. Berê Sykes- Picot hebû. Lê belê ev xeta sor û hemû rêkeftinên berê hatibûn kirin têk çûn, rewş hate guhertin. Yek ji encamên van guhertinan jî referandûm e. Li hêrêmê guhertinên mezin rû didin. Di dahatûyê de jî wê gelek guhertin çê bibin. Em nizanin dê çawa nexş biguherin. Lê di vê proseyê de ya girîng ew e ku em biryara çawaniya qedera xwe bi destên xwe bidin. Guherînên li herêmê ji bo me fersendên zêrîn in.

**Têkiliyên we yên dîplomatîk li gel Ermenistanê hene. Helwesta Ermenistanê li hember referandûm û serxwebûna Kurdan çawa ye? Dema serxwebûn were ragihandin dê Kurdistanê binasin?**

Bi rastî dema Herêma Kurdistanê bibe dewlet kes nikare li hember derkeve. Ermenistan dema girêdayî Yekîtiya Sowyetê bû jî baş dinirxand, niha jî baş dinirxîne, dê di dahatûyê de jî baş be. Ji ber ku dewleta Kurdistanê ne dewleteke Îslamî ya tundrew e ku xwe jê biparêzin an jî bitirsin. Weke Almanyayê dewleteke azad û xwedî pirnetew e. Ji ber vê yekê jî divê miameleya li hember wê asayî be. Helwesta Kurdistanê li hember Ermeniyan wisa baş be ji bo Îran, Tirkiye û Iraqê jî dê baş be. Em Kurdistaneke ku ne kopyaya tu dewletî ye dixwazin. Nabe ku weke kopyaya Iraqê li Herêma Kurdistanê bê nêrîn

**Hûn li Iraqê bi kîjan pirsgirêkan re rû bi rû dimînin?**

Çend caran ez çûm gel Emar Hekîm û serkirdeyên Şie yên din û ji min re gotin ku em we weke neteweke cuda nabînin. Li Bexdaya ku li gor Şîeyan yasayên wê hatine amadekirin Xirîstiyan nikarin bi awayekî azad bijîn. Otorîteya Îslamî li ser Iraqê hukimran e. Ev jî pergalê bêxêr dike. Ji dêvla saziyên dewletê ve saziyên olî biryar didin. Lê belê li Herêma Kurdistanê rewş berovajî vê ye. Kêmnetew û olên cuda li Kurdistanê qedir dibînin. Pêkvejiyan her diçe xurttir dibe. Li Iraqê bi navê demokrasiyê tu tişt nemaye. Hemû Xirîstiyan berê xwe didin Herêma Kurdistanê. Hemû penaber jî her wisa. Garantiya ku kesên xwedî ol û netewên cuda ne li Iraqê careke din neyên qetil kirin tune ye. Ji ber van tiştan em jî jiyana li gel Iraqê ne razî ne.

**Çima li Iraqê pêkvejiyan pêk nayê li gor we?**

Li Iraqê kesayet mafên xwe yên nasnameyê winda dikin. Piştî hilweşandina Sedam hemû îktîdarên Iraqê ji dêvla parastina kesayetan, xebata parastina siyasetmedaran kirine. Kesayetan bê wate dikin da ku nefikirin. Bi yasayên ku derdixin jî bingeha jiyanê tune dikin. Li gor me pêkhate naxwazin di bin sîwana Bingeha Destûrî ya Iraqê de bijîn. Di vê çarçoveyê de mayîna me li gel Iraqê bê wate ye.

**Gelo hêviyên we ji Dewleta Kurdistanê çi ne?**

Em dixwazin bibin hemwelatî. Em naxwazin bibin welatiyên di asteke kêm de. Ji ber ku em ê di dahatûyê de li Kurdistaneke demokratîk weke Almanya ku ji hemû kêmnetewan re rêzê digire de bijîn. Dê ne dewleteke tundrew a Îslamî be.

## Rola Suneyan li Iraqê çi ye? Ew jî weke Kurdistanê dewleteke serbixwe an jî herêmeke federal dixwazin?

Iraq wê di dahatûyê de bibe sê beş. Kurdistan, Herêma Sune û Herêma Şîe. Mixabin Suneyan fersenda dewletbûnê winda kirin. Dema DAIŞ derket holê gotin ku dewleta Suneyan derdikeve holê. Eger DAIŞ ne terorîst û zorbedar bûya, karekî medenî birêve bibira dê li herêmê ev tişt rû nedana. Ji ber vê yekê jî DAIŞê fersenda dewletbûna Suneyan ji holê rakir. Ev çend sal e jî Şîe li Iraqê hikûmran in. Şîe di wê baweriyê de ne ku dema Suneyan birêvebir dabeşbûn di navbera wan de pêk nehatibe, di birêvebirina Şîeyan de jî dabeşbûn nabe. Ew fersenda niha li ber me ye Suneyan winda kir, divê em winda nekin. Sune jî niha dewletbûna Kurdistanê dixwazin û diparêzin. Ji ber ku Kurdistan him Sune ye him jî dê bibe dewleteke demokratîk û cîranekî baş ê Iraqê. Dê alîkariyan bike di wê baweriyê de ne. Sûne dikarin di çarçoveya cîrantiyê de danûstandina li gel Kurdistanê xurt bikin û ji tecrûbeyên Kurdistanê ders bistînin. Bi vî awayî dikarin li ser piyên xwe bimînin.

Li gor we Bexda ji ber çi mafê pêkhateyan nade?

Niha cudahî di navbera alîkariya gel bi mantiqa demokratîk û bi mantiqa dîktatoriyê de heye. Bexda destê xwe avêtiye qirika gelê li Herêma Kurdistanê dijî û budçe biriye. Mûçeyên Pêşmergeyan nade. Berpirsyerên têne Herêma Kurdistanê bersiva çareserkirina van tiştan nadin. Ebadî hat lê xeletiyên Malikî sererast nekirin. Tekane hişmendî heye ku Iraqê birêve dibe, ew jî xeternak e. Îro qet garantî tune ye ku kiryarên ku hatine kirin sibê dê neyên kirin. Dibêjin li gel me bimînin wê qet pirsgirêkên we çênebin. Lê divê em ji bîr nekin tu tiştek tune ye ku Iraq ji me re bike.

Hûn dahatûya Iraqê çawa dibînin?

Zehmet e Iraq careke din bibe dewleteke bipergal û rêkûpêk. Niha Şîe bi Şîe re û Şîe bi Sûne re di rikberiyê de ne. Projeyên ji bo gel nehatin kirin. Pere ji bo gel nehatin bikaranîn. Dê tiştên ne baş ji bo Iraqê rû bidin ne tiştên baş. Lê em ê dîsa jî ji bo Iraqê bibin cîranekî baş. Lê niha di nav Iraqê de şerê navxweyî heye zehmet e em bi hev re bijîn.



## Hûn çawa li wan kesên li Herêma Kurdistanê ji referandûmê re dibêjin 'na' dinêrin?

Ev tişta tê kirin qet ne tiştekî baş e. Divê tu partî di mijareke neteweyî de dijberiyê neke. Diviyabû niha dijberiya serxwebûnê nehata kirin û berovajî vê divê festîvalên mezin ên serxwebûnê bihatana kirin. Ev mijara neteweyî ji bo dahatû û qedera Herêma Kurdistanê di asta herî bilind de girîng e. Divê dijberiya vê neyê kirin. Ji ber hinde jî divê di navbera xwe de danûstandinan bikin.

Li gor te çima Bexda ji referandûm û serxwebûnê wisa bi hizûr e?

Fikra Erebî li ser gelê Iraqê û pêkhateyan bi rijd bû. Aliyên siyasî ji serxwebûna Herêma Kurdistanê ditirsin. Ew wisa dihesibînin ku vê yekê bikin ew ê bikevin nav îxanetê. Ji siyaset û mantiqa berê ya seqet niha jî ditirsin. Ligel vê jî metirsiya wan a eger Kurdistan bibe dewleteke serbixwe dê Iraq bibe dewleteke Şîa. Ji ber ku rêjeya Şîeyan li Iraqê ji sedî 34 e. Eger Herêma Kurdistanê bibe dewleteke serbixwe dê ev rêje bibe sedî 70. Yanê êdî bi navê Iraqê tiştek namîne. Civaka navdewletî jî wiha dinêre. Dahatûya qedera Iraqê ne diyar e. Eşîrên Sune li gel dewletbûna Herêma Kurdistanê ne. Herî zêde jî parlementerên wan ji bo serxwebûnê dixebitin. Dizanin dê dewleta Kurdistanê alîkariya wan bike. Ew jî dizanin ku tu xêra Şîeyan ji wan re tune ye.

Li gor we dê encama referandûmê çi be?

Wê ji sedî 70ê dengên 'Erê' derkevin. Ev rêje pir girîng e. Dema em civaka navdewletî bigirin ber çavan, divê ne di bin vê rêjeyê de be. Wisa tê texmînkirin ku dê ji vê rêjeyê jî zêdetir be dengên 'Erê'. Gel ji ber referandûmê pir bi kelecan e. Lê li Silêmaniyê dengên 'Na' hene. Ev yek jî divê bi aktîfkirina parlementoyê bê çareserkirin.

"Dema serxwebûn hat ragihandin bêyî cudahî hemû pêkhate em ê di bin sîwaneke hevpar de li gel hev bijîn. Dema Kurdistana serbixwe hat ragihandin dê pêkhateyên Kurdistanê jî weke hemû hemwelatiyên Kurdistanê bi awayekî azad bijîn."

**HOŞENG OSÊ**

## Öcalan, PKK û "Alewîzim"



Di roja 22.11.2016an de min gotarek bi sernivîsa "PKK û Kurdên Sûrî û Alewîzima Siyasî" nivîsand û di rojnameya "El-heyat" ku girîngtirîn rojnameya ereban e, hate belav kirin. Di wê nivîsê de hin pirs di derbarê rewş, peywendî, hevbendiyên PKKê bi rejîmên Şam û Tahranê re û gelo çiqas rol û bandora girseya alewî ya PKKê li ser van têkilî û hevbendiyan heye? Min hewlda van pirsa bilivînim û ji bo lêgerîna bersiva, ez piçekî vegeriyam dîroka alewiyan di serdema osmaniyan û serdema damezirandina komara Tirkiyê. Pêve girêdayî, ez vegeriyam rewşa tevgera çepgiriya tirk û her wisa heta ez gihiştim dîroka PKKê û hin belgeyên wê rêxistinê. Ango, min hewlda ku pirs û gotinên min bi infirmasyon û belge bin. Di wê nivîs de, dema vegeriyam kongreya 1mîn a PKKê min dît ku nêzîkî nîvî damezrênera alewî bûn. Mînak: Kesîre Yildirim (hevjîna berê a Öcalan), Sakîne Cansiz, Alî Haydar Kaytan, Mazlûm Doğan, Mustafa Karasu, Mehmet Karasungur, Mehmet Hayrî Durmuş, Çetîn Güngör (Semîr), Şahîn Dönmez, Yildirim Merkît...hwd. her wisa tirk jî hebûn: Kemal Pîr, Duran Kalkan. Min di wê nivîsê de got ku niha jî di nava PKK-HDPê de girseya alewî xurt û berbiçave û ne mumkine bandor û rola vê girseyê li ser biryara siyasî a PKKê tune be.

Biraderen Apociyên Sûriyê, ango PYDcî, dînbûn dema wê nivîsê dîtin û xwendin, tu dijûn û gotinên kirêt û pîs nema ji min re ne gotin, weke: Xayîn, xewfiroş, Erdoğancî, AKPcî, DAIŞçî, bênamûs, bêşeref...hwd. ev birader, piçek jî xwe ne êşandin ku bi şêweyekî zanistî û bi belgeyan bersiva nivîs û pirsên min bidin.

Dîsa jî min hewlda ez berê van camêra bidim bersivên zanistî û bi belge gotareke din bi sernivîsa "PKK û Alewîzma Siyasî" di rojnameya El-heyatê roja 11.04.2017an de min nivîsand û belav kir. Di wê nivîsê de jî, min hin pirsên nû livandin û dan pêş, weke: 1- Mana Mustafa Karasu (alewî ye) berpirsê ragihandin û medya PKKê ji salên 2003an heta 2017an tê çi wateyê? Dema Riza Altun (alewî ye) berpirsê aborî, darayî û têkiliyên derve be û Besê Hozat (alewî ye) ku hevseroka KCKê di gel Cemîl Bayik be, ev tê çi wate yê? Ne tenê wisa jî, ez vegeriyam rojnameya navendî a PKKê, "Serxwebûn"ê ku ji sala 1982an û heta sala 2010an tu nivîs, gotar, lêkolîn, nûçe li ser alewiyan belav nekiriye. Lê piştî nîsana 2012an û vir de, êdî "Serxwebûn" nivîs û lêkolînên berfireh li ser civak û nasnameya olî, tayîfî û mezhebî a alewiyan belav dike, îja ma ne qaşo PKK partiyeke çepgir û laîk e, çi îşê wê ji çîrok û çîrvanokên mezhebî, olî û tayîfî heye?

Dîsa derûdorên PYD-PKKê jibilî dijûn û gotinên kirêt, tu bersivên bi raman û belge nedan.

Baş e, dibe ku ez şaş bim û "hewl didim PKKê reş bikim" weke ku PYDcî li ser min dibêjin û belav dikin, de ka werin binêrin birêz Öcalan; serokê PKKê û "Rêberê Gelê Kurd" bê çi dibêje? Öcalan di roja 1ê hezîrana 2011an de, bi rêya parêzerên xwe, daxwiyaniyeke girîng da, tê de dibêje: "Hûn dizanin ku ne lihevkirin û ji hevqutbûna di nav mislimanan de çêdibe û hîna lapê pêxember Muhemmed li orte ye û ne hatiye binaxkirin. Ango pevçûna di navbera îslama deshilatdariyê û seltenetê û îslama rast û dirust, ango îslama "Medînê" de çê dibe. Ev nakokî û pevçûn di navbera têgeha Emewî a seltenetê ku gelek baş xwe veşartiye û di navbera misilmanên resen û dilsoz bi serokatiya Hezretî Alî, çêbûye. Wan neviyên pêxember Muhemmed ku li ber dilê wî gelek şêrîn in, kuştine. Hezretî Huseyin bi şêweyekî herî hovane kuştin..."

Baş e, berpirs û hevalên PKK-PYDê vê nêrîn û daxwiyaniyê çawa fêm dikin? Jixwe napirsin; çi îşê me bi pevçûna di navbera ola îslamê a berî 1400 salî çêbûye, heye? Em weke partiyeke laîk û çepgir, çi îşê me bi naskirina gelo kê/kî rast e? Kî/kê ne rast e; Alî? yan Mûawiye, heye? Ma gelo bi serê Öcalan û PKKê ketiye bêje: Îslama rast û dirust a Alî ye, ne a Ebûbekir e, Omer û Osman bin Effan e. Çima "serokê gelê kurd" xwe nêzîkî şiya û alewiya dibîne? Ev çi çepgirî û laîkîzme ku xwe dispêre çîroka mezhebî û tayifeyeke olî-îslamî?

Baş e, dema Öcalan Hezretî Alî rast dibîne û Ebûbekir, Omer, Osman û Mûawiye sexte û deshilathez dibîne û xwe dixe nava vê gerîneka olî û mezhebî, ma gelo Öcalan şêx e? Yan oldar e, fetwa bide; kî rast e? Kî ne rast e? Eger biraderên PYD-PKK bi wêrekî û belge bersiva van pirsa bidin, wê çaxê dê têbighêjên û baş fêmbikin; çima PKK-PYDê ji 2011an û vir de piştgirî û hevkariya rejîma Esed dike.

Hunermendên jin ên Kurd:

# Di Kurdistana serbixwe de jin wê azad bin

CESIM İLHAN

Hunermendên jin ên Kurd di derheqê referandûma serxwebûnê ya Herêma Kurdistanê de ji Heftenameya Basê re axivîn. Hunermendên jin ên Kurd destnîşan kirin ku jin wê di Kurdistana serbixwe de azad bibin. Hunermendên jin dibêjin, "Bê dewletî bindestî ye, referandûma serxwebûnê dê deriyê azadiyê ji Kurdan re veke."

Her wisa hunermendên jin li hember daxuyaniya RJAK'a ku saziya KCK a jinan a li Herêma Kurdistanê ye ku di daxuyaniya xwe de gotibû "Avakirina dewletê qirkirina fermî ya jinê ye û emê ji referandûmê re bêjin na." bertek nîşan dan

**"Yên ku Kurdistana serbixwe naxwazin bila ji xwe re nebêjin em Kurd in"**

Hunermend Gulistan Perwer dibêje "Divê sed sal berê dewleta Kurdan ava bibûya" û wiha diaxive, "Ez dikevim şikê ku ev kesên ji xwe re dibêjin Kurd dewletbûna Kurdan erênî nabînin. Hemû miletên cîhanê bûn xwediyê dewletan. Divê dewleta Kurd beriya sed salan bihata avakirin lê ava nebû. Sedema hemû bobelatên ku hatine serê Kurdan ji ber bê dewletî ye. Mafê Kurdan heye ku mîna hemû miletan bibe xwedan dewlet. Em ne miletekî bê fam in, dikarin xwe bi rê ve bibin, bila êdî tu kes me bi rê ve nebe."

Perwerê wiha bertek nîşanî daxuyaniya RJAKê ku di daxuyaniya xwe ya derheqê referandûmê de gotibû, "Avakirina dewletê qirqirina fermî a jinan e û emê referandûmê re bibêjin na." da; "Ez bi daxuyaniya wan jinan dikenim. Madem dewletbûn tiştekî ne baş e nexwe çima li hemû cihanê dewlet hene? Ez fam nakim çima daxuyaniyeke wisa dane. Ev daxuyanî, ne daxuyaniyeke dostanî ye.

Yên ku dewleta Kurdan naxwazin bila li ser navê Kurdan îdiaya sîyasetî jî nekin. Bi dewletbûnê re mirov dibe xwedan pergal. Ger tu pergala xwe ava nekî dewleteke din te tune dike. Ez wisa bawer dikim ku wê di dewleta Kurdistanê de, hemû milet bextewar û jin jî wê azad bin."

**"Êdî bes e ev qas bindestî!"**

Hunermenda Kurd a Ermen Aslîqa Qadir jî diyar dike ku wê referandûm ji Kurdan re deriyê azadiyê veke. Qadira ku dibêje, "Êdî bes e evqas bindestî " axaftina xwe wiha didomîne: "Dijminên me dixwazin me ji her tiştî bêpar bihêlin. Niha fersendeke wisa ketiye destê me, divê em bi awayekî xurt piştgiriyê bidin referandûmê. Jinên me ne azad in, jinên me incax di dewleta xwe ya serbixwe de dikarin azad bijîn. Ev tişt ji bo me wek nan û namûsê ferz e. Divê em her tiştî deynin aliyekî û bi netewî bifikirin. Referandûm bo me deriyê azadiyê ye. Ev ne referandûmeke ji rêzê ye, referandûma serxwebûnê ye. Divê herkes piştgiriyê bide referandûm û serxwebûnê. Em her carî hatin qetilkirin û hebûna me hat tunekirin. Her kî piştgiriyê nede referandûmê ev ne ji me ye, ev ne Kurd e. Xizmeta dijminê Kurdan dike. Ji ser Barzanî re referandûmê rexne dikin. Xwedê neke Barzanî îro heye sibê tune ye. Lê Kurdistan wê her hebe."

Nilüfer Akbal jî dibêje, "Kurd jî mîna hemû miletên din dixwazin bi rûmeta xwe li ser axa xwe, azad bijîn. Kurdistana Serbixwe tê wê maneyê ku hemû nasname û olên ji hev cuda yên li Kurdistanê dijîn, wê di şert û mercên wekhev û azad û bi ewle de bijîn" Akbal axaftina xwe wiha didomîne, "Mirov çima li dijî vê yekê derkeve. Ez ji vir bang dikim û dixwazim bila hemû guhdarvan û temaşevanên min ên Kurdistanî, di referandûmê de bibêjin 'Erê'. Ser xêrê be.

Em di rojhilata navîn de, di halê hazir de, rêveberiyeke ku bi demokrasiyê bi rê ve diçe nabînin. Kurdistana serbixwe wê bibe modelek. Qanûna bingehîn ku li gorî qanûna bingehîn a Swêdê hatiye amadekirin her tiştî nîşan dide. Dema em bi çavê olî û nasnameyî lê dinêrin em miletekî ku sedsal e li ser axa xwe tê sirgûnkirin, kuştin û qetilkirin û êşê dikişîne dibînin. Serxwebûn daxwaz û mafê vî miletî ye. Gava ku Kurdistan azad bibe wê jin jî azad bin, hemû miletên ku li Kurdistanê jî wê azad bin."

**"Di xeyala her Kurdî de Kurdistana serbixwe heye"**

Rezan Şîrwan jî di wê baweriyê de ye ku ber bi referandûma serbixwebûnê ve divê hemû Kurd bibin yek. Şîrwana ku dibêje 'divê hemû partiyên li Herêma Kurdistanê nakokiyên di nav xwe de deynin aliyekî' axaftina xwe wiha didomîne "Pêvajoya referandûma serxwebûnê ji bo hemû Kurdan girîng e. Di vê qonaxê de çi peywir dikeve ser milê partiyên Kurdan divê bi mecbûrî vêya pêk bînin. Divê partiyên Kurdan di vê pêvajoyê de gengeşiyên di nav xwe bidin kêlekekê. Ger pirsgirêkên di nav Kurdan de xilas nebin, emê çawa zimanê xwe pêş ve bibin, ala me wê çawa di nav ala miletên din de cî bigire. Divê em van pirsan bipirsin.

> Em ne miletekî bê fam in. Em dikarin xwe bi rê ve bibin, bila êdî tu kes me bi rê ve nebe. Bi dewletbûnê re mirov dibe xwedan pergal. Ger tu pergala xwe ava nekî dewleteke din te tune dike.


### "Bêdewletî xulamtî ye"

Hozan Canê "Dewlet, wek hemû Kurdan xeyala min e jî. Ez dewleta Kurdan a serbixwe dixwazim. Divê mirov ji Kurdbûna partiyên Kurdan ku piştgiriyê nadin referandûma serxwebûnê bikeve şikê. Xeyala min jî ew e ku di nav hemû dewletan de ala Kurdan hebe. Kurdan evqas can dane, ev xwîn bo Kurdistana serbixwe ye. Civaka bêdewlet civaka kole ye û wê her jî kole bimîne. Di vê pêvajoya referandûma serxwebûnê de divê Kurd bibin yek. Ez wek Kurdekê piştgiriyê didim vê referandûmê. Ger dewleteke Kurdan tê ava kirin ezê xwe jî wek qurban vebijêrim. Ger perçeyek azad be wê perçeyên din jî ber bi azadiyê ve biçin."


### "Cîhan wê bi referandûmê Kurdan nas bike"

Hunermend Rojda, "Kurdan pêngaveke girîng avêtin... Ez hêvîdar im ku di referandûmê de wê xelkê Herêma Kurdistanê bi serkeve. Lêbelê meseleya esil, pêvajoya piştî referandûmê ye. Problema herî mezin, pirsgirêka di navbera Kurdan de ye. Divê ev rageşî bên çareserkirin. Beriya her tiştî divê Kurdên li wir, li hev xwedî derkevin. Hêviya min ew e ku di referandûmê de yekîtiyeke sedî sed derkeve holê. Cîhan wê bi vê referandûmê cara ewil dengê Kurdan bibîhîze."
















Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

# Li bajarên Kurdan cihê bi sedan mamosteyan hat guhertin



MÎRA JÎN

Cihê hezar û 100 mamosteyên ku li bajarên Kurdan kar dikirin û piraniya wan endamên Eğitim-Senê bûn, beriya vebûna sala nû ya perwerdeyê, bêyî ku haya wan jê hebe, hat guhertin. Piştî kudetaya 15ê Tîrmehê ku rewşa awarte hat ragihandin, di vê heyama rewşa awarte de gelek mamosteyên endamên Eğitim-Senê ji kar hatin dûrxistin. Vê carê jî mamosteyên li bajarên Kurdan kar dikin bi guhertina cihên wan yên kar re rû bi rû man. Hat zanîn ku nemaze jî mamosteyên zewicî li heman bajarî nehatine peywîrdarkirin û her yek li devereke din hatiye bicihkirin. Mamosteyên ku bêyî wan cihê karê wan hatiye guhertin û Sekretera Şaxa 1ê ya Eğitim-Sen a Diyarbekirê Mizgin Yavuz ji Heftenameya Basê re axivîn.

**"Min tenê bahol û bîranînên xwe kom kirin"**

Muazez Özmen ku 17 sal e li Diyarbekirê mamostetiya Wêjeyê dike, ew jî di nav wan kesan de ye ku wê ji neçarî biçe bajarekî din karê xwe berdewam bike. Özmen destnîşan dike ku beriya niha ji bo ku piştgirî daye çalakiyeke Eğitim-Sen ku 29ê Berfanbara 2015an pêk hatibû ji kar hatibû dûrxistin û axaftina xwe wiha didomîne: "Lê piştî 3 mehan ez dîsa vegeriyam ser kare xwe. Wê çaxê jî îdîayên ku em ê werin sirgûnkirin hebûn. 28ê Tebaxê jî ew îdîa rast derketin û me bihîst ku em hatine sirgûnkirin. Bi salan e em li vî bajarî dixebitin, ez û hevalên xwe kîjan dever be em dikarin bixebitin, ji wî alî ve pirsgirêkên me tunene. Ez îro diçim min tenê bahola xwe û bîranînên xwe kom kirin, jibilî wê min tu tişt nekir. Lê ez ê rojekê li vî bajarî vegerim. Li gor rêznameyê mamosteyek nikare di 3 salan de vegere bajarê ku xebitiye, piştî sê salan ev pêkan e."

**"Dayika min nexweşa Alzheimerê ye û pêdivî bi alîkariyê heye"**

Muazez Özmen di derbarê guherîna cihê karê wan, rewşa wan ya derûnî û kiryarên dawîn, axaftina xwe wiha berdewam dike: "Em mirovan perwerde dikin û digihînin. Em piştî bi salan karê xwe bidest dixin. Bijîşk hin nexweşiyan dikare di hefteyekê de baş bike, lê gihandina xwendekarekî sal jê re pêwîste bi salan mmamoste kedê didin û xwendekaran digihînin perwerde dikin. Mamostetî jê re ked û xebat divê. Di vê pêvajoyê de min şewqa xwe winda kir. Par 7-8 Îlonê wê demê em ji kar hatibûn dûr xistin. Salek e em bi vê psikolojiyê dijîn. Sal derbasbû dîsa meha Îlonê îcar jî em sirgûn kirin. Li Diyarbekir 3 jin û mêr hebûn her yek dabûn bajarekî dema ji bo pêwendiya xwe ya bi dibistana ku lê dixebitin re qut bikin hîn bûn ku ji hevseran her yek daye cihekê. Gelek çîrokên trajîk hene. Gelek kes hene ku mecbûr mane ku hevsera/ê xwe, dayikên xwe li şûna xwe bihêlin û biçin. Mesela dayika min pêdivî bi alîkariyê heye nexweşiya wê Alzheimerê heye û niha min nasnake û ez neçar im ku wê bihêlim û biçim, çîrokên wiha pir in." Özmen herwiha diyar dike ku ew ê serî li her rêyeke hiqûqî bidin.

**"Digel mamosteyan xwendekar jî mexdûr dibin"**

Özgüç Köroğlu ku li navçeya Sûra Diyarbekirê kar dike û ev 11 sal e mamoste ye, yek ji wan mamosteyan e ku cihê karê wî hatiye guhertin. Köroğlu ku wê ji neçarî ji Diyarbekirê berê xwe bide bajarê Tokatê, rewşa tê de wiha vedibêje: "Ev guhertin bêyî ku haya me jê çê bibe qewimî ye. Beriya niha jî 3 mehan ji kar hatim dûrxistin. Armanca vê yekê ew e ku rêxistinbûnê belav bikin. Eğitim-Sen li herêmê sendîkayak xurt e, bi taybetî jî li Diyarbekir bêhtir bi rêxistin e. Armanc ew e ku vê rexistinê belav bikin û tiştekî muxalîf nehêlin. Bi kiryarên wiha nikarin pêşiyê li tu tiştî bigirin. Ji ber ku berê sirgûn, ji kar derxistin çê dibû, ev ne tiştekî ku tenê di vê heyamê de çê dibe. Di salên 80ê vir ve zext li ser mamosteyan hebûn, lê nikarîbûn rêxistinbûna mamosteyan belav bikin û nikarin jî. Armanç ew e ku perwerdehiya ku niha heye bi paş bixin. Armanca mamosteyan jî ew e ku mirovan di warê perwerdehiyê de ronî bikin û mirovên têgihiştî bigihînin. Eger mamosteyên wiha tunebin nifşên nû wê bi awayekî rehet angajeyî pergalê bibin. Armanca wan ew e ku mamosteyê ku hişmendiyê ronî dikin li derveyî perwerdehiyê bihêlin. Dixwazin bi sirgûnan çavê mamosteya bitirsînin. Bi tiştên wiha xwendekar jî mexdûr dibin, ji xwe perwerdehiya li herêmê bi pirsgirêke û xwendekarên herêmê mexdûr dibin.Vê rewşê bandorek neyênî him li mamosteyan him jî li malbatên mamosteyan dike, malbat parçe dibe dê û bav ji neçarî ji zarokên xwe vediqetin. Mesela zarokekî min heye ez mecbûr im ku wî li vir bihêlim ji ber ku dibistana wî li vir e divê li vir berdewam bike. Bi sedan kesên wekî min hene. Ev zilma herî mezin e li malbatan tê kirin. Perçekirina malbatê, xirakirina yekîtiya malbatan zilma herî mezine ku li mirovan tê kirin."

> "Vê rewşê bandoreke neyênî him li mamosteyan him jî li malbatên mamosteyan dike, malbat parçe dibe dayik û bav ji neçarî ji zarokên xwe vediqetin. Mesela zarokekî min heye ez mecbûr im ku wî li vir bihêlim, ji ber ku dibistana wî li vir e divê li vir berdewam bike. Bi sedan kesên wekî min hene."



### "Ev neheqî û bêhiqûqî ye"

Sekretera Şaxa 1ê ya Eğitim-Sen a Diyarbekirê Mizgin Yavuz jî li ser vê mijarê ji rojnameya me re axivî û ragihand ku guhertina cihê mamosteyan neheqî ye, li derveyî hiqûqê ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Piştî hewldana kudetaya 15 Tîrmehê kedkarên perwerdehiyê yên muxalîf bi neheqî û bêhiquq ji kar hatin dûrxistin û sirgûnkirin. Li hember van neheqî û bêhiquqiyên tên kirin tu kesê ku em hevdîtinê bi wan re bikin tuneye. Tu rayedar naxwazin berpirsyariyê li xwe bigirin. Ev tiştên ku tên kirin tu hevalên me nizanin ku ka ji bo çi hatine sirgûnkirin tu kesî daxuyaniyek di derbarê vê rewşê û hevalên me de nedaye. Mamosteyên ku dê biçin bajarên nû dê bi zehmetiyan re rû bi rû bimînin. Sendîkaya me li hemberî hemû darbeyên sîvîl û leşkerî helwesta xwe nîşan da û li hember rawestiya. Herwiha em li dijî wê yekê ne jî ku van kiryaran ji bo xwe weke fersend bibînin û bibin sedema mexdûriyên nû. Em nûnertiya beşên rewşenbîr û muxalîf dikin. Em li hember her cûre neheqî û bêhiquqiyê radiwestin. Em texmîn dikin ku endamên me yên ku hatine sirgûnkirin wê li cihê sirgûnê çi bijîn. Ev mamoste li cihê ku bo hatine sirgûnkirin, wê bibin armanca nijadpererstan. Jibilî dîtina cih gelek kêşeyên din wê derkevin pêşiya wan. Heta dibe ku li cihê lê kar dikin rastî mobbingê jî werin."

> "Li hember van neheqî û bêhiquqiyên tên kirin tu kesê ku em hevdîtinê bi wan re bikin tuneye. Tu rayedar naxwazin berpirsyariyê li xwe bigirin. Mamoste nizanin ka ji bo çi cihê wan hatiye guhertin. Mamosteyên ku dê biçin bajarên nû dê bi zehmetî û arîşeyên nû re rû bi rû bimînin."

Kurdên li İzmirê dijîn:

# Serxwebûn xeyala hemû Kurdan e



**JÎN MAZÎ**

> Heger Komara Kurdan a Mahabadê ya salên 1946an xira nebûya dê her tişt cudatir bûya. Belkî Herêma Kurdistanê ji zû ve serxwebûna xwe îlan bikira. Li Rojava jî belkî îxtîmaleke din pêk bihata. Rewşa Kurdên li Tirkiye dijîn jî belkî cudatir bûya.

Referandûma serxwebûna Kurdistanê ya ku dê di 25 îlonê pêk were roj bi roj piştgiriyeke xurt him ji Kurdên li Herêma Kurdistanê dijîn him jî ji Kurdên ku li welatên din dijîn distîne. Kurdên li Tirkiyeyê dijîn di wê baweriyê de ne ku heger ji encama referandûmê 'erê' derkeve û serxwebûn bê îlan kirin dê ev yek bandoreke erênî li ser Tirkiye jî bike. Her wiha dibêjin êdî wexta Kurdistaneke serbixwe jî hatiye û serxwebûn herî pir mafê Kurdan e. Di têkoşîna azadiyê de em li gel wan in. Kurdên İzmirê dijîn fikr û ramanên xwe yên li ser referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê vegotin.

**"Herî pir Kurd serxwebûnê heq dikin"**

Gul Sevena ku bi salan e li İzmirê dijîn di derbarê referandûmê de dibêje, ''Kurd, heta niha çi êşên li dinyayê hebin bi wan re rû bi rû mane, bi ya min herî pir Kurd serxwebûnê heq dikin. Mafê her netewî heye qedera xwe bi xwe diyar bike. Her wiha Gul Seven dibêje: "Mafê her netewî heye ku zimanê xwe, çanda xwe, nijada xwe û kevneşopiyên xwe birêve bibe. Her millet xwediyê wî mafî ye ku çavkanî û dewlemendiya xwe ya binerd û sererd li gor dilê xwe û li gor vîna gel bi sîstemeke demokratîk û wek hev bikar bîne. Îro li Rojhilata Navîn ne li gor serweriya netewî û serbixwe ya vîna gel, sîstemeke serweriya takekesî birêve diçe. Em dikarin rêveberiya Sadam, Beşar Esad, Kadafî, Misir, Tûnis û Siûdî weke mînak bidin. Her çiqas îro li cîhanê fikra girîngiya serxwebûnê tune be jî ne hewce ye ku em ew qas dûr biçin, kêmnetewên di bin serweriya welatên din de jiyane, berdêlên gelekî giran dane û ev li ber çavan e ji xwe. Îro dema em bala xwe didin cîhanê û dewletên ku hatine avakirin, nifûsa wan 900 kes an 1000 in. Ev dewlet ne girêdayî tu netewan e û ew bixwe biryarên xwe yên rêvebirinê didin. Wek mînak Vatikan li ser erdekî 44 hektar hatiye avakirin û dewleta herî biçûk a cîhanê ye, nifûsa wê nêzî 900 kesî ye. Mînakeke din Monako ye, rûberê wê 18 km ye û nifûsa wê jî 34 hezar e. Nifûsa Kurdistanê bêyî koçberên ku hatine wir 5 milyon û 472 hezar e. Heger bi 900 kesî an bi 1000î dewlet tê îlan kirin, çima 5 milyon însan serxwebûna xwe îlan neke? Kurd heta niha bi gelek êşan rû bi rû mane û li gor bîr û baweriya min herî pir Kurd serxwebûnê heq dikin. Ez weke Kurdek li İzmirê dijî ez li gel serxwebûnê me.

**''Em li gel têkoşîna azadiya miletê xwe ne"**

Uğur Şen jî derbarê referandûmê de dibêje, "Kurd bi salan e li ser xaka xwe bindest in, piştî vê bindestiyê parçeyek dê serbixwe bibe, tiştekî ji vê xweştir heye?" Şen li ser dewleta ku Qazî Mihemmed li Îranê avakiribû mînakekê dide û dibêje: "Heger Komara Kurdan a Mahabadê ya salên 1946an xira nebûya dê her tişt cudatir bûya. Belkî Herêma Kurdistanê ji zû ve serxwebûna xwe îlan bikira. Li Rojava jî belkî îxtîmaleke din pêk bihata. Rewşa Kurdên li Tirkiye dijîn jî belkî cudatir bûya. Îro li Herêma Kurdistanê dê referandûma serxwebûnê pêk were û serxwebûn bê îlan kirin piştî ewqas tişt dîsa jî dibe ku hin tişt bên guhertin. Divê hemu Kurd piştgiriya xwe bo referandûma serxwebûna Kurdistanê ya ku dê di 25 îlonê de pêk were nîşan bidin. Em jî diyar dikin ku di têkoşîna azadiya gelê xwe de em li gel wan in. Dewleta ku wê were avakirin bi awayekî saxlem li ser piya bisekine dê bandorê li parçeyên din jî bike û ji bo pêşveçûna perçeyên din jî bandorê bike.

**"Yên ku li hember serxwebûnê bisekinin dê xwe tune bikin"**

Mehmet Siraç Kaya jî balê dikişîne ser bêdewletbûna Kurdan û dibêje, "Sedema tofanên ku bi serê Kurdan de hatine bêdewletbûn e. Kurdan êşên bêdewletbûne heta îro kişandine. Heger armanca referandûmê dewletbûn be, ev ji bo Kurdan tiştekî pîroz e. Xelasiya Kurdan ji komkujiyan, ji bindestiyê û dawîlêanîna pirsgirêkan di dewletbûnê de ye. Ji ber wê divê Kurd li pişt vê biryarê bisekinin. Tu Kurdek nikare li hember vê biryarê bisekine. Kurdê ku li hember vê biryarê bisekine dê xwe tune bike. Dewleta serbixwe ya ku wê were avakirin, li Rojhilata Navîn bandorê bike neke ew ne xema min e, ez dixwazim bi çavekî Kurdistanî li vê meseleyê binêrim. Ji ber ku Kurdan berdêlên mezin dan."

**"Bêdewletbûn mirov bêparastin dihêle"**

Önder Sazan yek ji wan Kurdan e ku bi salan e li İzmirê dijî ramanên xwe yê derbarê referandûmê de wiha vedibêje: "Ji bo xewna sedsalan a Kurdan serxwebûn pêk were, divê hemû Kurd ji bo wê, xebatê bikin. Piştî ewqas komkujî û qirkirinê, referandûma serxwebûnê ya li Herêma Kurdistanê dê pêk were dê ji bo Kurdan bibe hêvî. Ew aliyên ku dewletbûnê her tim weke tiştekî xirab nîşan didin, bila dewletên xwe xira bikin, bêsînor û bêparastin bijîn wê demê wê fam bikin bêdewletbûn tiştekî çawa ye. Di şert û mercên Rojhilata Navîn de miletên ku ne xwedî dewlet in her tim bi êrîşan re rû bi rû dimînin. Heger tu xwedî dewlet be artêşek û hikûmeteke te hebe zû bi zû kes nikare êrîş bike. Ji bo ku referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê bi awayekî erênî encam bide û deriyê serxwebûnê veke divê her kes rêzê ji vê biryarê re bigire û piştgiriya xwe nîşan bide.

**"Kurdistana serxbixwe dê bibe navenda demokrasiyê"**

Zelal Can jî hêviyên xwe yên di derbarê referandûma serxwebûnê de wiha vedibêje, "Piştî roja referandûma serxwebûnê hat diyar kirin di nav Kurdan de jî yekîtiyekê rû da. Bi diyarbûna vê rojê re Kurdan piştgiriyeke xurt nîşan dan. Kurdên ku li parçeyên din dijîn yên li dîasporayê li gor qeweta xwe piştgiriya xwe nîşan dan dest bi xebatan kirin. Herî dawî referandûma serxwebûnê Kurd anîn cem hev. Xeyala Kurdan a dewletbûnê her hebû û ev xeyala heta biçe serî dê her hebe jî. Di hundir her Kurdekî de xeyala Kurdistaneke serbixwe heye. Ev xeyala dê bi encamdana referandûmê li Herêma Kurdistanê birayên me yên Kurd pêk bînin. Azadbûn û serxwebûna beşek Kurdistanê ji bo Kurdên ku li beşên din dijîn hêviyek e. Li Herêma Kurdistanê gelek kêmnetew û ol û bawerî pêkve di nav aramî û demokrasiyê de dijîn, heger li wir serxwebûn bê îlankirin, li Rojhilata Navîn dê Kurdistan bibe navenda demokrasiyê."

---

Celal Baykara:

# Armanca me vegotina sedemên referandûmê ye

**BİLAL ADLIĞ**

Biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê li seranserê Kurdistanê bi coşeke mezin hat pêşwazî kirin. Li Bakur jî ev biryar bû sedema kelecanê. Rewşenbîr, siyasetmedar, karmend, hunermend û ji hemû aliyên Kurdî ve xebatên referandûmê tên kirin. Yek ji girîngtirîn xebat jî avakirina "Înîsiyatîfa Piştgiriya Referandûma Serxwebûnê" ye. Înîsiyatîf li bajarên Kurdan û Tirkiyeyê çendîn xebatên balkêş pêkanîn. Em jî wek Heftenameya Basê li gel yek ji avakarên Înîsiyatîfê siyasetmedar û Parêzer Mehmet Celal Baykara re li ser armanc û xebatên Înîsiyatîfê, helwest û nêrîna gelê Tirkiyeyê axivîn.

Celal Baykara destnîşan dike ku wan beriya sê çar mehan, ji dema ku pêkanîna referandûmê ket rojevê ve dest bi hevdîtinan kiriye û axaftina xwe wiha didomîne: "Car caran em siyasetmedar û partiyên Kurdî di navbera xwe de diaxivîn û me digot gelo em ji bo piştgiriya birayên xwe yên Herêma Kurdistanê dikarin çi bikin. Piştî van axaftinan me biryar da ku em civînekê pêk bînin û di vê rewşa ku Herêma Kurdistanê ji aliyê Îran û Tirkiyeyê ve di bin zext û fişaran de ye û gelê me yê Herêma Kurdistanê nekeve bin tesîra van nexweşiyên ji der û dora wan tên, gelo em dikarin çi bikin. 6 partiyên Kurdistanî û sazî û dezgeh û kesayetên siyasî yên Kurdan li Diyarbekirê em civiyan. Di civînê de biryara avakirina înîsîyatîfê hat standin. Di encama vê biryarê de jî Înîsiyatîfa Piştgiriya Referandûma Serxwebûnê bi îmzeya Berdevkê Hereketa Azadî Ayettullah Aşitî, Serokê PAKê Mustafa Özçelik, Serokê PDK/Bakur Sertac Buçak, Serokê PSKê Mesud Tek, Serokê Giştî yê OSP Sinan Çiftyürek, Parlementerê berê yê DEPê Mahmut Kılınç, Parêzer Sebahattin Korkmaz, Karmend Ferda Cemiloğlu, Bijîşk Ekrem Bilek, Parêzer Mehmet Celal Baykara û Akademîsyen Yaşar Abdulselamoğlu hat îlan kirin." Celal Baykara di berdewamiya axaftina xwe de dibêje: "Însiyatîf bi armanca vegotina sedema pêkanîna referandûmê bo rewşenbîr û zanayên Tirk û gelê Kurd hat avakirin. Me gelek bername û proje danîn ber xwe. Bêguman di vê rewşa awarte de tiştên ku em ê bikaribin bikin gelekî kêm bûn. Armanc û hedefa me ew bû ku em projeyên mezin pêk bînin. Me dixwest em bîlboardan bi piştgiriya referandûmê tije bikin. Lê mixabin derfet çênebû û ev projeyên me yên mezin pêk nehatin. Lê belê me gelek civîn û xebat jî kirin. Daxwaza mitîng û festîvalan hatibe red kirin jî me li cih û warên van partiyan konferans û panel saz kirin. Armanca me ew bû ku em piştgiriya referandûma Herêma Kurdistanê bikin."

**"Dê xebatên me heta îlankirina serxwebûnê bidomin"**

Celal Baykara di derheqê xebatên însiyatîfê de wiha diaxive: "Di destpêkê de fikra me ew bû ku em tenê heta referandûmê xebatan bikin. Lê belê piştî me dest bi xebatan kir me dît ku gelek tevecûh heye li hember însiyatîfê û heta însiyatîf weke partiya referandûmê hat pêşwazî kirin. Lê weke hûn jî dizanin pêkanîna referandûmê nayê wateya îlankirina serxwebûnê. Lê ez wisa bawer dikim ku piştî referandûmê dema me civîna şêwrê li dar xist dê biryara berdewamiya xebatan bê girtin. Di serî de jî min got, armanca vê komîsyonê 'Vegotina sedemên referandûmê bo Kurd û Tirkan' e. Me li Batman, Wan, Semsûrê konferans li dar xistin. Me bi Odeyên Yekîtiya Bijîşkan, partiyên siyasî, saziyên sivîl û bi gel re civîn pêk anîn. Me di van civîn û konferansan de ji Kurd û Tirkan re sedemên pêkanîna referandûmê bilêv kirin. Hevalên me bi Partiya Komarî ya Gel (CHP) û HDPê re hevdîtin pêkanîn. Ji bilî hevdîtinên komîsyona însiyatîfê, însiyatîfên herêmê jî hatin ava kirin. Însiyatifên li Batman, Îzmîr, Wan û Diyarbekirê çend ji van însiyatîfan in. Mînak tenê Însiyatîfa Stenbolê 42 hevdîtin pêk anîn. 1200 name û deklarasyon hatin şandin. Di 10ê vê mehê de li Stenbolê jî konferans hat li dar xistin. Di vê konferansê de Cîgirê Serokê Partiya Geşepêdanê ya Tirkmenan jî beşdar bû. Di konferansê de axaftinek jî pêk anî. Ev jî ji bo nêrîna çewt a gelê Tirk li hember referandûma Kurdistanê ye. Bila rastiyê ji Tirkmenan bibihîzin. Hemû şaxên Înîsiyatîfê li bajarên xwe hevdîtin pêkanîn. Xebatên wan didomin."

**"Gelo dê çi tesîrê li Tirkiyeyê bike?"**

Celal Baykara di derheqê helwest û nêrîna Tirkiyeyê de wiha pê de diçe: "Nêrîn û helwesta Kurdan li hember referandûmê gelekî erênî ye. Dema me serdana sazî û kesayetên Tirk kir jî pirsa di serê wan de 'Gelo dê çi tesîrê li Tirkiyeyê bike' ye. Mafê pêkanîna referandamê û çareserkirina dahatûya xwe rewa dibînin.




Vî tiştî gelek xwezayî jî dibînin. Lê belê ew tirsa wan jî heye ku referandûm û serxwebûn tesîrê li Kurdên Tirkiyeyê bike. Dibêjin gelo ev yek Kurdên me jî ji me dûr nexîne? Bersiva wan tim em dibêjin ku ev tişt girêdayî Tirkiyeyê ye. Eger demokrasî û mafên Kurdan bên dayîn çima ji Tirkiyeyê veqetin. Me mînaka Katalonyayê jî da wan. Weke tê zanîn hinek Katalan li Fransa jî dijîn. Lê belê pêkanîna referandûma serxwebûnê li Katalonyayê ji bo Fransiyan ne pirsgirêk e. Ji ber vê yekê jî divê Tirk û siyasetmedarên wan ji referandûm û serxwebûna Herêma Kurdistanê netirsin. Eger Tirkiye demokratîk bibe û mafên Kurdan bide Kurdên vir ji Tirkiyeyê naqetin. Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP) daxwaza hevdîtina me red kir. Nûnertiya wan a Stenbolê ji me re got: "Fikra hikûmetê û partiya me diyar e em naxwazin di vê mijarê de biaxivin." Lê belê me daxwaza kesekî ji wan kir ku di konferansê de biaxive û kesek ji wan jî beşdarî konferansê bû weke axaftvan. Parlementerê AKPê yê Diyarbekirê Galîp Ensarioğlu jî di konferansê de gotarek pêşkeş kir."

---

**MURAD CIWAN**



## Govenda Xencer Û Şûran

''Ferman e, ferman e, fermana mîrên kurdan e!"

Yek ji buyerên trajîk ên navbera kurdan û osmaniyan yên dewra krîza îdarî û siyasî jî şerê navbera Mehmet Tekelî Paşayê begêbeganê Wanê û Yehya Begê Mîrê Hekariyan ê bi xencer û şûran û hevkuştina Tekelî û Yehya Beg e.

Yehya Beg, piştî gelek hevrikî û pevçûnên di navbera mîrên Hekariyan bi xwe, li gel birayê xwe Zeynel Begî hevkariyek bestibû û bavê xwe Zekeriya Beg daxistibû li şuna wî ew bûbû mîrê Hekariyê. Bavê wî reviyabû Urmiyê, alîkarî ji Şah Abbas xwestibû, osmaniyan di 25ê Çileya Pêşîn (desember) a 1613an de mîrîtiya Yehya Beg a li ser Hekariyê resmî qebûl kiribû.

Sala 1615an, li gor osmaniyan Şah Abbas, li gor îraniyan jî Padişah Ahmedê I. aştiya navbera herdu dewletan xerakir û qonaxa siyê ya şerên osmanî û safewiyan dest pêkir. Di dilê osmaniyan de paşvegirtina erdên ku Şah Abbas ji osmaniyan zeftkiribûn jî hebû, bi taybetî Rewan û Tebrîz.

Di van şeran de, cardin mîrên kurdan rolên girîng dileyistin. Mîrên kurdan ên serhedan heta bigihê yên pinyanişiyan careka din xwe dabûn alî osmaniyan. Di 1616an de Yehya Beg bi xwe êrîşên dijwar biribûn heta Urmiyê. Di şerê nêzî Salmasê de eşîrên kurd ên Hekariyan, Pinyanişiyan, Mehmudiyan biserketibûn, Pîr Budaq Xanê mîrêmîranê safewî hatibû kuştin. Zeynel Beg bi xwe Xan kuştibû. Orduya safewî têkçûbû.

Lê vê, herwiha derî jî li dijayetiya navbera paşayê Wanê Tekelî û Yehya Beg vekiribû. Encama dijayetiyê gihaşt heta hevkuştina herdu aliyan, tevî gelek beg, axa û fermandeyan.

Sê weqanivîsan bi berfirehî behsa vê buyerê kiriye; Îbnî Nuh di Tarîxa Wanê de, Îskender Begê Munşî di Alem Arayê Abbasî de û Yazıcı Temerê kâtibe Mîr Yehya û Mîr Îmadeddînê mîrên Hekariyê, di weqayînameya xwe ya manzum ya neçapkirî de. Hin cudayî li ser buyerê û sedemên wê de di navbera wan de hene, lê bi hev re, ew wêneyê hevrikîya paşayên osmanî û mîrên kurdan zelal dikin.

Li gor Yazıcı Temer, bi serkeftina kurdan a di şerê Urmiyê de, Tekelî hay ji hêza mezin a Yehya Beg bû û biryara ji navêrakirina wî da. Di sefera Tekelî a ser Rewanê a 1617an de, Yehya Beg li Wanê mabû. Berî ku Tekelî vegere jî bi gumana ku ew kare wî bikuje, Yehya Beg ji wir çûbû. Li ser agahiya ku Şah Abbas hatiye Merendê, Tekelî xeber rêkir pey Yehya Begê ku ew ber bi Şah ve diçe, bira ew jî zû bê.

Di 27ê remezana 1617an de li Xan Xizirê Yehya Beg gihaşt Tekelî Paşa. Bi bahaneya ku dereng hatiye Tekelî heqaret lê kir, wî jî xencera xwe kêşa û li wî da. Pişt re jî Ezemşêrê Xanî û Mihrab Beg, Tekelî kuşt. Eskerê Wanê gava ev dît, êrîşî wan kir, şer derket.

Di şerî de Yehya Beg, pismamê wî Alaeddîn, Ezemşêrê Xanî, Mihrab Beg, Mîr Seyyid, Mîr Umer, Îbrahîm, Şêx Heyderê Serşiyanî, Giravî û Şahverdiyê Pinyanişî, ji eşîra Dirrî Yar Azîz, Laçîn û Mîr Mahmûd, Mela Ahmed, Şêrdil û Şêx Emîr hatin kuştin.

Îbn-î Nuh, buyerê û sedemê wê cuda vedughêze: Gava Tekelî Paşa tevî eskerên Wanê, Diyarbekirê û mîrên Kurdistanê çû sefera Naxcîwanê, ku gihîşt menzîlê agadar bû ku hakimê Bedlîsê Ziyaeddîn Xan bi şev sef terikandine. Ku hat gotin Yehya Beg jî wek Ziyaeddîn Xan difikire, Tekelî meriv şand da wan mîran bînin. Axayên eşîran li hember derketin, di navbera wan de şer derket, heta Yehya Beg hat girtin ji axayên eşîran û mîran çil-pêncî kes hatin kuştin. Yehya Beg birin ba Tekelî. Piştî ku civat belav bû yek ji merivên Yehya Beg ê bi navê Azabşîr (Ezemşêr) bi xencerê Tekelî Paşa kuşt û xwest Yehya Beg birevîne. Eskerên Tekelî pê hesiyan, wan êrîş kir, Yehya Beg, Ezemşêr û merivên din kuştin.

Li gor İskender Begê Munşî, Padîşah Ahmedê I. Xelîl Paşayê şerxwaz kir sedrezam û serdarê orduyên Anadoluyê û şand sefereka nuh a ser Îranê. Casûsan xeber da Şah Abbas ku orduya Xelil Paşa ji Stenbolê birêketiye, tê. Qarçiqar Xanê safewî esker girt çû da wan herêmên ser riya orduya osmanî talan bikin, bişewitînin, gava ordu hat deverê ne xwarin ji bo eskeran, ne jî giha û alif ji bo heywanan bimîne da ew nikaribin bigihên menzîla xwe. Safewiyan sefer bir heta Erzurumê, her der kavil kirin, insan kuştin, bi çolan xistin, dest danîn ser heywan û erzaqan, çandinî, daristan û baxçe şewitandin. Pişt re wan biryara sefereka ser Wanê jî da.

Wê demê, Tekelî jî li gel mîrên kurdan li dora Urmiyê bû. Ku bihîst orduya Îranê diçe ser Wanê, biryara vegerê da. Dubendî ket navbera wî û mîrên kurdan. Mîrê kurdan dixwestin di demeka wiha de ew jî her yek li ser keleyên xwe bin, da karibin wan ji eskerên Îranê biparêzin. Tekelî razî nebû. Ziyaeddîn Xanê mîrê Bedlîsê bêyî agahdarkirinê veqetiya, çû welatê xwe. Yehya Beg jî derket ser rê da biçe Hekariyê.

Tekelî desteyek esker şand da wî vegerînin. Heta ew çûn esasê esker bi dûr ketibû, Yehya Beg û mihafizên dora xwe ku li paş mabûn, vegeriyan cem Tekelî. Paşa destê wî li ser qebzeya şûr ber bi Yehya Begî ve çû, merivên Yehya Beg ketin gumana ku ew dike wî bikuje, zûtir liviyan û wan Tekelî birîndar kir. Zêrevanê Tekelî jî hicûmî ser Yehya Beg û merivên wî kir, ew dan ber şûran, kuştin. Tekelî jî ji ber birîna xwe mir.

Herdu aliyan dît ku çi trajediyeka mezin buye, bêyî ku şer pîj bikin, her yek bi alî xwe ve vekişiyan, mîrên kurdan çûn welatên xwe, eskerê Îranê jî êdî pêwîst nedît biçe ser Kela Wanê, vegeriya Tebrîzê.

1-Yazici Temir, menzûma destnivîs, r. 349-350. Ji Yaşar Kaplan, ''Pınyanış Hükümeti".

2-'Îbn-î Nuh, 203, r. 60 Ji Zeki Tekin, ''Zeynel Bey ve oğullarının Hakkari hakimliği mücadelesi ve İsyanları".

3-İskender Beg Munşi Türkman, Dünyayı Bezeyen Abbas'ın Tarixi, Tarîxê Alemarayê Abbasî, c. 2, r. 1646, Baku 2011, Şerq-Qerb.

Delîl Dîlanar:

# Vegera welêt afirandina mûzîkeke nû bû!

DARA PORXELEK

Delîl Dîlanar di sala 1973an de li gundê Orginos yê girêdayî navenda Mûşê hatiye dinê. Delîl, ji ber gotina stranekî di sala 1995an de hate sirgûnkirin. Piştî sirgûniyeke 20 salan di sala 2015an de vegeriya welêt. Heta niha 5 albûmên Delîl hatine weşandin. Delîl her wiha di filmên sînemayê de jî dilîze û filmê bi navê 'Kurdistan Kurdistan' jiyana wî bi xwe ye. Delîl niha jî li Almanyayê dijî. Hunermendê Kurd ê navdar Delîl Dîlanar di derbarê muzîk, film û xebatên xwe de bersiva pirsen me da.



**Dema mirov li rabirdûya we ya muzîkê dinêre we li gel apê xwe Dengbêj Huseyno perwerdehiya muzîkê, li cem Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo jî perwerdehiya amûrên muzîkê dîtiye, gelo ev tişt bûn sedem ku hûn dest bi muzîkê, dengbêjiyê bikin?**

Te her du pirs jî pir zû pirsîn. (Dikene) Dengbêj Huseyno ji ber ku malbat e, em bixwazin nexwazin, bêhemdî be jî em di nav wê çandê de mezin bûn. Di nav çanda dengbêjiyê de. Tesîra wî bi taybetî li ser min heye. Bi rastî jî dema min dest bi muzîkê kir, eleqaya min bi dengbêjiyê re tune bû. Di sala 1994an de min yekem stran bi dengbêjiyê stra. Straneke apê min Huseyno bû; Bavê Fexriya. Di bin hişê mirov de ji tesîra lorîna dayîkan bigire, guhdariya dengbêjan ku mirov li derûdora xwe guhdar dike tim heye. Dema tu bi awayekî profesyonel dest pê dikî, divê tu ji bin tesîra wan derkevî. Eger tu nikaribî derkevî tu nikarî weke kesekî serbixwe xebatan bikî. Tu dibî kopiya. Belê em di nav wê çandê de mezin bûn lê dema min dest bi karê profesyonelî kir û şûn ve min girîngiya dengbêjî di nav muzîka Kurdî de dît û min got ku eger em muzîka Kurdî çêbikin divê ew tayek wisa hebe pêwîst e bingeha wê xurt û Kurdî be. Ew potansiyela ku bikarî wê çêbikî ji xwe ji malbatê jî tê, ew jî hebû. Jixwe kesên ku me guhdar dikin û baş xirab bi me dizanin, dizanin ew tesîr li ser me heye. Lê bi rengekî din, bi şîroveyeke nû û bi amûrên rojavayî me çêkir. Ew jî ji bo me hinekî taybet bû. Min û Egîdê Cimo me di sala 1996an de hev nas kir. Heta 1998an ez li wan deveran mam. Tesîra Egîdê Cimo jixwe ji Radyoya Rewanê de li ser me hebû. Bi taybetî jî dema li gel wî me dest bi perwerdehiya amûrên muzîkê kir. Bixwazî nexwazî ew jî dibe pêngava duduyan di warê amûran de, dîsa bi Kurdî û Kurdiyeke orjînal ku bi dengbêjiyê ve girêdayî ye, ji ber ku tu nikarî Egîdê Cimo ji dengbêjiyê dûr bigirî. Min bi taybetî xwest ku tesîra wan li ser min çêbibe.

**Dema dibêjin Delîl Dîlanar harmana amûrên rojavayî û dengbêjiya Kurdî tê bîra mirov...**

Eger tu bixwazî tiştekî nû, şîroveyeke nû biafirînî, ji kopiyayê dûr bikevî divê tu tiştên nû çêbikî. Yanê ew ne bi daxwazê derdikeve holê. Ew bêyî hemdê te ye. Ew daxwaz ew qewet tê û derdikeve holê. Ne ku ez dengbêjiyê modernîze dikim. Lê li gor dema îro, ciwanên me eger tesîra malbatê li ser tune be dengbêjiyê nikarin guhdar bikin, an jî gelekî kêm guhdar dikin. Ew hîs nakin. Ciwanên li Ewropa dijîn û di nav muzîkeke gelek gelek pêşketî û modern de muzîk guhdar dikin. Ew tiştên din li gor wan hinek klasîk dimînin. Tu nikarî bi wan bidî hez kirin. Ew dengbêjiyê hîs nakin. Ji bo tu bikaribî çanda xwe bi wan bidî guhdar kirin, pêwîst bû tiştekî wisa bihata çêkirin. Bi taybetî jî ji bo nifşê nû. Ev jî bû siyek, tarzek. Êdî guhdar, me wisa nas dikin. Bi rastî jî me bi zanebûnî wisa kir.

> Eger tu bixwazî tiştekî nû, şîroveyeke nû biafirînî divê tu ji kopiyayê dûr bikevî divê tu tiştên nû çêbikî. Yanê ew ne bi daxwazê derdikeve holê. Ew bêyî hemdê te ye. Ew daxwaz, ew qewet tê û derdikeve holê.

**Di hevpeyvîneke we de, we gotiye ku 'Êdî divê ne tenê Kurd muzîka Kurdî guhdar bikin.' Îro Delîl, Aynur Dogan û Homer Dizeyî û hwd. li hemû cîhanê konsertan didin. Gelo ev daxwaz bi serket?**

Esas pirsgirêka mezin, xelkên biyanî ku weke muzîkeke klasîk guhdarî muzîka Kurdî dikin û qedir didinê, Kurd hê negihiştine wê astê. Ez bi giştî dibêjim. Ji ber ku guhdarîkirina muzîkê jî çand e. Ji wê re jî bingehek lazim e. Îro eger zarok bi muzîkên Bethooven, Mozart mezin bibin di destpêkê de ew çand rûdine û êdî nikare muzîka xirab guhdar bike. Mixabin em hêj di destpêkê de ne. Hin kes hene gelekî bi pêş ketine. Eger tu karekî profesyonel çêbikî herkes jî guhdar dike. Îro dema tu diçî festîvalekê, ne ji ber ku tiştekî taybet e, nû ye guhdar dikin. Eger baş pêk bînî guhdar dikin. Kurd îro li cîhanê tên nasîn. Bi saya Başûr û Rojava Kurd êdî hêdî hêdî tên naskirin. Dema te dinasin çanda te jî meraq dikin. Gelo ev çi Milet e, çand û hunera wan çi ye. Di nav cîhanê de Kurd êdî tên naskirin. Lê eger em bixwazin hê jî pêwîstî pê heye ku karên baştir bên kirin. Ji ber ku em bikaribin di nav bazara cîhanê de em jî cihekî bigirin. Lê mixabin hê merheleyek ji wê re maye. Ji ber ku ji vî karî re sazî divê, heta dewlet divê... Mînak îro em li Tirkan dinêrin, hunermendên wan weke Tarkan di hemû cîhanê de tên nasîn. Îranî bi komên xwe yên muzîkê yên profesyonel tên nasîn. Ermenî bi Gasparyan tên nasîn. Weke hûn jî dibêjin çend Kurd jî hene di vî warî de baş biserketine lê têrê nake. Hê jî ne bes e. Ji bo xelk me nas bike hê jî pêwîstî bi xebatên baş heye.

**Herî dawî we albûma Dengbêjname-I belav kir. Hûnê mizgîniyê bi rêya Basê bidin. Dê berdewama Dengbêjnameyê were?**

Belê. Jixwe me navê albûmê danî bû Dengbêjname-I. îhtîmaleke mezin heta dawiya salê wê amade be. Weke arşîv dê her berdewam be. Bi terza dengbêjiyê dê her hebe. Û wekî din jî wê di meha 2an de albûma me amade be. Niha xebat hene. Em amadekariya konsertên wê dikin niha li Ewropa.

**Em werin mijara 'Kurdistan Kurdistan' Di Festîvalan de 'Weke derhênerê herî baş û Filmê herî baş, weke muzîka herî baş' gelek xelat wergirtin. Serkeftina vê ji ber çi bû li gor we?**

Bêguman ev serkeftin ya derhêner Bulent Gunduz e. Ji ber ku ez jî beşdarî gelekî festîvalan bûm, dibêjim. Serkeftina wê ji ber ku ne çîrokeke xeyalî ye û jiyana rastîn e. Nîv dokumanter e bi giştî nehatiye çêkirin. Di konserta me ya New Yorkê de dest pê dike û heta ez tême welêt ku ez cara yekem destê dayîk û bavê xwe radimûsim. Min di fîlm de aktorî nekiriye. Jiyana min a rastîn e. Rolek ji bo min nehatibû nivîsandin. Egîdê Cimo jî rolek girtiye di film de. Ji bo wan rol hatibû nivîsandin lê bes ji bo min na. Tesîra wê li ser bîneran jî ji ber ku çîrok rastîn e, cih jî rastî ye ne set e. Ji siwarbûna balafirê bigire heta çûyîna gund rêwîtiya min a rast e. Ew film bi serketinên xwe deyndarê Bulent Gunduz e. Ji ber ku film û fikr tev ên Bulent Gunduz bû.

> Ez di serê xwe de bi wan welatên ku Kurdistan parçe kirine re tu wextî li hev nayêm. Çima ne li hev im; ji ber ku welatê me parçe kirine. Ji ber wê jî kîjan parçeyê Kurdistanê dibe bila bibe, ez wekî Kurdekî serbixwe û şexsî jî azad im, ji bo min ne xeyal e. Çi dibe bila bibe piştgiriya Kurdistana serbixwe dikim.

**Niha filmê 'Beriya Mirinê' dikişînî. Alanê kurê te zarokekî Qamişlo ye. Çawa ye hemahengiya we li setê?**

Ew filma nû jî ku bi derhêneriya Fikrî tê kişandin. Fikra kesekî ji Herêma Kurdistanê ye. Jiyana Pêşmergeyekî xwebexş mijara vî fîlmî ye. Pêşmerge bi derxistina mayînan re mijûl e. Film jiyana wî Pêşmergeyî ye. Li ser jiyana wî Pêşmergeyî gelek dokumanter hatine çêkirin. Ew lawik pir zîrek bû. Wextê me gelekî xweş derbas dibû li setê. Têkiliyên me û kurik jî rastiyek e. Berî niha jî dokumanterek li ser jiyana wî kurikî hatibû çêkirin. Nexweşiyeke wî jî heye. Têkiliyên me gelekî xweş bûn. Heta niha jî têkiliyên me li gel wî û li gel malbata wî jî hene. Têkiliyên me li setê weke bav û kurekî derbas dibûn. Ez bawer im dema film bê temaşe kirin dê baştir bê fêm kirin. Ez bawer im ku dê film di meha pêşiya me de li Festîvala Navnetewî ya Duhokê dê were nîşandin.

**Projeyên we yên nû di derbarê sînemageriyê de hene?**

Dema we dest bi karekî kir, teklîfa karan jî zehftir tên. Projeyek heye ku ez ê bibêjim erê. Niha li ser wê xebat tên kirin. Wisa bi bawer im ku ez ê bibêjim erê. Heta ew daxûyanî nedin ez naxwazim di derheqê filmê de biaxivim. Ji sedî sed dê ew film jî çêbibe. Lê di derbarê film de bila derhêner daxûyanî bide.

**Piştî komkujiya Şingalê, tu dibêjî ' Ji bilî serxwebûnê tu çare ji derdê me re nema ye.' Referandûma serxwebûna Kurdistanê wê di 25ê Îlonê de pêk were. Tu çi difikirî, hestên te çi ne?**

Niha jixwe te gelekî baş şopandiye ku ez çidikim û çi dibêjim. Ev gelekî girîng e. Mirov ku tiştekî weke kesekî serwext karê xwe dike û dahatûya xwe dibîne divê gotinên vala nebêje û her tiştî nebêje. Ez bawer im her Kurdekî niştîmanperwer, welathez ew gotin, ne xewn e jî. Ez di serê xwe de bi wan welatên ku Kurdistan parçe kirine re tu wextî li hev nayêm. Çima ne li hev im; ji ber ku welatê me parçe kirine. Ji ber wê jî kîjan parçeyê Kurdistanê dibe bila bibe, ez wekî Kurdekî serbixwe û şexsî jî azad im, ji bo min ne xeyal e. Çi dibe bila bibe piştgiriya Kurdistana serbixwe dikim. Îro pêkanîna referandûmê nayê wateya dê serxwebûn bê îlan kirin. Lê îro her Kurdekî ku jenosîda Helepçeyê, Enfalê bi bîr bîne nikare bi wan kesên ku wan jenosîd kirine re di nav welatekî de bijî. Ez nabêjim divê em jî herin li wan komkujiyan bikin û Kurdan heta niha jî komkujî bi sere tu gelî de neanîne. Şerm e mirov nîqaşa 'Erê' bike. Kurdekî xwedî vîjdan divê bibêje 'Erê.' Ew welatê ku tu di nav de dijî, nasnameya te nas nekiriye. Ez dibêjim gotina 'Erê' ji bo her Kurdekî spartek e.

**Ji bo piştgiriya referandûmê projeyên te hene, eger projeyên te hebin tu bangî hunermendên Kurdan dikî?**

Li gor fikra min, pêkanîna referandûmê bi xwe jî trajedî ye. Kurd ewçend sal e di bin komkujî û dagirkeriyê re derbas dibin û em rabin serxwebûna xwe bidin pirsîn ji min re ecêb tê. Eger Tirkan referandûm pêk bianiyana normal bû ku em rabin li ser wê nîqaşan bikin. Ji ber vê yekê jî ez rast nabînim ku em li ser referandûmê nîqaşan bikin. Hewce nake em xebatên wisa bikin ji ber ku jixwe ev referandûm daxwaza me Kurdan e. Îhtimaleke mezin jixwe ez ê di meha 9 an de biçim Festîvala Filman a Duhokê. Ez ê yek bi yek di nav proseyê de cih bigirim. Ez pir meraq dikim ku ew kesên dibêjin na ji ber çi dibêjin na. Ez ê vê yekê bipirsim. Îro referandûm ne ji bo serokekî tê kirin. Ji bo Kurdistanê ye. Ya girîng ew e ku armanca referandûmê çi ye ji bo min. Ev referandûm nayê wê wateyê ku wê serxwebûn bê îlan kirin.

**Di derheqê welêt de hûn dixwazin çi bibêjin?**

Rewşa welêt... Tu jî dizanî ez têm û diçim carinan. Pirsgirêka me mezin e. Nêrîn û fikra me ya di derbarê referandûmê de ji bo Bakur jî derbasdar e. Ez bawer nakim ku kesên ji Bakur ji referandûmê re bibêjin na. Lê tu jî dizanî rejîma Tirkiyeyê hêvî nehiştine. Niha ez dinêrim ji bo Kurdên Bakur ji bilî şer tu tişt nemaye. Divê em Kurdên Bakur biryara xwe bidin û bilêv bikin. Gelo em serxwebûnê dixwazin an xweseriyê dixwazin divê em vê biryarê bidin. Lê mixabin hêviya min bi jiyana bi hev re nemaye. Li Osmaniyan fenûfût naqedin.

**Gotina min...**

Ez dixwazim bi hunera xwe ji bo gelê Kurd bixebitim. Ji bo rewşa xelkê xwe, bi riya hunerê çi ji destê min bê ez ê bikim û bînim ziman. Weke hunermendekî tu nikarî girêdayî partiyeke siyasî bî. Dema tu girêdayî partiyeke siyasî bî tu nikarî ji bo gelê xwe xebatê bikî. Hunermendekî bi serê xwe, dema partiyekê tiştekî baş kir divê piştgiriya wê bike. Dema xeletî jî bike divê li hember bisekine. Pirsgirêka me ne parçeyek ax e. Parçeyek ax em dikarin biçin Afrîkayê jî jixwe re bistînin û Kurdistanê ava bikin. Pirsgirêka me azadiya ziman û çand û jiyana me ye. Siyasetmederan na, lê hunermend û nivîskaran pergala cîhanê guherandine.

> Ez dixwazim bi hunera xwe ji bo gelê Kurd bixebitim. Ji bo rewşa xelkê xwe, bi riya hunerê çi ji destê min bê ez ê bikim û bînim ziman. Weke hunermendekî tu nikarî girêdayî partiyeke siyasî bî. Dema tu girêdayî partiyeke siyasî bî tu nikarî ji bo gelê xwe xebatê bikî.

## Piştî qedexeya 20 salan hûn vegeriyan welêt û we li Stenbolê jî qonsertek da...

Ji bo cara yekemîn dikarim bibêjim ku cihê ku me konsert lê da cihekî taybet e. Dezgeha Çand û Hunerê ya Stenbolê (İKSV) ew ne konserteke ji bo gel an jî ji bo me bû. Ew weke resepsiyonekê bû. Weke danasînekê... Ev kesê ku piştî 20 salan vegeriyaye welêt gelo çi dike? Sedema derketina wî çi bû û ew bi çi vegeriyaye? Ne bi armaceke siyasî lê bi armanca xebatên me yên taybet bû. Ji bo me girîng bû. Gaveke, resepsiyoneke vegera me ji bo welêt bû. Mixabin ew wisa ma. Ji ber ku rewş li Tirkiyeyê niha ne baş e. Me armanc dikir ku gelek resepsiyon û konsertên wiha li dar bixin. Lê ev jî girêdayî rewşa siyasî ne.

## Lê vegera welêt...

Vegera me ya welêt. Cihekî ku zarokatiya te li wir derbas bûye û tu li wir mezin bûyî. Te gelek kes li pişt xwe hiştine û tu çûyî. Piştî vegerê jî te careke din ew nedîtine. Ev xemgîniyek e. Piştî ew çend sal, ew çend zehmetî ku tu vedigerî welêt. Gelo li welêt çi guheriye? Gelek hest di mirov de olan didin. Dema tu teyî welêt û tu windakirinan dibînî. Bi rastî jî gelek tişt ji mirovan winda dibin. Careke din jiyaneke din tu dibînî. Guhertinên ku tu dibînî û ew nabînin him li gel wan him jî li xwe mirov dikeve hesaban. Hinek tiştan dixwazî fêm bikî lê nikarî... Tu dixwazî bikenî nikarî bikenî jî. Dixwazî hêstir birijînî nikarî xemgîn bibî. Zehmet e, gelekî zehmet e. Esas her çiqasî jî em ji çanda xwe dûr neketibin û karê me jî hebe li derve, mirov nikare bîne ziman ku piştî vegerê bilev bike bê ka gelo ev tişt çawa ewqas derbas bûn. Weke filmekî li pişt xwe bihêlî û careke din vegerî. Her perçeyekî, her avahiyeke ku tu dibînî û xira bûye. Di her cihekî de xeyaleke te derbas bûye. Tu ji axa te veqetandine û tu careke din weke kesekî xerîb vedigerî û li halê welêt dinêrî.

Di van salên dawî de em zêdetir we di filmên sînemayan de dibînin. Gelo karê aktoriyê zehmet e an yê dengbêjiyê?

Her karek li gor xwe xwedî zehmetiyan e. Lê eger tu weke hunerê lê binêrî ji hev pir ne dûr in. Zehmetiyên wan jî ji hev ne dûr in. Ez wisa bawer im ku ew kesê aktoriyê dike divê xwedî guhê muzîkê be jî. Divê bingeha çanda giştî hebe. Lê ji bo min gelekî hêsantir e. Ji ber ku ez ne weke aktor, min bi xwe jî nexwest ez bileyîzim. Kekê Bulent (Gunduz) kir. Kek Bulent xwest wê dokumanteriyê li ser jiyana min amade bike. Ji ber ku jiyana min a rastîn e û min tenê jiyana xwe ya rojane berdewam kir. Û ji ber ku min bi salan e di televizyonê de moderatoriya bernameyê kiriye, ji min re hinekî din hêsantir bû. Karê aktoriya sînemayê jî zehmet e. Pêwîst e tu du sê mehan li setê bî û bi hiş û bedena xwe tev li wir bî. Tenê divê tu di nava wî karî de bî. Wê jî li gorî xwe zehmetiyên xwe hene. Lazim e tu baş rola xwe bispêrî hundirê xwe. Lê karê din jî zehmet e. Bêyî xebat tu kar jî serkeftî nabe.

---



FIRAT CEWERÎ

## Em ê bên

Ewrê reş ê ku di salên 1980 û 1990î de bi ser welatê me de girtibû, em xistibûn hundirê bêhêvîtiyeke mezin û bêhn li me çikandibû. Hin ji me hatibûn girtin, hin kuştin, hin jî wek noka ku li tehtê bikeve her yek bi derekê de belav bûbûn. Niha, qet nebe li pereçene welatê me ew ewr ji hev feşkiliye, hêviyên me ên çilmisî geş bûne û em îro sibe li benda nûçeya îlankirina Kurdistaneke serbixwe ne.

Di hundirê wê bêhêvîtiya salên 1990î de, min di sala 1992an de bi navê Dr. Poloço di Rojnameya Welat de nivîsek bi sernava "Em ê bên" nivîsandibû. Min di nivîsê de hin tişt hêvî û xeyal kiribûn. Hin ji wan daxwaz û xeyalên min ên di nivîsê de bi cih hatin, lê mixabin dîsa hilweşiyan.

Min weha bang kiribû:

Hevwelatiyên hêja, gelê kurd! Em xwe kar dikin, em ê vegerin, em ê bên. Bi otobusan, bi balafiran, bi tirênan... Em ê bi zar û zêçên xwe ve werin. Em ê bi îngilîzî, firansizî, almanî, danmarkî, swêdî û norvecî vegerin. Ev ziman hemû ên me ne, em ê li wir pê bigerin. Ji kêfa vegera welêt zarokên me didin lotikan, kal û pîrên me kêf dikin, jinên me dilşa ne. Me xwe kar kiriye, tedarika xwe kiriye û em li ser rê ne. Em ne yek û du ne, em sed in, hezar in, dehhezar in. Em tibabek in, komeke mezin in. Em zarok in, kal û pîr in, keç û xort in. Em mêr in, jin in. Hin ji me karker in, hin xwendevan in, hin siyasetvan in, hin nivîskar in, hin burokrat in, hin karmend in. Em ê bi tûrikên tije vegerin. Di tûrikên me de Shakespeare, Tolstoy, Hugo, Gothe, Ibsen, Strindberg hene. Tûrikên me tije ne. Em ê bên! Em ê herin Bazîdê seredana Xanî. Em ê paçikên sêreng bi guliyên dara wî ve bikin. Em ê bi baxên gulan herin ser gorrên şehîdan. Em ê nema bigirîn, em ê bikenin, dîlanê bikin. Em ê li seranserî welêt bigerin. Em ê ava Dîcle û Firatê zelal bikin, jê vexwin. Em ê herin Heskîfê, xwe bikin bend, nehêlin ew binav bibe. Em ê li ser çiyayê Agiriyê li text û mîxên keştiya Nûh bigerin. Me li wir nedît, em ê berê xwe bidin çiyayê Cûdiyê. Em ê paşê dakevin Cizîra Botan, herin seredana dilketiyên kurdan, Memê Alan û Zîna Zêdan. Em ê wan bi miradê wan şa bikin. Em ê hêkelên wan biçikînin li binya malan. Em ê wan pîroz bikin, govendê bigerînin li dora wan. Em ê dûre herin dîwana Melê. Em ê ji dengê wî ê zîz li helbestên wî guhdarî bikin. Em ê Teyrên Feqî kedî bikin. Em ê bikişin Nisêbîna xopan paşê. Em ê herin Girnewas, şevekê li wir razên. Em ê li ber goristana Şêx Selmanê Pak fatîhayekê bixwînin. Em ê Darê ji nû ve vejînin. Em ê di Tilermen re derbasî Dêrika Çiyayê Mazî bibin. Em ê herin ser Pozê Qîza Qirêl. Em ê ji Kulêbê avê vexwin. Em ê li Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Êlaso û Edîp Karahan bipirsin. Em ê berê xwe bidin Diyarbekirê paşê, bedena wê ji nû ve lê bikin. Em ê dergehên wê ji neqencan re venekin. Em ê cih bi cih, gund bi gund, gav bi gav, bajar bi bajar bigerin. Em ê bela xwe di kesî nedin. Em ê pariyê devê xwe bi we re par ve bikin. Em ê welatê xwe bi we re ji nuh ve ava bikin. Em ê avên sar ji quntarên çiyan vexwin. Em ê nanê tenûrê bi hev re bixwin. Em êdî nema li hev dixin. Em ê navên kuçe û kolan, cih û deverên welêt biguherin. Em ê dibistana Cegerxwîn vekin. Em ê bingehê Zanîngeha Xanî biavêjin. Em ê Bîra Qederê ya Celadet Bedir-Xan bixetimînin. Em ê bên! Em ê ewrê reş ê ku bi ser welatê me de girtiye ji hev bifeşkilînin. Ji bo xwînkirina pozê zarokekî em ê dinyayê bi ser wan de hilweşînin. Em ê dest bidin destên hev, bi hev re bi xurtî bixebitin. Em ê dergehên girtîgehan vekin, dîwarên wan hilweşînin. Em ê girtiyan ber bi kar û xwendinê ve bikişînin. Em ê bên! Em ê wek gêrikan di civatê de belav bibin. Hinên ji me bixwînin, hin binivîsin, hin bixebitin, hin şîretan bikin, hin jî li şîretan guhdarî bikin.

Em ê bên! Piştî xweşkirin û geşkirina welêt, em ê bi azadî, bêtirs destên xwe di ser stûyên hev re bibin û di kuçe û kolanên bajarên xwe de bigerin.

Em ê bên
Û em ê bibînin
Çawa ji kezeba axê simbil diperçivin
Kulîlkên çiyan çawa vedibin
Çawa geş dibe gîha li mêrgan.
Em ê bên
An îro
An sibe
Em ê bên xwişk û birano
Em ê bên!

# Li ser sînor rojane kolberên Kurd tên qetilkirin

ESKENDER CEIFERÎ



Li bajarê Bane yê Rojhilatê Kurdistanê xwepêşandan û meşên girseyî li dijî kuştina kolberan hatibûn organîzekirin, lê rastî êrîşa hêzên ewlehiyê yên Îranê hatin û komek ji welatiyên sivîl birîndar bûn û çend kes jî hatin girtin. Herwiha çalakvanên bajarên Pîranşar, Ormiye, Sine, Serdeşt û Merîwanê jî piştevaniya xwe ji bo hêrsa Baneiyan nîşan dan û ragihandin, ew ê jî vê mehê li bajarên xwe li dijî kuştina kolberan xwepêşandanan pêk bînin û dengê xwe bilind bikin.

**Di heyama salekê de 96 kolber hatin kuştin**

Rojek nîn e ku kolberekî Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê Pasdarên Îranê ve neyê kuştin yan jî birîndarkirin. Di heyama mehekê de herî kêm 20 kolberên Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê Pasdarên Îranê ve hatine kuştin û birîndar bûne. Piraniya kolberên ku hatine kuştin û birîndarkirin, xelkê parêzgeha Ormiyê ne û herî zêde jî xelkê bajarê Serdeştê bûne. Di nav kolberên ku hatine kuştin de, xortekî 17 salî jî hebû ku xelkê bajarê Makûyê bû û li ser sînor ji aliyê pasdaran ve hat kuştin.

Li gorî amarên Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê, ku sipartiye agahiyên di navbera meha Adara sala 2016an heya Adara 2017an, li sînorên Rojhilatê Kurdistanê 96 kolber hatine kuştin û 64 kolber jî bi sedemên cuda birîndar bûne. Li parêzgehên Sine, Kirmaşan û Îlamê û Ormiyê, destûra kolberiyê tê dayîn lê tevî vê jî, ji bo êrîş û teqeya ser kolber û kasibkarên Kurd destûr ji hêzên sînorî re tê dayîn û ew ji êrîşê re serbest in.

> Li gorî amarên Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê, ku sipartiye agahiyên di navbera meha Adara sala 2016an heya Adara 2017an, li sînorên Rojhilatê Kurdistanê 96 kolber hatine kuştin û 64 kolber jî bi sedemên cuda birîndar bûne.

**NY jî êşa kolberan dizane**

Asma Cihangîr Raportera taybet a Netewên Yekbûyî ji bo pirsên mafên mirovan li Îranê ji vê dewletê dixwaze, êdî kuştina kolberên Kurd li Îranê rawestîne û dawiyê li zîndanîkirin û eşkencekirina netewên cuda li Îranê bîne û dibêje: Desthilatdarên Îranê di binpêkirina mafên netewan de berdewam in û tenê di pênc mehên destpêkê yên sala 2017an de, zêdetirî 30 kolberên Kurd bi guleyên rasterast ên hêzên ewlehiya Îranê yên sersînor hatine kuştin û 90 kolberên din jî bi heman sedemê birîndar bûne lê qet hikûmet lêpirsînê li êrîşkeran venake.



Li gor benda 25an a Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan, Xurek, cil û berg, xanî, xizmetên tenduristiyê û xizmetên civakî yên pêwist jî di nav de mafê her mirovî heye ku bibe xwedî asta jiyaneke guncaw a ku karibe gumrehî û tenduristiya wî û malbata wî pêk bîne. Her mirov ji ber rewşa bêkarî, nexweşî, seqetî, bîtî, pîrûkalitî an jî gava ku ji derfetê debarê bêyî hemd û vîna xwe bêpar bimîne û ji bo rewşên din, xwedî mafê ewlehiya civakî ne. Dê û zarok, pêştir û bi taybetî xwedî mafê pûtepêdayîn û alikariyê ne. Hemû zarok, çi di dema zewacê de û çi jî li derveyî zewacê çê bûne divê ji heman ewlehiya civakî sûdê wergirin. Lê kolber hene 70 salî û yên 13 salî jî hene. Kesek li mafên zarokan jî napirse û li mafên pîran jî napirse.

Li gor yasayeke hikûmeta Îranê ku di encûmena wezîrên wî welatî de de hatiye pejirandin, sînorên kolberiyê li Rojhilatê Kurdistanê têne girtin û weke navçeyên bazirganiyê radestî gumrika Îranê têne kirin ji ber ku li gor hikûmeta Îranê, ew navçeyên sînorî, navçeyên ne yasayî û qedexe ne ji bo bazirganiyê. Li gor vê yasayê, êdî sînorên kolberan li parêzgehên Sine, Kirmanşan û Ormiyê yên Rojhilatê Kurdistanê û Sîstan û Belûcistanê li başûrê rojhilatê Îranê têne girtin û kesek nikare bêy hebûna derfeta kolberiyê, vî karî bike.

Di 5 mehên derbasbûyî de li Rojhilatê Kurdistanê 53 kolber hatine kuştin û Navenda Çalakvanên Mafên Mirovan ragihandiye ku tevahiya wan kolberan bi teqeyên raseterast ji aliyê Pasdarên Îranê ve hatine kuştin. Herwiha navenda çalakvanan diyar dike ku ew kolber, xelkê bajarên Merîwan, Serdeşt, Şino, Bane, Pîranşar û Newsûdê, Ormiye, Makû, Mehabad û Seqizê ne. Gelek caran kolber têne girtin jî û ji bilî kuştina kolberan, ew kolberên tên girtin, li gor yasayên Îranê bi madî û girtinê tên cezakirin.

> Ji bilî vê yekê ku gelek kolber ji aliyê hêzên sersînor ve têne kuştin, her sal çendîn kolberên Kurd ji ber serma û sexletê yan jî di encama teqîna mayînan de li çiyayên ser sînor canê xwe ji dest didin yan jî birîndar dibin.

## Sipaya Pasdaran guh nade Xamîneyî!

Elî Xamineyî, rêberê Komara Îslamî, sala derbasbûyî ferman dabû hêzên ewlehî teqeyê li kolberên Kurd nekin. Serdozgerê giştî yê Îranê jî gotibû, ew kesên ku li ser sînor kolberiyê dikin nabe rastî zor û êrîşê bên ji ber ku tekane çavkaniya jiyana wan kolberî ye. Wî behsa kolberên Kurd ên ku li ser sînor bi piştan barberiyê dikin jî kiribû û gotibû ew kesên kolberiyê dikin divê hêsankarî ji wan re bê kirin û rastî zor û êrîşê neyên ji ber ku tekane çavkaniya jiyana wan kolberî ye.

Çendîn caran jî heya niha, kolberên xelkê Başûrê Kurdistanê li nav axa Başûr ji aliyê Pasdarên Îranê ve rastî teqeya rasterast hatine.

Kuştina kolberan di demekê de ye ku heta niha ti navendeke dadweriyê ya Îranê behsa amarên kuştina wan nekiriye. Ji bilî vê yekê ku gelek kolber ji aliyê hêzên sersînor ve têne kuştin, her sal çendîn kolberên Kurd ji ber serma û sexletê yan jî di encama teqîna mayînan de li çiyayên ser sînor canê xwe ji dest didin yan jî birîndar dibin.

# Dengê hevpeymanên Îranê li dijî serxwebûna Kurdan kêm bûye

Êdî Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK) tam bi serxwebûna Kurdistanê re ye. Dengên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û YNKê dikarin li kêleka hev, her hêzeke dagirker ku weke rejîma Beis bixwaze Kurdistanê dagir bike, bêbandor bike. Rast e hin aliyên biçûk li Herêma Kurdistanê dijatiya serxwebûnê kirine û hin dewlet jî pişta wan digirin, lê bi yekbûna dengê wan du partiyan, serxwebûn misoger dibe.

Heftiya derbasbûyî li navçeyên sînorî yên di navbera Başûr û Rojhilatê Kurdistanê de alozî di navbera xelkê gundekî Başûr û pêşmergeyên Komele de derket. Di encamê de hin kes bûne qurbanî. Piştî demekê hate îdiakirin ku eger destê Komara Îslamî jî di mijarê de tine be, ew ê hewl bide dest bixe nav mijarê da ku partiyên Rojhilat neçar bikin ji navçeyên sînorî derkevin. Wan partiyan beriya niha ragihandibûn ku ew amade ne bi hemû şêweyekî ji bo serxwebûnê piştevaniya Herêma Kurdistanê bikin.

Çavên Komara Îslamî li YNKê bûn da ku ji bo dijatiya referandûmê pişta Îranê bigire. Lê her berpirsekî vê partiyê bi daxuyaniyeke cuda, bersiva wan dide. Necmedîn Kerîm Parêzgarê Kerkûkê ji Jan Kubis Nûnerê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî re gotiye ku wê Kerkûk jî tevlî referandûma serxwebûna Kurdistanê bibe. Got, ev 12 sal in ku li Kerkûkê hilbijartin nehatine kirin û em vê qebûl nakin ji ber ku bêparkirina Kerkûkê ji vê pêvajoyê zilmek e ku li xelkê vî bajarî tê kirin.

**“Em piştgiriya hevdîtinên Hewlêr û Bexdayê dikin”**

Tevî ku Herêma Kurdistanê dibêje ew ji bo razîkirina Bexdayê bi cîrantiya Kurdistanê weke dewleteke cuda diçin Bexdayê, lê Îran hemû rêkaran ji bo rêgirtin li serxwebûna Kurdan bi kar tîne. Behram Qasimî berdevkê Wezareta Derve yê Îranê ragihandiye ku welatê wî piştgiriya hevdîtinên di navbera Hewlêr û Bexdayê de dike. Dibêje pêwendiyên me yên baş ligel xelkê Herêma Kurdistanê hene û di baweriya me de demokrasiya biçûk ya li Iraqê wê dixwaze ku her aliyek hewla aramî, ewlehî û avadankirina wî welatî û dûrxistina teroristan ji nava vê axê bide lê perçekirina Iraqê, rewşê aloz dike.

**“DYA di pratîkê de piştevaniya serxwebûna Kurdistanê dike”**

Hisên Neqewî Berdevkê Komîteya Asayişa Netewî û Siyaseta Derve ya Parlementoya Îranê jî ragihandiye ku DYA destêwerdanê di karûbarên Rojhilata Navîn de dike û di pratîkê de piştgiriya serxwebûna Kurdistanê dike û dixwaze Kurdistan ji Iraqê cuda bibe. Got jî Îran, gotina xwe li ser çapemeniyê dibêje û li meydanê jî yekparçebûna Iraqê diparêze lê DYA



tevî ku hewla parçekirina Iraqê dide, di çapemeniyê de behsa van mijaran nake.

**Tirkiyeyê daxwaza Îranê nepejirand!**

Li gor îdîaya hin çavkaniyên navdewletî, Muhammed Baqirî Serokerkanê Giştî yê Îranê di serdana xwe ya Enqereyê de daxwaz ji rayedarên Tirkiyeyê kiriye ku bi hev re li dijî referandûma serxwebûna Kurdistanê derkevin ku biryar dê di 25ê Îlonê de bê encamdan. Her wisa hatiye îdiakirin ku Enqerê ev daxwaza Serokerkanê Îranê nepejirandiye.

Muhdî Ehmed Someydayî Muftiyê Iraqê encamdana referandûmê li Herêma Kurdistanê red kiribû û ew prose, wek terora nû binav kiribû. Dr. Ebdula Seîd Serokê Yekitiya Zanayên Kurdistanê jî bertek da gotinên wî û ragihand, saziya wan li bendê bû muftî xwe ji lîstokên siyasî rizgar bikira û qut û xwarina bi sedan hezar xelkê feqîr û hejar yê Kurdistanê şermezar bikira ne ku dijatiya mafên wan bikira.

## “Tirkiye sînorên xwe nagire û pêwendiyên xwe qut nake”

Neyarên referandûma serxwebûna Kurdistanê dibêjin, eger referandûm were kirin wê Tirkiye û Îran sînorên xwe bigirin. Mevlût Çavûşoglu Wezîrê Derve yê Tirkiyê çû Kurdistanê û bi Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re hevdîtin kir. Hêmin Hewramî Şêwirmendê Serokê Herêma Kurdistanê dibêje, zêdebarî helwesta fermî ya Tirkiyê li ser referandûma serxwebûna Kurdistanê, lê Tirkiye ne sînorên xwe li ser Kurdistanê digire ne jî pêwendiyên aborî û bazirganî yên xwe bi Kurdistanê re qut dike.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Sê welatiyên Kurd ên bi navê Bêhzad Beraderan, Saman Sebzî û Hamid Sebzî li gundê Ehmedawa li Tikabê rastî lêpirsînê hatin û piştî rojekê serbest hatin berdan. Girtina wan sê kesan bi tometa endametî di rêxistinên selefî de hatiye encamdan. Hêzên Îstixbarata Îranê ew sê kes piştî rojekê serbest berdan û ji wan re ragihandin ku heya demeke nediyar nabe ji Îranê derkevin. Piştî teqîna li ser qebra Rûhulla Xumeynî avakerê Komara Îslamî ku du mehan beriya niha hate encamdan, nêzîkî 200 welatiyên Kurd ji aliyê hêzên Sipaya Pasdaran û Îstixbarata Îranê ve hatine girtin.

Dosyeya Xelîl Şahî ku bi tometa endametî di partiyeke Kurdî de bi şeş salan girtîgehê hatiye cezakirin, ji bo pêdeçûnê radestî dadgeha pêdeçûnê ya Ormiyê hatiye kirin. Xelîl Şahî ragihandiye ku eger hikm ji aliyê dadgeha pêdeçûnê ve neyê kêmkirin, dibe ku di demeke nêzîk de ji bo derbaskirina hikma xwe here girtîgehê. Xelîl Şahî bi danîna Kefaleta 200 milyon Tumenî li derveyî girtîgehê ye.

Herî kêm çar girtiyên Kurd ên bi navên Seîd Şîrzad, Zanyar Muradî, Luqman Muradî û Mihemed Nezerî ji nêzîkî mehekê beriya niha ve li girtîgeha Recayî Şehr ketine gireva birçîbûnê. Sedema girevê, givaşa berpirsên girtîgehê li ser girtiyên siyasî û rênedana hevdîtina bi malbatê re ye.

Keçeke Kurd a bi navê Sara Rustemî 28 salî û xelkê bajarê Sine di hotelekê de li Bane hate girtin. Ev keça Kurd bi tometa endametî di partiyeke Kurdî de hatiye girtin û di dema girtinê de rastî lêdanê hatiye. Heya niha malbata Sara Rustemî nezaniye ka gelo keça wan li kuderê tê ragirtin. Hêzên ewlehî di dema girtina Sara de ti belgeyeke dadgehê nîşanî wê nedane.

Riza Neqîzade rêveberê Saziya Kar ya parêzgeha Ormiyê ragihand ku nêzîkî 140 karkerên kargeha derxistina zêran a Zerşûrana Tikabê ji kar hatine dûrxistin. Heya niha sedema dûrxistina wan karkeran nehatiye zanîn lê tê gotin ku ti yek ji wan karkeran ji çend mehan beriya niha ve mûçeyên xwe nestandine.

Seyîd Şehab Husênî xelkê gundê Bîjawa yê Şinoyê bi 3 salan girtîgehê hate mehkûmkirin. Tometa wî endametî di partiyeke Kurdî de hatiye ragihandin. Wî welatiyê Kurd, daxwaza pêdeçûnê radestî saziya Dad kiriye. Seyîd Şehab Husênî nêzîkî salekê beriya niha bi tometa alîkariya pêşmergeyên partiyeke Kurdî li Şinoyê hate girtin.

Li Serdeştê kolberekî Mehabadî bi navê Araz Ahî bi teqeta hêzên ewlehî hate kuştin.

Li Bane du kolber ên bi navên Heyder Ferecî û Qadir Behramî ji aliyê hêzên sersînor ve hatin kuştin. Di xwepêşandanên şermezakirina vê bûyerê de jî deh kes hatin girtin.

Kolberekî Kurd ê bi navê Wehîd Dewletxahê Cinîkanlû ku 17 sal temenê wî bû, di encama teqeya rasterast ya hêzên sersînor de jiyana xwe ji dest da. Kuştina wî di demekê de bû ku ti kelûpeleke qaçax bi wî re nebûne. Ev di demekê de ye ku piştî çend rojan ajansên dewletê ragihandin ku wî di encama bûyerekê de jiyana xwe ji dest daye.



> Herî kêm çar girtiyên Kurd ên bi navên Seîd Şîrzad, Zanyar Muradî, Luqman Muradî û Mihemed Nezerî ji nêzîkî mehekê beriya niha ve li girtîgeha Recayî Şehr ketine gireva birçîbûnê. Sedema girevê, givaşa berpirsên girtîgehê li ser girtiyên siyasî û rênedana hevdîtina bi malbatê re ye.

Kolberekî bi navê Riza Layiqiyê Mîlan di encama teqeya hêzên ewlehî de bi tundî birîndar bû û ji bo nexweşxaneya Makûyê hate veguhestin. Bijîşkan ragihand ku rewşa tendurustiya wî xirab e.

Li Îlamê xwendekarekî Kurd ê bi navê Suhêyl Mihemedpûr ji aliyê çekdarên hêzeke ewlehî ya Îranê ve hate girtin. Heya niha nehatiye zanîn ku Suhêyl ji bo çi hatiye girtin.

Îstixbarata Îranê li Kirmaşanê ji Heyder Elhasî re ragihand ku divê kurê xwe ku endamê partiyeke Kurdî ye, vegerîne û radestî Komara Îslamî bike. Heya dema ku ew vedigere, divê bavê wî her hefte ji aliyê vê saziyê ve rastî lêpirsînê bê.

Sê girtiyên Kurd li girtîgeha Ormiyê bi navên Resûl Şayir, Hejar Şayir û Ebdulwahîd Selamet daxwaza pêdeçûnê bi hukmên xwe de kirine. Ew welatiyên Kurd ku zêdetirî 8 mehan beriya niha hatine girtin, her yek ji wan bi tometa endametî di rêxistinên selefî de bi pênc salan girtîgehê hatin cezakirin. Ew sê kes çendîn mehan ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve li Ormiyê rastî lêpirsînê hatin.

Li bajarê Sine, çalakvanekî komonîst bi navê Ebas Enderyanî ji aliyê hêzên Îstixbaratê ve rastî lêpirsînê hat. Sedema lêpirsînê beşdariya wî di rewresmên karkeran de bû.

# Lûtkeya hêzên pêş dikevin: BRICS

MISTEFA PÎRAN

Lûtkeya BRICS(Brazil, Rusya, Hindistan, Çîn û Afrîqaya Başûr) bi serpereştiya Çînê di 3 – 5ê Îlonê de hat lidarxistin.

Lûtkeyê li bajarê Şiamin ya eyaleta Fucien a Çînê 3 rojan berdewam kir. Di Lûtkeyê de Serokê Brazilê Michel Temer, Serokê Rusyayê Vladimir Putin, Serokê Afrîqaya Başûr Jacob Zuma, Serokwezîrê Hindistanê Nerandra Modi, Serokê Çînê Şi Cinping û karsaz beşdarbûn.

Di Lûtkeya BRICSê ku bi serpereştiya Çînê hat kirin de rojev, aboriya gerdûnî, veberhêneriya bazirganiyê, hevkariya fînansî û komunikasyon bûn. Di Lûtkeyêde bi welatên pêşdikevin re jî danûstandin hatin kirin. Bi vê armancê ji bilî BRICSê Misr, Gîne, Meksîka, Tayland û Tacikistan jî di asta serokatiyê ve beşdar bûn. Lûtke ji aliyê 80 welat û zêdetirî hezar rojnamegeran ve hat şopandin.

Lûtke heta niha 9 cara civiyaye. Welatên BRICSê cara yekem di asta Wezîrên Derve yên van welatan ve di sala 2006an de di Civîna Giştî ya Neteweyên Yekbûyî de civiyabûn. Lûtkeya yekem jî di sala 2009an de li Rusyayê pêk hatibû. Welatên BRICS her sal li welatekî di asta Serokan de dicivin. Serpereştiya îsal Çînê kir. Her sal mijarên cuda bên axaftin jî îsal aboriya gerdûnî, veberhêneriya ticaretê, hevkariya fînansî û komunîkasyon bûn. Temaya Lûtkeyê ya îsal "Ji bo dahatûyek ronahîtir şirîkatiyek bihêz" bû.

**Nexşerêya BRICSê**

Lûtkeya her sal bi naverokeke cuda dicive îsal bi naverokên hêsankirina bazirganiyê, kar û berên swapê(Dan û Stendin), pevguhertina pereyên herêmî, tevkariya kargehên taybet û bi fermî hatin nirxandin. Serokê Çînê Şi di derbarê civîna BRICSê de civîna ragihandinê lidarxist û wiha axivî: " Serokên BRICSê di mijarên hemahengî, siyasî û hevkariya aborî de di heman fikrê de ne." Gavên sazbendkirina BRICSê tên avêtin. Şî diyar dike ku civîna BRICSê ya sala were dê li bajarê Johannersburg a Afrîqaya Başûr bê sazkirin.



Di lûtkeyêde bi welatên pêşdikevin re jî danûstandin hatin kirin. Bi vê armancê jibilî BRICSê Misr, Gîne, Meksîka, Tayland û Tacikistan jî di asta serokatiyê ve beşdar bûn.

**'Bertek li hember ceribandina nukleerî, teror, gendelî û bazirganiy parastî'**

Di civînên Lûtkeyê de bertek li hember ceribandinên nukleerî yên Koreya Bakur, gendelî, teror û bazirganiya parastî hatin nîşandin û aboriyeke zelal ya cîhanê û bazirganiya piralî hat pêşniyazkirin. Di civînê de mijarên bazirganî, binesazî, aborî, ewlekariya sîberî û e- ticaret hatin axaftin.

Serokê Çînê Şi Cinoing destnîşan dike ku BRICS di mijarên aboriya zelal, pergala piralî ya aborî, girîngiya hevkariyê ku herdu alî kar bikin, di rêkeftinên bi pir alî de di demên teng de derbas dibin û di mijara berxwedana li hember guhertina keşûhewayê de bêdilî heye.

BRICS di van deh salên derbasbûyî de rêjeya aboriya xwe ji sedî 12an, derxist ji sedî 23an. Ev dem weke 'deh salên zêrîn' tê binavkirin û herwiha ji bo duyem heyama 'deh salên zêrîn' daxwaz ji serokên BRICSê hat kirin ku hevkariya kar û ber, aborî û di mijarên çaksaziyê de hemahengiya di navbera xwe de xurttir bikin.

## BRİCS çiye?

Têgiha BRICSê cara yekem ji aliyê Serokê Birêveberiya Goldman Sachs Jim O'Neill ve di sala 2011an de hatiye bikaranîn. Pêdiviya Cîhanê di Warê Aboriyê de Zêdetir bi BRICSê heye'(The World Needs Better Economic BRICS) hat weşandin û ev Lûtke ji navên van welatan yên bi Îngilîzî hat amadekirin. Navê komê ji tîpa yekem a van welatan pêk hatiye. (Federative Republic of Brazil, Russian Federation, Republic of India, People's Republic of China)

Di serî de bi navê 'Koma Çaran', 'Big Four' an jî 'Çare Asa' aboriya cîhanê dihatin binavkirin. Piştî Komara Afrîqaya Başûr (Republic of South Africa) jî beşdarî vê komê bû hejmara endamên vê komê bû pênc.

BRICS weke komeke ku wê di 50 salên pêşiya me de tesîrê li cîhanê bike derdikeve pêş. BRIC bi serpereştiya Brazil, Rusya, Hindistan, Çînê dereketibû holê, herî dawî jî di sala 2011an de bi beşdariya Afrîqaya Başûr navê komê bû BRICS. Her welatekî endamê BRICSê ku xwedî taybetmendiyên xwe bin jî tişta wan nêzî hev dike aborî û nifûsa wan e. Rêjeya hejmara nifûsa van welatan li cîhanê ji sedî 40 e û aboriya wan jî li cîhanê ji sedî 25 e. Ev welat bi pêşketina aboriya xwe ya di demeke kurt de derdikevin pêş. Armanca wan a hevbeş jî di mijarên cîhanê de zêdetirîn hêza xwedî gotinê ye. Pêşdeçûna endamên vê komê li herêmên xwe û cîhanê de, girîngiya vê komê radixe ber çavan.

Welatên BRICSê di nav nifûsa cîhanê de xwedî cihek girîng in. Li gor nirxandina pisboran wê dahata BRICSê di nav aboriya cîhanê de di sala 2025an de bigihîje ji sedî 20 û li seranserê cîhanê tesîra wê jî dê bigihîje ji sedî 40î. Her wiha tê dîtin ku dê di sala 2050an de hêza wê dê ne tenê di warê aboriyê de, di warên siyasî û leşkerî de jî wê bibe yek ji serekeyên cîhanê. Bingeha BRICSê hêza bi aborî û siyasî ye. Hêza xwe xurt bike û di mijarên navdewletî de bibe xwedî giringiyeke cuda. Pêşketina BRICSê dibe sedem ku endamên wê jî pêş bikevin û aborî û hêza xwe baştir bikin. Ji ber vê yekê jî ji endamên BRICSê re 'Hêzên Pêşdikevin' tê gotin. Wê di mijarên siyasî û aborî de li hember yek qutbiya cîhanê de dê bibe xwedî biryar û bi vî awayî jî cîhaneke zaftir adilane û parvekirineke wekhev.

BRICS ji bo li hember IMF û Bankeya Cîhanê ku piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê hatin avakirin zaftir bibe xwedî hêz hat avakirin. Di civîna li bajarê Fortaleza ya Brazîlê de biryara avakirina Bankeya Geşedanê (Kalkinma Bankasi) ku dê hemû bingeha ticarî ya cîhanê biguherîne hat stendin. Ev biryar doza BRICSê li hember IMF û Benkeya Cîhanî ku bazirganî û aboriya cîhanê diyar dikin, fonên aborî hat xwendin. Ev biryar wisa tê nîrxandin ku dê ji bilî bihêzbûna serjimara endamên BRICSê di derbarê aboriya navdewletî de jî destê van welatan xurt bike.

---

# Li hemberî Katalanan qedexeya referandûmê

Li Ewropayê yek ji wan miletan a ku li hêviya serxwebûna xwe ye, Rêveberiya Xweser a Katalonyaya ku dikeve rojhilata Spanyayê. Biryara pêkanîna referandûmê di 1ê Cotmehê de ya Rêveberiya Xweser a Katalonyayê, ji aliyê Dadgeha Bingehîn ya Spanyayê ve hat sekinandin. Piştê ku meclîsa Katalanan biryara referandûmê hilda, Serokê Spanyayê Mariano Rajoy serî li dadgehê dabû. Biryara sekinandina biryara referandûmê piştî vê serîlêdanê hat girtin..

Di parlamentoya Rêverberiya Xweser a Katalonyayê de " Yasaya Referandûmê " hatibû qebûlkirin û ligel vê qebûlkirinê endamên hikûmeta Katalonyayê jî biryara referamdûma serbixwebûnê a 1ê Cotmehê îmze kirin û îlan kirin, lê ev biryar piştê 24 saetan hat sekinandin

Beriya biryarê Serokê Spanyayê Mariano Rajoy ravekiribû wê vê carî destûr nedin ku tu hêmanên di referandûmê de wek sindoqa dengan, navendên dengdayînê, lîsteya hilbijartinê an jî maseya hilbijartinê bikarbînin.

Li gorî yasayên heyî yên li Spanyayê heta ku Dadgeha Bingehîn, biryarên bo îtirazên ku qebûlkirine bide, ne pêkane ku him yasaya ku di parlamentoya Katalonyayê de derket him jî îlankirina referandûma serxwebûnê ya hikûmeta Katalonyayê, bê kirin. Lê belê serokên Katalan tevî biryara dadgehê dibêjin ku wê referandûmê pêk bînin.

**Gefa hiqûqî li ser parlamenterên ku biryara referandûmê girtîbûn**

Herêma Katalonyayê ku bi 7,5 milyon gelheya xwe û ziman û teamûlên xwe ve ev demek dirêj e ku bo serbixwebûnê hewl dide. Serokê Rêveberiya Xweser a Katalonyayê Artur Mas di 27ê Îlonê de biryara hilbijartinên pêşwext îmze kiribû û ev biryar bûbû sedema nîqaşê. Mas, diyarkiribû ku eger partiyên ku serxwebûnê dixwazin di hilbijartinê de piraniya dengan bigirin wê Herêma Katalanya di nav 18ê mehan de serxwebûna xwe îlan bike. Herêma Katalonya di nav aboriya Spanyayê de wek cihê pêncemîn digire.

**Partiyên serxwebûnxwaz zêdetirî 70 kursiyan bidest dixin**

Tê çave rê kirin ku li gorî anketekê ku berê hatibû çêkirin, di meclîsa Katalan ya 135 kursiyên wê hene de, partiyên serxwebûnxwaz wê 68-72 kursiyan bi dest bixin. Di Meclîsa Katalonyayê de hefteya borî mijara referandûmê hatibû axaftin û biryara referandûmê bi piraniya qebûlkirina dengan ve hat pêjirandin. Dozgerên Spanyolî amaje kiribûn ku wê di derheqê serokên Katalan yên ku biryara referandûmê girtibûn de lêpirsina cezaî bê kirin. Serdozger Jose Manuel Maza jî li ser amadekariyên referandûmê yên hikûmeta Katalan lêkolîn dabû destpêkirin.



## 2014an ji sedî 80ê xelkê gotibû, 'Erê'

Gefa hiqûqî li ser parlamenterên ku bo referandûmê deng avêtîbûn heye. Li Katalonyayê di 9ê Mijdara 2014an de referandûma ku bo serxwebûnê hatibû kirin piştê îtiraza hikûmeta Spanyayê bi biryara Dadgeha Bingehîn bi heman rengî wek derqanûn hatîbû îlankirin.

Sala par Katalonya piştê Îskoçyayê bûbû herêma duyem ku serxwebûna xwe biribûn referandûmê û ji sedî 80ê Katalanan gotibû, 'Erê'. Lêbelê Dadgeha Bingehîn ya Spanyayê diyarkiribû ne pêkan e ku encama referandûmê bê bicîkirin. Her çi qas di referandûmê de gel ji sedî 80ê gotibe 'Erê' jî referandûm tenê di wateyeke sembolîk de ma.

---

# Ji bo nexweşiya pençeşêrê çareseriyeke 'zêr'în

Ji bo nexweşiya pençeşêrê çareyeke nû hat dîtin. Lêkolînên ku li ser vê nexweşiyê tên kirin didin xuyakirin ku bandoreke bihêz ya zêr li hemberî pençeşêrê heye.

Encamên lêkolînên zanistên Zanîngeha Edinburgê, ji bo bi hezaran nexweşên pençeşêrê bûye hêviyeke mezin. Li gor van lêkolînan bi taybetî bandora dermanên di tedawiya şaneyên (Hücre) pençeşêra pişikê bi nanopartikûlên zêran hatiye zêdekirin. Nanopartikûlên zêran yên ku weke pirtikên zêra tên nasîn, dixin cîhazekî kîmyasal. Di wir de hat dîtin ku zêr reaksîyonên kîmyewî zûtir û katalîzetir dike. Piştî lêkolînan hat dîtin ku di zindiyan de bandorek neyênî rû nedaye.



Nanopartikûlên zêran yên ku weke pirtikên zêra tên nasîn, dixin cîhazekî kîmyasal. Di wir de hat dîtin ku zêr reaksîyonên kîmyewî zûtir û katalîzetir dike. Piştî lêkolînan hat dîtin ku di zindiyan de bandorek neyênî rû nedaye.

**Li gor lêkolînan zêr bandoreke neyînî çênake**

Ev rêbaza ku hatiye dîtin heta niha li ser mirovan nehatiye bikaranîn, armanc ew e ku raçînkê saxlem bêyî ku xisarê bibîne, tenê cihê lê nexweşî heye baş bike. Tê çaverêkirin ku di tedawiya kemoterapî de bandora wê ya neyênî kêm bibe. Tedawiya niha ya kemoterapiyê şaneyên pençeşêrê dikûje, lê zirarê dide şaneyên baş jî. Lê di encama lêkolîna niha de tê çaverêkirin ku zêr bandorek wiha çê nake.


## Piştî testkirinê wê li ser miraovan jî bê ceribandin

Lêkolînerên Zanîngeha Edinburghê ceribandina yekem li ser mejiyê masiyê zebrayê çêkiriye. Cîhazê ku xistine mejiyê masiyê zebrayê hatiye dîtin ku performanseke bi bandor nîşan daye. Lêkolîner di wê baweriyê de ne ku ev ceribandin ji bo hemu zindiyan bê bikaranîn.

Dr. Asier Unciti-Broceta, yek ji wan lêkolîneran e ku di vê projeyê de cih girtiye dibêje me berê taybetmendiyên zêr yên ku heta niha nayê zanîn bi çapemeniyê re parvekirine. Her wiha diyar dike, encamên ku bi dest xistine, madeyên di hundir ûra metalînê de ye ji bo bi awayekî serbest xwe berde dikarin bikarbînin. Ceribandinên di derbarê vê xebatê de wê berdewam bikin. Tê çaverêkirin beriya ev cîhaz li ser mirovan were ceribandin di hin qonaxên cûda de derbas bibe. Eger test encamên erênî bidin wê li ser însanan jî ev bê ceribandin.

---

# Misriyên Antîk derbasî Awistralyayê bûbûn?



Hat îdîakirin, li ser hiyeroglîfa ku li Awistralyayê hatibû dîtin û ya komeke Misriyên kevn bû, hatiye tespîtkirin ka çi nivisiye. Tê gotin ku ev hiyeroglîf ji aliyê Misriyên berê ve beriya derdora 5 hezar salan hatiye nivîsîn.

Lêkolîneran li ser vê hiyeroglîfê gelek tiştên ji hev cuda gotin. Niha jî li ser wê fikrê tê sekinîn ku Misriyên kevn di navbera okyanûsan de rêwitî kiribin. Pirsa gelo şaristaniyeke pêşketî ya weke Misriyan li cîhanê geriyaye, piştî diyarkirina nivîsên li ser vê hiyeroglîfê wê bersiva xwe bibîne û derkeve holê.

Hiyeroglîfa Gosford Glyphs weke delîlekî bihêz yê li ser rêwitiya Antîk Misiriyan bo parzemînên din, tê dîtin. Ev hiyeroglîf di salên 1900an de hatiye dîtin û li ser kevirekî mezin ji setên sembolan pêk tê û lêkolînên li ser vê hiyeroglîfê zêdetirî sed salen e berdewam dikin.

Vê hiyeroglîfa ku wê gelek mijaran zelal bike, zanistên cîhanê kiriye du beş û aliyek bigûman û fikare ku nivîsên li ser vê hiyeroglîfê hatibin xwendin. Lê yên ku baweriya wan bi xwendin û diyarkirina nivîsan heye jî ne kêm e.

Heta hin pispor îdîa dikin ku ev hiyeroglîf Misriyan e. Li gor van pisporan hiyeroglîf mîna wan nivîsên li ser kevirên li Misrê ye û gelek belawela xuya dike.

## Hin hevokên ku tê îdîakirin li ser hiyeroglîfê dinivîsin

-Prens mirovekî nazik û xêrxwaz bû. Li ser şopa Xwedayê Rojê, Ra bû.

-Nebat li ber sekeratê ne. Girav dimire. Ev e gelo Xwedayê mezin yê Mer a Pîroz?

-Careke din nikare qet li aliyê av/çemên Mer a Pîroz bisekine. Bavê gerdûnê rûhê biratiyê yê min bigire û hembêz bike.

-Me xwe parast.

-Ev mirovê bêhempa NEFER-TI-RU ji Perestgeha Xwedê ya li Perûyê tê ku li Misrê hatibû dîtin. Ji mala Xwedê hat. Ew kurê Qralê Misrê Khufu bû ku qralê jêr û jor bû.

Hiyeroglîfa Gosford Glyphs weke delîlekî bihêz yê li ser rêwitiya Antîk Misriyan bo parzemînên din, tê dîtin. Ev hiyeroglîf di salên 1900an de hatiye dîtin û li ser kevirekî mezin ji setên sembolan pêk tê û lêkolînên li ser vê hiyeroglîfê zêdetirî sed salen e berdewam dikin.



Ellez Kerim:

# Penîrê Qersê gelek bi tam e

RONYA ROJ

Li bajarên Kurdan gelek cure çandinî û bazirganî tên kirin. Em her hefte çend ji van karan tînin ber xwînerên xwe. Yek ji van cûreyan jî çêkirina penîran e. Cî û deverên ku ajaldarî tê kirin, penîr û cureyên penîr jî wek berhemên ajaldarî têne çêkirin. Li bajarê Qersê wek gelek bajarên Serhedê ajaldarî zêdetir tê kirin û Qers penîrê xwe ve tê zanîn û penîrê spî, qaşar û gravyer cureyên penîrê vî bajarî ne. Ellez Kerim ji Qerse ye û bi salan e di nav karê çêkirina penîr de ye. Ellez Kerim di derbarê penîrê Qersê de ji Heftenameya Basê re axivî.



**Banedar penîr çêdikin**

Ellez Kerimê ku li Qersê bi salan e di nav karê çêkirina penîr de dixebite destnîşan dike û dibejê bi taybet li hin deverên Qersê penîr tê çêkirin û deverên wek Dikmen, Lavigars û navçeya Göleyê ji sedî nod penîr tê çêkirin. Kerim diyar dike ku çêkirina penîr re banedar eleqadar in û hema ji sedî penciyê xelkê Qersê banedar in. Kerim tîne zimên ku banedar, gund bi gund û zozan bi zozan digerin û şîr berhev dikin. Aboneyên banedaran hene û banedar salek berê heqê şîr didin gundiyan û wiha pê de diçe, "Ez dikarim mînakeke wiha bidim; 20 dewarên yekî hebin û di rojêkê de 100 kîlo şîr ji wan dewaran çêbibe. Ji 100 kîloyê hesabekî çêdikin û banedar heqê şîr salek berê didin. Gundî jî salekê şîr didin banedaran."

**Penîrê spî, qaşar û gravyer tên çêkirin**

Kerim dibêjê li Qersê sê cure penîr hene. Penîrê spî, qaşar û gravyer bi şîrê çêlekan tê çêkirin û wiha behsa çêkirina penîr dike, "Dixwazim pêşî qala çêkirina penîrê qaşar bikim. Şîr ji baneyan yanî febrîqayên ku li gundan hatine avakirin tê. Piştre, vî şîrî dixin satilên krom û ev şîr di navbera 80-100 pîleyî de tê kelandin. Ev şîr dibe penîrê spî ya kerî bi kerî. Piştî ku şîr hat vê astê, paşê penîr hûr dikin û dixin satileke din. Saeteke diyarkirî tune ye, careka din penîr tê kelandin, piştî vê yekê penîrê spî dibe penîrê qaşar û penîr çend seatan disekine. Paşê qalibên penîrên qaşar dixin quşxaneyên gilover. Piştre ev penîr bi qasî 25 rojan ji mehekê di odeyên tarî de tên sekinandin. Ev ode hênik û tarî ne. Piştê qonaxê penîran dibin depoyên sar û di van depoyan de penîr ji bo wexteke dirêj tê sekinandin. Çimkî penîrê qaşar çiqas bisekine ewqas bi tam û xweş dibe. Ev penîrên ku qalikê wan kifikî ne penîrên kevn in û zehf xweş in. Qaşarên nû ne ewqas rind û bi tam in. Ji 7-8 kîlo şîr, kîloyek penîrê qaşar tê bi dest xistin."

> Li Qersê banedar ji zozan û gundan şîr berhev dikin û ji vî şîrî penîrê spî, qaşar û gravyer çêdikin. Ellez Kerimê ku vî karî dike dibêje, "Penîrê Qersê bi qalîte û bi tam e. Ji ber ku ajal li gund û zozanan gihayê organîk dixwin û şîrê wan jî gelek xweş û rind e."

Kerim wiha behsa çêkirina penîrên spî û gravyer dike, "Ji bo penîrên spî jî şîr ji baneyan tê. Şîr dixin satilên krom heta ku şîr baş bikele li ser agir e. Piştî ku şîr keliya, dixin satileke din û şîr disekine, hevûdu digire. Paşê jî şîrê ku bûye penîrê spî, kerî dikin. Penîrê spî zêde nayê kelandin, ji ber vê jî ji 3-4 kîlo şîr, kîloyek penîrê spî tê bi dest xistin. Wekî din penîrê gravyer jî heye. Penîrê gravyer her çiqas di taştê de bê xwarin jî piranî di kêleka şerab û vexwarinên din de wek meze tê xwarin. Nêzî 18-20 kîlo şîr, kîloyek penîrê gravyer çêdibe. Ev penîrekî cuda ye."

**Bihayê penîrê kevn ji yê nû zêdetir e**

Kerim dibêje bihayê penîrê kevn ji yê nû zêdetir e ji ber ku penîrê qaşar çiqas bisekine ewqas xweş dibe û axaftina xwe wiha didomîne: "Ji loma ji aliyê qalîte ve cudahiyek heye ev jî li ser bihayê penîran tesîrê çê dike. Niha li Qersê bihayê penîrê qaşar ê zêdetir sekiniye û kevn (yanî penîrê ji salekê û zedetir sekiniye) 25 lîre ye. Bihayê penîr qaşar yê nû jî (3-4 mehî sekiniye) 20-22 lîre ye. Bihayê penîrê spî 15 lîre û bihayê penîrê gravyer 50 lîre ye."



## Penîr ji bajarên din re jî tên firotin

Kerim di dirêjiya axaftina xwe de li ser penîrê Qersê dibêje ji sedî 40-50î penîrê qaşar û gravyer ji bajarên din re tên firotin û gotinên xwe wiha bidawî dike: "Çimkî penîrê Qersê gelek bi tam e. Giha û kulîlkên ku ajal dixwin organîk in, yanî xwezayî ne. Ajal derdikevin serê çiya, diçin zozanan. Banedar havînê hemû şîr ji gund û zozanan berhev dikin ber bi havînê re dest bi çêkirina penîr dikin. Penîrê Qersê, bi taybet jî yê qaşar gelek bi tendurist e. Yanî herkes dikare bi dilekî rehet penîrê Qersê bixwe. Niha herî zêde penîrê qaşar ên kevn tê firotin." Kerim dibêje banedar tevî xwedîkirina ajalan banedariyê jî dikin. Dikarin bi tenê ji vî karî debara xwe bikin. Çimkî karê van bi tenê banedarî ye û ev kar ji malbatê tê.

# Piştî referandûmê jî dê sînorên Tirkiyeyê ji Herêma Kurdistanê re vekirîbin

KARZAN GILÎ

Herêma Kurdistanê ji 2013an vir ve ku Bexdayê bûdceya wê biriye, hewildanên avakirina aboriyeke xweser dide. Da ku bi vî awayî hewcedarî Bexdayê nebe û bikaribe pere û mûçeyên memûrên xwe bide. Lê belê piştî diyarkirina pêkanîna referandûmê di 25ê Îlonê de pirseke nû û cidî derket holê. Eger Kurdistan serxwebûna xwe îlan bike gelo dê qrîzeke darayî rû bide?

Li gor pisborên aboriyê referandûm nabe sedema têkçûna têkiliyên Tirkiye û Herêma Kurdistanê. Ji ber ku kargehên li Herêma Kurdistanê ne ji bo sektora neft û gazê bi milyonan dolaran pere xerc kirine. Her wiha salane 10 milyar dolar dahatûya têkiliyên aborî yên van welatan hene.

Televizyona CNN Tirkê, bal kişand ser girîngiya Herêma Kurdistanê ji bo aboriya Tirkiyeyê. Ji ber ku Herêma Kurdistanê di rêjeya têkiliyên aborî yên Tirkiyeyê de sêyemîn e. Bi sedan karker ji vê hatinûçûna malzemeyan ji bo Kurdistanê nan dixwin. CNNê qala têkiliyên aborî ku her diçe baştir dibe jî kir.

Di sala 2002an de bi serketina AKPê di hilbijartinên giştî yên Tirkiyeyê de di warê aboriyê de jî têkiliyên baş di navbera Tirkiye û Herêma Kurdistanê pêk htin. Bi taybetî jî rêkeftina 50 salî hat îmzekirin û bi rêya vê rêkeftinê jî Herêma Kurdistanê nefta xwe bi rêya Tirkiyeyê şande bazara navnetewî. Her wiha rêkeftineke 25 salî jî hat îmzekirin. Bi vê rêkeftinê dê Hikûmeta Herêma Kurdistanê gaza sirûştî bi ser Tirkiyeyê de bişîne bazara navdewletî. Ev proje jî dê di sala 2018an de bidawî were. Piştî vê projeyê gaza sirûştî dê ji bo aboriya Herêma Kurdistanê bibe kaniyeke baş.

Li gor pisporê aboriyê yê Tirkiyeyê Tuğrul Erkıl rêkeftinên di navbera Herêma Kurditanê û Tirkiyeyê de girêbestên mezin û girîng in. Ji ber vê yekê jî zehmet e Tirkiye bo sedema pêkanîna referandûmê van rêkeftinan têk bibe. Ji ber ku Tirkiye cihê yekem e ku wê zirarê ji vê yekê bibîne ye. Kargehên di sektora neft û enerjiyê de xebatan dikin dê hemû avedankirinên wan beredayî herin û bi milyon dolaran zirarê wan derkeve holê. Tuğrul Erkıl axaftina wiha didomîne: " Ji sedî 37 rêjeya bazirganiya Tirkiyeyê ligel Herêma Kurdistanê ye. Ev rêje ne hindik e. Eger ev têkilî têk biçin Tirkiye dê zirareke mezin ji vê têkbirinê bibîne û ji xwe Tirkiye jî vê rîskê nagre."



**Salane nêzî 10 milyar dolar bazirganî**

Li gor daneyên Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî bazirganiya di navbera Tirkiye û Herêma Kurdistanê de salane 12 milyar dolare. Lê belê ji ber qrîza darayî di sala 2016an de ev rêje daketiye 8 milyar dolarî. Lê belê dîsa jî ev reqemeke pir bilind e.

Eger piştî pêkanîna referandûmê Hikûmeta Herêma Kurdistanê serxwebûna xwe rabigihîne Tirkiye sînorên xwe yên di navbera Herêma Kurdistanê de ne nagire û têkiliyên xwe jî xirab nake. Ji ber ku niha aboriya Tirkiyeyê qet ne başe.

Almanyaya ku têkiliyên ticarî li gel Tirkiyeyê herî baş in jî di van deman de li parlementoyê ji bo têk birina têkiliyên xwe yên li gel Tirkiyeyê xira bike yasa derdixîne. Holanda jî têkiliyên xwe yên aborî kêm kiribû. Her wiha geştiyarên Ewropa hatina Tirkiyeyê boykot kirin. Ev yek jî bû sedema Tirkiye milyar dolaran winda bike û bi hezaran karker li restoran û otelan bê kar bimîne. Tirkiye dixwaze ji vê qrîze bifilite. Di her demê de naxwaza qrîzên nû çê bibin.

> "Ji sedî 37 rêjeya bazirganiya Tirkiyeyê ligel Herêma Kurdistanê ye. Ev rêje ne hindik e. Eger ev têkilî têk biçin Tirkiye dê zirareke mezin ji vê yeke bibîne û ji xwe Tirkiye jî vê rîskê nagire"

**Li Kurdistanê 1300 kargehên Tirkiyeyê hene**

Li gor hin envanteran 1300 kargehên Tirkiyeyê hene ku di sektorên cuda de xebatan dikin li Herêma Kurdistanê. Eger Tirkiye têkiliyên xwe li gel Herêma Kurdistanê xira bike dê bi hezaran Tirk dê bê kar bimînin û kargehên Tirk jî bi milyonan zirar bikin. Ew ê jî dê bê kar bimînin. Ev yek jî dê ji Hikûmeta Tirkiyeyê re bibe barekî giran. Ji ber van sedeman jî aborînasên Tirkiyeyî dibêjin ku zehmete Tirkiye têkiliyên xwe yên aborî li gel Herêma Kurdistanê xira bike.



# Ciwanê ji Çomanê seyareya xwe dide xizmeta gel



AZAD MEHMÛD

Huner Ehmedê ku li navçeya Çomana Hewlêrê dijî radigihîne ku kesên seyareya (otomobil) wan tune be û bixwazin bigerin an jî yên ku seyareyên wan tune be û nexweşên wan hebe û bixwazin biçin bijîşkê, wê seyareya xwe bêheq bide xizmeta wan kesan.

Huner Ehmed ji Heftenameya Basê re axivî: "Çend sal berê seyareya min jî ya malbata min jî tune bû. Di vê serdemê de seyareya mirov tune be zehmet e, ez vê derdî baş dizanim. Ev fikr ji vir tê, yên seyareyên wan tune ne û rewşa wan jî nebaş e fikirîm. Ji ber vê min biryar girt da ku hewcedariya her kê bi seyareê hebe, li Çomanê cihê min diyar e û ez ê xizmetê bidim wan. Eger bixwazin dikarin bi seyareya min ve derkevine derve û bigerin, biçin çiyan bo seyranê, ger nexweşên wan hebe dikarin bi seyareyê ve bibin bajarekî din. Mirov dikare bi rehetî xizmetê bide û rihê alîkariyê pêşde bibe, mirov dikare bi hêsanî qenciyê bike û dibe ku ev mezin û girîng bibe."

**"Ez di xizmeta kesên hewcedar de me"**

Huner Ehmedê ku li Midûriyeta Geşt û Gûzara Çomanê karmend e û rojên Sêşem, Çarşem û Pêncşemê diçe kar, wiha diaxive:" Ji bilî van rojan ez di xizmeta kesên ku hewcedariya wan bi seyareyê heye de me. Ez gelek fikirim ku gelo ez çawa dikarim xizmetê bikim, ji bilî xizmeta bi seyareya xwe tu tişt nehat hişê min.Bi taybet jî di vê wexta gerê de, ji bo ku kesên desteng bigerin, min kirina vê karê baş dît û ez ê berdewam bikim."



## "Piştigirî hebe wê tesîra qeyrana aborî kêm be"

Huner Ehmed, hêvî dike ku kesên din jî vê tiştê ji xwe re bikin derd. Li Kurdistanê qeyrana aborî niha astengiyan çêdike. Ehmed dibêje ku eger di nav gel de, piştigirî hebe wê tesîra qeyrana aborî hindik be û rewşa gel jî bi saya piştgiriyê baş bibe.

Bi riya Basê jî dixwaze bibêje ku herkes bila ji derdora xwe re bibe alikar û wiha pê de diçe:" Kesekî xwedî supermarket dikare bi hêsanî her roj şûşeyekî şîr bide malbateke pitika wê heye, dergûşa wê heye. Qencîkirin tiştek hêsan e. Ji bo ku mirov qenciyê bike ne pêwîst e xwedan şîrket, market be yan jî bi deste û destê dolarên mirov hebe. Çi ji destê mirov bê mirov dikare bike. Ligel kesekî ku min ji wî re xizmetê kiriye re wêne nakişînim û nabêjim min vê ya kiriye. Di vê karê de armanca min bi tenê kirina qencî ye û ez vê wek peywirekî mirovî dibînim. Hêvî dikim ku em hemû bo hev bijîn.

MIRAZ BABIJ

## Xoserîya Kurdîstanî

Seke şima pêro zanê 25ê Êlule de Kurdîstanê Başûrî de seba xoserîya Kurdîstanî yew referandum do bibo. Mi zî waşt ke ez no hewte xoserî ser o binusa.

Cenet mekan Ehmedê Xanî muhîmîya dewletêka xosere na şîîra xo de çi weş îfade kerdo.

Ez şaş menda hîkmetê homayî de
Kurdî na dewleta cîhanî de
Seba çi wina mendê mehrûm
Seba çi pêro bîyê mehkûm
Eke ma dir bibîyayên îtîfaqên
Eke ma yewbînan rê bikerdên îteat
Rom û ereb û eceman bi temamî
Ma rê do bikerdên xulamî
O wext ma temam kerdên dîn û dewlete
Ma o wext tehsîl kerdên îlm û hîkmet

Herçiqas tayê embazê "qehremanî" seba demokratîkbîyayişê tayê dewletan xo feda bikerê û xoserîya Kurdîstanî ser o çîyêk nêvajê zî (heta wazenê xoserî rê bibê engel) ewro ekserîyetê kurdan sey na şîîre fikirênê.

Seye heme miletan, mîyanê kurdan de zî gelek fraksîyon û îdeolojî estê. Herçiqas nê fraksîyonî tewir tewir bê zî, goreyê ekserîyetî ma eşkenê di hetan de kategorîze bikerê.

1-Îslam (Muslumanî)
2- Sosyalîzm (û îdeolojîyê çepgirî)

Goreyê Îslamî

Ez wazena nê nuşteyî de goreyê nê di fraksîyonan meseleyê xoserî ser o tayê qalî bikera. Eke ma goreyê Îslamî bifikirîyê dewletê ke ewro bi destanê muslumanan awan bîyê, ci ra yew daxîl îslamî nîyo. Çunke îslam de mefhûm o ke vejîyeno vernî qewm nîyo. Mavajîme ke dewletê ke muslumanan awan kerdê (xususen yê ke tede kurdî estê) dewletê îslamî bîyayên ganî hemwelatîyan rê senî muamele bikerdên. (No mabên de mefhûmê "Dewleta Îslamî" fina ewil serra 1924î de hetê Reşîd Rizayî ra vajêna. Hz. Pêxemberî (s.a.s) ra heta 1924 kesî behsê dewleta îslamî nêkerdo)

Xelqkerdişê erd û asmênî, cîyabîyayişê reng û ziwananê şima heme ayetê Homayî yê. bêguman ney de seba zanayan îbretî estê. (Sureya Rûm, ayeta 22yî)

Seke cor ra zî aseno goreyê îslamî heme reng û ziwanî ayetê Homayî yê û goreyê îtîqadê îslamî kes o ke yew ayeta Homayî înkar bikero seke dînî pêroyî înkar bikero. Yanê eke nê dewletî seba ziwanê yew milet engelî ronê no hal xeyrî îslamî yo.

Heto bîn ra Îran, Tîrkîya, Irak ûsn. nameyî çend îslamî yê Kurdîstan zî hend namêyêko îslamî yo. Eke yew merdim nê nameyan hemine qebul bikero tena nameyê Kurdîstanî rê tehamul nêkero goreyê îtîqadê îslamî nameyê ê kesî munafiq o.

Nîtekîm Hz. Pêxember (s.a.s) yew hedîsa xo de wina vano : "Şima ra yew kes o ke seba xo çîyêk wazeno, heta ke ey çî seba birayanê xo yê muslumanan zî nêwazo îmanê ey heqîqî nîyo."

Dewletanê ke tede kurdî ciwênê heqê kurdan temamî bişinasnayên û nameyê welatê înan zî nameyê yew qewmî nêbîyayên o wext ma do bivatên ke cîyabîyayişê kurdan caîz nîyo. Labelê eke ma goreyê nê ayet û hedîsan bifikirîyê û tabloyê ewroyî zî bigîrê verê xo, ma eşkenê vajê ke xoserîya Kurdîstanî hetê Îslamî ra caîz o.

Goreyê sosyalîzm û îdeolojîyanê çepgiran

Goreyê sosyalîzmî dewlete, tezadanê ke mabênê sinifan de vejîyayê awan bîya. Marks vano ke: "Eke mabênê sinifan de tezadî çin bîyayên îcabê dewlete zî nêmendên." Yanê her kes bi reng û taybetîyanê xo bieşko xo îfade bikero îcabê dewlete zî nêmaneno. Goreyê teorîyê sosyalîzmî ganî mîyanê yew dewlete de pêkewtişê qewmî nêbê. Semedo ke pêkewtişê qewmî nêbê ganî dewlete hemwelatîyan pêrunan sey pê qebulkero û hetê heqan ra mabênê hemwelatîyan de problemî çin bê.

Labelê ewro ma dewletanê ke tede kurdî ciwênê muşahede bikerê (ke tayê înan zî sosyalîstî yê) zulm û zor o ke kurdî ancenê resayo asmên. Yanê ma hetê sosyalîzmî ra zî biewnîyê ma vînenê ke nê dewletî goreyê sosyalîzmî zî hereket nêkenê. Tîya de çî yo ke vejîyeno verê ma, self determinasyon" o. Yanê heqê her qewmî est o ke qederê xo bixo tayîn bikero.

Seba çi Kurdîstano Xoser?

Tîya de merdim eşkeno bi hezaran sebebî rêzkero. Labelê nê sebeban rê ne kaxiz ne zî murekeb bes keno. Ez wazena nê beşî de embazê min o ezîz birêz Mutlu CANî ra îktîbas bikera.

•Seba ke reyna qetlîamê ke sey qetlîamanê Sînemaya Amûdê û Qamişloyî nêbê referandumê xoserîye rê YA!

•Seba ke kurdê rojhelatî nêrê qetilkerdiş, Qazî Muhemed, Qasimlo û Şerefkendîyê neweyî bi qehpetî nêkişîyê referandumê xoserîye rê YA!

•Seba ke Helebçeyê neweyî nêbê referandumê xoserîye rê YA!

•Seba Roboskî, seba Ugur Kaymazî, seba Ceylan Onkol, seba "hîris û hîrê derban" seba nêmerdişê ziwanê ma û seba bi hezaran sebeban… Xoserî rê YA!

Seke ma cor ra zî îfade kerd, ganî na game ra tepîya xarîxî û daxîlî tu sebeb ma rayîra xoserî ra durî nêfîno. Ganî her kurd nê wezîfeyê tarîxî û milî, goreyê şertanê xo bîyaro ca. Ma se serre pawit wa sena serrê ma nêtirawîyê.

Qala peyêne wa yê Serek Barzanî bo: "Kesê ke ma rê vanê referandumê xoserî taloq bikerê, wa baş bizanê ke; ma hende şehîdî tena û tena seba xoserîya Kurdîstanî dayê."

# Qiseykerdişêkê Tarîxî ra Çend Anektodî

Referandumê xoserîye do seba xatirê tu kesî qetîyen nêro taloq kerdene.

Ma dewletêka "kurdî" ronênanê, dewletêka "kurdîstanî" ronenê û na dewlete de îdareyo demokratîk do biba, tu cins do cinsêko bîn ser o, tu grûba etnîkî û dînî do yewna grûba etnîkî û dînî ser o teda nêkera, na dewlete heme cinî û camêrdî, heme grûbê etnîkî û dînî ke erdanê Kurdîstanî ser o ciwîyenê, dewleta perûne înan a hempar biba. Suryanîyî, armenîyî, xirîstîyanî û êzidîyî bira û hemparê ma yê.

Kesê ke ma ra vanê nê referandumî taloq bikerê wa naye baş bizanê ke ma hende şehîdî tena û tena seba xoserîye dayî û naye ra dima ma do ne seba otonomî ne federasyon ne zî seba yewna amancî destûr nêdê ke nenûgê tek yew ciwanê/a kurdî ra daxî gonî bera.

Tayê vanê ke seba referandumî zaf ecele yeno kerdene, tam tersê naye ez şexsen xorexne kena ke ma zaf erey bîle mendî, belkî ma bîy qurbanê nîyetê xoyê pakî belkî bîy qurbanê sebrê xo. Êdî sebrê nê miletî nêmend. Heme nîyetê ma yo pak ame suîstîmalkerdiş. Eke ma ewro xoserîye îlan nêkerê meşte do ma ra vajê Kerkûk ra, Mehmûr ra bivejîyê û belkî yewna roje zî bixebitîyê ke ma Hewlêr ra bîle bivejê.

Tayê hêzê mintiqa û mîyanneteweyî, Amerîka vanê çi? Vanê gelo helwesta înan senî biba? Wa û birayê mi tu kes yew dewlete û cuyêka azade pêşkêşê ma nêkeno, dîyarî nêkeno. Eke ma eğit ê ma naye ronenê, ma wayîrê ci benê. Muhîm nîyo kam dewlete se vana. Esas muhîm no yo ke miletê kurd çi vano, dayîkê şehîdan, keyeyê pêşmergeyan û pêşmergeyî bi xo çi vanê? Ma wina fikirîyenê.

Ez do esla reyna sifet û mewqîyêko sey "serek/wezîr" ûsn. nêxebitna. Ez do nê mewqîyan de nêba û naye nêwazena. Di rey mi rê ame teklîf kerdenê ke ez serekkomarê Îraqî biba. Mi red kerd. Çunke mi xo tu wext amade hîs nêkerd ke ez ê sondî biwana, ê metnî wendene zorê mi şîyêne. Xora na serekîye dest û payanê mi gîredana, mi ver engel teşkîl kena ke ez hîna baş xizmetê Kurdîstanî bika. Ez pêşmerge bîya, pêşmerge ya û do tim winî bimana. Bawer bikîn ke ez sey pêşmerge do nê miletî rê, na dewa rê hîna xizmetanê başan bika. Badê ke ma dewleta xo ronaye kam beno serek wa bibo, no yew qerar o ke şar bido. La ez do esla reyna namzet nêba.

**Mesûd BARZANÎ (Serekê Herêma Kurdîstanî)**



Program: Kombîyayîşê Serekê Kurdîstanî bi Kadroyanê Rêxistinanê Ciwanan û Cinîyan Reyde

Tarîx: 21.08.2017, saete: 11:00

Ca: Salona Konferansî ya Mamosta Seed Abdullahî, Hewlêr

# Koyê Mizurî




ABDURRAHMAN ÖNEN

Koyê Mizurî zaf namdar o. Hetê xo yê tebîî, cografî, tarîxî, şarî, kulturî ûsb. ra zaf muhîm o: Zaferî kirmancê Elewîyî der û dormeyê nê koyî de manenê. Der û dormeyê Koyê Munzurî de zaferî Kirmanckî qalî kenê...

Koyê Mizurî başûrê Awe Şaye (Ava Reş, Karasu) de berz beno. Egîn (Kemaliye) ra dest pêkeno. Xaweçûr (yenikonak) hetê rojawanê Koyê Mizurî de manena. Badê 100 kîlometreyan reseno Koyê Mircon ser o. Pulur (Ovacık), Çemê Mizurî û deşta Zeranîge başûrê Koyê Mizurî de manenê. Çimeyê Munzurî Koyê Mizurî ra dest pêkenê.

Koyê Munzurî mîyanê deşta Zeranîge, Awe Şaye û Derê Mircon de sey dêsêk berz beno. Derê Mircon mîyanê Koyê Mizurî û Koyê Mircon de dest pêkeno û reseno Çemê Munzurî.

Koyê Mizurî de zimistanî zaf vewre varena. Gola Şaye (Karagöl) Koyê Munzurî ser o manena. Kertê Gola Şaye (Derbenda Gola Reş, Karagöl Geçidi) uca ra vîyareno. Rayîrê Gamax û Pulur no kertê de yo.

Koyê Mizurî de 1518 tewir nebatî zergûn benê. Tayê nebat endemîk ê û 21 nebatî zî tena Koyê Mizurî de zergûn benê.

Nerdîgano (Kırk Merdiven), Koyê Mizurî ser o yo, nêzdîyê çimeyê Mizurî yo.

# Wextê Ma de Roşanî

HATÎP ERDOĞMUŞ*

Serre bi serre, emir çendaye bivêru, hîsî hendêna vêrîyê zemanî vêr kenu. No wext de îmkanî hendêna zêde yê, zê verî nîyo la hewna zî çew yew lezete ti ra nêvîneno. Çendêna rojê badî Homa bîyaru werî roşan o. Kam wext roşanî bibo nêzdî roşanê ke qijîyê ma de, domantîyê ma de ma bimbarek kerdêne yenê mi vîr. Qijîyê ma de zê no wext çî-mî zaf çin bî la hewna ço vano "werê ma bêru aye heli..." Zê vîzêrî yêno mi vîr, wexto ke roşan ameyêne, bîyênê nêzdî, yew keyfo ke, yew heyacano ke kewtene ma zere, ma keyfî ra hende bîyênê şen ke seke ma zê mirçikan firdayêne. Di-hîrê hewteyî ver ma teqvîm girewtêne û ma hesabê nobeta dawaran kerdêne. Dê roja roşanî de dore yena kam î? Dewa ma zaf pîl nêbîye, yew mezraya ke qije bî. Ma çar keye yê û rey-rey zî benê panc keyê û şonê dewe çîn bî ma dewijî xo mîyan de dora dawaran nabî ro. Ma yew-yew pelê tekvîmî qelewnêne, semedo ke roja roşanî de dore yena kamî û ma vatêne "eyr ena ma, siba aye kêye Datê Ezîz, bêyîr ena Kêye Datê Medîni, bîteri ena Datê Fayekê Kîyê Hecî Enesî..." û wina dewam kerdêne hetanî roja roşanî. Roja roşanî dore kamî rê raşt bîyamene o bîyêne bêkeyf, ruçikê ey xerepîyêne, roşan ey rê bîyêne sîya. Ê bînan zî semedo ke dore nêameya înan xo rê keyf kerdêne.

Gama ke roşanî rê di-hîrê rojî mendêne ma yew deyîre vatêne "siba nê ber roşan uga belek têşon u ..." û wina dewam kerdêne şîyêne... Semedê roşanî bayê ma zî ma rê cil û solî girewtêne. Dewe de timûtim solê lastikênî ma pay de bî. La semedê roşan zî ma rê solê esêm (spor ayakkabi) ameyêne hêrînayîş. Semedo ke ma rê solê esêmî amenê hêrînayîş o ma çend zî keyf kerdêne...

Rojê verê roşanî (roja erefe), dewe de her keye de yew teşqele, hazirîya roşanî virazîyayêne. Her keye de paste û çorekî muheqeq ameyêne pewtiş. La ê pastayî çend tehmin û weş bîy... Çew qayil kerdêne ke biwero. Ti ra keye zî sînîyê şîranî (baklawa) akerdêne. Semedê pewtişê aye zî teber de kolîyî eştêne pêser, adir eştêne binê kerdenê tarom û tepsî nayene ro tarom kerdêne ser, her cayê sînî temernêne, sînî zî binê ê taromî de peşayêne. Naye ra pey sînîyê şîranî keye de akerdênê û berdênê Dara Hênî, firinan de pewêne. Dara Hênî de zî roşanan de şîranîyan akerdiş yew edetêko meşhur o. Semedê ne gureyî cinîyê belukerdeyî estbîy. Roşanan de karî gurê nê cinîyan no bi. Tîre xo giretêne yew keye de ameyêne pêser û şîranî akerdêne. La akerdişê şîranî zî zaf zehmet o. Di-hîrê rojî verî roşan de firinan de tepsîyanê şîranîyan ra çew nêeşkenî vêjo. Warî tepsîyan kewtene dore, dê hela hetanî kam wext semedê pewtişî dore yena înan. Rey- rey dore ancax mîyanê şewe de, nêzdî serê sibayî de amêyene...

*Wezîfedarê banderîye, Unîversîteya Alparslanî ya Mûşî, Beşê Ziwan û Edebîyatê Kurdan, hatip-12@hotmail.com



# Zurekerê Ziwanşîrinî

SEZGÎN FIRAT

Raştê yewbînanbîyayîşê verênî de çekuyê ke ênê xebitnayene nîyetan dîyar kenê. Tayê kesî estê ke reya verêne ke merdimê reyde dest bi qiseykerdiş kenê çekuyanê xo bidiqet çînenê we. Tayê bînî estê ke ti vana qey embazîya hezar serran mîyan de esta, winî bi nêzdîyîya bêhewce merdîmî reyde qisey kenê. Çekuyê nezdîyîye seke hewa ra firrenê. Bi "bîrader" dest bi qiseykerdiş kenê peynîye de ti bena "zama". Ez nêzana şaranê bînan reyde no hal çitur o? Labelê sînoranê Tirkîya de nê çekuyê nêzdîyîye qet nêbo ke çarî ra hîrêyê qiseykerdîşan de yenê şuxulnayîş.

A roje ez û xanima mi, ma şîbîme ke xo rê kinc-mincan bihêrînîme. Kênaya mi ke maya xo ra bîye aye ra nat ne mi ne kî xanima mi xo rê citeyê puçan herînaybi. Paykerdîşê puçanê dirîyayeyan ver endî ez xo ra nêvînena ke şira meymantî. Ma şîy. Tayê fetelîyayîşî ra dima ma game eşte yew dikano newe. Etîketo ke dusnîyaybi kincan ra, ey ra dîyar bî ke kincê ke yenê rotiş zaf vay nîye. Ma game eşte zere.

Zere de merdimo qasê çewres serreyî raştê ma bî. Xora yew xuyê mi esto ke ez bazirganê ke zaf qalî kenê ra hes nêkena. Ê ke qisey kenê ti vana mi ra gonî rişîyena. Seke çim gina ma ro, cayê xo ra vaz da ame ma het. Mi milmilna, xanima xo ra va ke, 'ti vinde no nêverdano ke ma qaytê kelmelan bikerîme. Vazdayîşê ey ra merdim bese kerdêne vajo seba rotene ney la seba qalî kerdene yêno.

Mi goşê xo kerdî vît, pawit ke hela çi vano. Mi eşnawit ke yew ha mi ra vano:

-Zama! Ti bi xeyr ameyî.

Semedo ke goşê min o rast baş nêeşnaweno mi xo tayê tada. Mi dî ancîya va:

-Şima ameyê bi cayo raşt zama. Her çî bê pere yo.

Ez û zamayê ney!... Hela vinde no nika zuranê senînan pilosneno "zamayî" ra. Winî xo ra bawerbîyaye qalî keno û herhal fikirîyeno ke goşdarî ganî awa hezar dereyan bîyare pêser ke zuran mîyanê qiseykerdîşê ey ra weçînê.

Ez ke dest erzena kamcî kince uca de peyda beno. Nêverdano ke ez asan qaytê kincan (biewnîye) bikerî. Senî tewir layan ra virazîyayê, welatanê Ewropa de kamcî kesê dewlemendî nê şapikan pay kenê, ûsn... Zuran erzeno zuran ser. Her cumleya xo rê bi "birayê mi", "kekê mi", "zama" û sey çekuyanê winasîyan dest pêkena. Peynîye de goşdar ganê xo ra rincan beno. Vano ha vano. Zuranê xo bi nê çekuyan xemilneno ke kes hayîdarê înan nêbo. Heyfê nê çekuyanê rindekan...

Axirî ma hetanî ke xo destê ey ra xelisna ra saete bîbî serre.

Wa keda kesî tewş de nêşira. Keda nê dikandarî kî tewş de nêşira. Debare zor a. Her kes eserê şertanê xo yo. Dîyar o ke no merdim kî eserê şertanê xo yo. Labelê derdê mi sewbîna yo. Sinoranê na dewlete de nê tewir insanê tay ê? Yan zi komel binê bandura nê zurekeranê ziwanşîrînan û bêrêzdaran de menda? Heqiqeten tayê îstîsnayê xo bibê kî her ca pirrê nê tewir însanan o. Hela bêrê mîyanê bazaran ra ravîyarê. Şima vînenê ke merdimêk hetê ra, oyo bîn hetêk ra kewto binê çenganê şima kaş keno ha kaş keno. Wazeno şima bero zereyê dikanê xo ke bi hilekarî çîyan bido hêrînayîş. Fikrê şima înan het de pere nêkeno. Şima wazenê ya nêwazenê qet muhim nîyo. Xora şima çinay rê benê ke derheqê çîyan de qerar bidê. Ê her çî şima ra rindêr zanenê.

Hela televîzyonanê xo akerê. Şima o wext fehm kenê ez behsê çinay kena. Her kanal pirrê pisporanê heme çîyan o. Qet dore nêdanî kesî. Tewir bi tewir termanê huqûqîyan, demokratîkan ûsn. pilosnenê rikdarîya xo ra ke merdim eşkeno boya fekê înan hemverê ekranan de boye bikero.

Xulasa merdim dest erzeno kamcî het gineno nê tewir merdiman ro. De bêrê bipawî ke nê siyasetmedaranê sey xo nêweçînê...



Yew Mamostayê Kurdçitîye:

# Xelîl Xeyalî -II-


PÊŞAR BEXTEWER

**Rojname û Kovarê ke tede Nuşteyê Xelîl Xeyalîyî Weşanîyayê û Naznameyê Ey**

Xelîl Xeyalîyî tayê rojname û kovaran de nuşteyê kurdkî û tirkî nuştê. Nê kovar û rojnameyî nê yê: *Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Yekbûn, Jîn. Kovara Jîn* a ke mabênê serranê 1918 û 1919 de vejîya de çend nuşteyê tirkî ke bi naznameyê (mehlasê) "Kurdîyê Bitlîsî" nusîyayê ca gênê. Goreyê îzehetê M. Emîn Bozarslanî, "Kurdîyê Bitlîsî" naznameyê Xelîl Xeyalî yo. La nê serranê peyênan de bi hawayo qetî ame zanayîş ke no melumat rast nîyo. Bi nameyê Yüzbaşı Emînî yew kurdo ke o zî sey Xeyalî Bidlîs ra yo, no nazname xebitnayo.

Kovara *Rojî Kurd* de binê çend nuşteyanê kurdkî de naznameyê "Modanî. X." ca gêno. No nazname zî yê Xelîl Xeyalî yo. "Modanî X." yo ke binê tayê nuşteyanê kurdkî yê Rojî Kurd de vîrayareno ancîya naznameyê Xeyalî yo. Reyna eynî kovare de tayê nuşteyê kurdkî ke binê înan de "M. X." (bi herfanê tirkî M. H) û tayê nuşteyê tirkî ke binê înan de X. (kilmnuşteyê Halilî yo) vîyareno estê. Nê her di nazname zî yê Xelîl Xeyalî yê.

Bê nînan Sedat Anterî, Musa Anterê rehmetî ra neqil kerdo ke Xelîl Xeyalî tayê nuşteyan de sey nazname "Bavê Neco" zî xebitnayo. Ma vînenê ke kovara *Hetawî Kurd* ke mabêne 1913 û 1914î de vejîya de çend nuşteyê kurdkî û tirkî ke hetê Xelîl Xeyalî ra nusîyayê ca gênê. Xeyalî nê nuşteyan de sey nazname "Bavê Naco" (Nameyê kênaya ey Nacîye ya) û "M. X." xebitnayê.



**Derheqê Xelîl Xeyalîyî de Xatiraya Musa Anterî**

No mîyan de ez nêeşkena bêke qalê Xelîl Xeyalî Modanî bika vatişanê xo bidomna. Xelîl Xeyalî Beg wexto ke mi o di serhesabdarîya Fakulteya Daristanî [muhendisîya daristani-PB] ya ewroyine ra teqawut bîbî. Extîyarêko pîr û pak bî. Xelîl Xeyalîyo ke zaf zanaye, kulturin hendaye ney zî nuştiş de wayîrê hunerî bî, çimanê ey ra roşnaya eşqê welatî beriqîyayêne. Ey wina vatêne: "Heme muradê mi no yo ke hema ke ez weş a miletê kurd ke binê linganê nê miletanê zaliman de mendo û layiqê na rezilî û kepazeyîye nîyo, xelisîyayîşê ey bivîna" O bi xo bi kênaya xo Nazmîye reyde ronîştêne. Nazmîye Xanime zî Kolejê Saînt Benoîtî yê Îstanbulî ra mezun bîyê. Badê wefatê pîyê aye zî ma sey keye ci ra têkilîya xo nêbirnaye. Nazmîye xanime wezîrîya karanê teberî ra teqawut bîye. Wexto ke mi îtînaya ke aye musnayêne pîyê xo ci ra pers kerd "Musa, ez senî miqateyê nê merdimî ke sey abîde yo neba? Vatêne: "hem pîyê min o hem zî kurdpewerêko binamûs o." Xelîl Xeyalî Begî, nêzdîyê merdişê xo de notê xebatanê xo yê ke ey het de bîy day mi. Mîyanê nînan de wesîqayê bêhempa estbîy. Yew dîwan û yew destnuşteyê Hacî Qadirê Koyî, Gramerê kurdkî yê Zîya Gokalpî ke ey bi destê xo nuştbî û cigêrayîşê ke ey ziwanê kurdkî ser o kerdbîy estbîy. Labelê heyf ke wexto ke ez 1972 de ameya tewqîfkerdiş dewlete kitabxaneyê mi reyde nê zî ardî Mehkemaya Îdareyê Orfî ya Dîyarbekirî. Derheqê pêrune de qerarê dest ser o ronayene dîya. Bado ke ez ameya efûkerdiş, mi seba kitabanê xo muracat kerd mi ra ame vatiş ke pêro ameyê veşaneyene.

**Herinda peynî de**

Qaso ke cayê ma qîm kerd ma nê nuşteyê xo de derheqê Xelîl Xeyalî de nuşt. Xeyalî, çi bi xebatanê xo çi bi helwesta xoya miletperwer tarîxê kurdan de sey roşnvîrêko nimûnewî cayê xo girewto. Demo modern de kesê tewr verên ê ke folklor û ziwanê kurdkî ser o xebitîyayê, yewê înan o. Xeyalîyî, hema ê serran de seba averşîyayîşê ziwanê kurdkî û arêdîyayîşê folklorê kurdkî ser o sereyê xo dejnayo; fikir û pêşnîyazê xo nuştê. No zî nîşanê ma dano ke roşnvîrêkê miletê bindestî ra çi yeno pawitêne, Xeyalîyî o temamen ardo ca. Yanî tena rêxistinanê kurdperweran de ca nêgirewto, berpirsîyarîya xo ya fikrî, edebî û kulturî zî arda ca.

Ma ganî qiymetê nê tewir miletperweran bizanê û payîdarbîyayîşê xatiraya înan xo rê sey amancêk bivînê. Kesê ke semedê azadî û averşîyayîşê milî xebitîyayê, çimê mi de ê nêmerdê; çunke nemerg ê. Eke ma înan yad nêkerê, neslanê neweyan rê nêmusnê, ma hem xezîneya û xafizaya xo ya milî ra vîndî kenê hem zî benê sedemê mergê înan yê rastkênî. Mi waşt ke wa qiymeto sey Xelîl Xeyalî (ke ma verê zî vatbî o bi xo yew kirmanc o; helbet çirê bi kirmanckî nênuşto? ma aye zî nêzanê. Kam zano belkî nuşto la nêresayo ma dest...) ra bi kirmanckî zî bero qalkerdiş û wendoxê ma tayê ey nas bikê. Eke na çarçewa de qasê dilope faydeyê nê nuşteyî bibo ez xo bextewer hîs kena.

> Xelîl Xeyalîyo ke zaf zanaye, kulturin hendaye ney zî nuştiş de wayîrê hunerî bî, çimanê ey ra roşnaya eşqê welatî beriqîyayêne. Ey wina vatêne: "Heme muradê mi no yo ke hema ke ez weş a miletê kurd ke binê linganê nê miletanê zaliman de mendo û layiqê na rezilî û kepazeyîye nîyo, xelisîyayîşê ey bivîna"

**Not:** Mi no nuşteyî de tewr zaf kitabê mamosta Malmîsanijî "Said-i Nursi ve Kürt Sorunu" (Jîna Nû Yay., Uppsala, 1991) ra îstîfade kerd. Baş ke sey mamosta Malmîsanijî çend roşnvîrê ma yê ke terz û xebatanê înan ra dîyar o rêça Xelîl Xeyalî ra şîyê û şonê estê.

### Yew Anektod

*Xelîl Xeyalî, yew nuşteyê xo yê kurmanckî ke Rojî Kurd de weşanîyayo de (15 temmuze 1913) de pers keno ke kurdan bi ziwanê xo çend kitabî nuştê, çend mektebî akerdê, çend domanî daye wendene, çend şêxê kurdan semedê yewîya kurdan xebitîyayê, pîlê kurdan mîyanê sewbîna miletan de seba miletê kurdî çi amede kerdo? O nê nuşteyê xo de çîyê ke kurdê muhtacê înan ê, wina rêza keno:*

*1- Seba temînbîyayîşê rew/leze wendene yew herfe*
*2- Alfabeya ke bi terzêko newe amade bîya*
*3- Seba ke temamê kurdkî bera musayene (?) yew ferheng*
*4- Yew îlmîhal*
*5- Tarîxê bapîrê kurdan û ....yê înan*
*6- Welatê kurdan, edet û xuyê înan, miqdar û nameyê eşîrê înan*
*7- Kitabê matematîkî*
*8- Semedê ziwanê kurdî yew gramer*
*9- Bîyografîyê pîlanê kurdan*
*10- Edebîyatê kurdan û nameyê şaîranê înan.*

*Nuşteyê ey wina dewam keno:*

*"Seba ke nê xebatî bêrê kerdene çiqas ke kitabê kurdkî estê ganî şima înan bierşawê. Hunermendanê vengî ra "lawjokan", "çîrokan" û "qewlan" pers bikê, binusê û bierşawê. Eke her kes qasê qewetê xo ra xizmet bikero merdim rew reseno hedefê xo. Wa û birayênê, şima ra rica kena ke xizmetê kurdîtî û muslumanîye de teqsîr mekerîn. Muslumanîye şima ra xizmet pawena. Çîyê ke şima erşawenê bi nameyê Cemîyetê Hêvî bierşawê"*

# Averşîyayîşê Kirmanckî Ser o Ewnîyayîşêk

SELMA DOGU

Cuya yew miletî ancax bi ziwanî yeno ware. Estena yew miletî bi estena ziwanê ê miletî bena. Qederê ziwanê kurdan qederêko xanîn o. Heta nê serranê peyênan qedexeyê ziwanî, polîtîkaya înkarî, parçebîyayîşê miletî, ziwanê kurdan zereyê keyeyan de hepisî verda. Qedexekerdişî zerrîya dişmenan rehet nêkerdo ke na rey dişmenî dest bi îmha kerdene kerdo. Dişmenî nêverda ke kurdî sereyê xo berz bikê. Ziwanî firsend nêdîyo ke aver şêro. Mîyanê nê bêtalihîyan de kurdan herra xo tepişte û ziwanê xo bêwayîr nêverdayo.

Kurdkî nameyê panc lehçeyanê cîya-cîyayan o. Nê lehçeyî; kirmanckî, kurmanckî, sorankî, hewramkî (gorankî) û lurrkî yo. Lehçeya kurmanckî hem cografyaya hîra de hem zî welatanê bînan de yena qisey kerdene. No hal seba averşîyayîşê lehçeya kurmanckî yew avantaj o. La kurdê kirmancî tena mîyanê sînoranê îdarîyan yê Tirkîya de ciwîyênê. No zî hetê averşîyayîşê kirmanckî ra yew kêmanî ya û naye yo ke cayanê bînan de bi na lehçe tu eserêk nênusîyayo.



Averşîyayîşê yew lehçe verê cû giredayeyê tercîhanê sîyasîyan o. Eke miletêk hetê sîyasî ra xo temam biko şêno ziwanêkê merdeyî zî ganî biko. Eke ziwan, ziwanê perwerdeyî bibo, eke resmî bibo û her wareyê cuye de ca bigîro, ziwan vîndibîyayîşî ra xelisîyeno. Lehçeyêk çend bêro qisey kerdêne zî heta ke resmî nêbo nêşena gamanê pîlan bierzo. Naye ra fehm beno ke yew ziwan binê dara dewletê de yeno wucûd û xo temam keno.

Modernîzebîyayîş û averşîyayîşê ziwanêk de edebîyat zî wayîrê rolê tewr serekeyî yo. Edebîyatê ziwanêk çiqas xurt bo, çiqas averşîyaye bo qîymetê ê ziwanî zî hende zêde yo. Sey nimûneyî, prestîjê fariskî bingeyê xo edebîyat ra gêno. Mesela, Şahnameyê Fîrdewsî (940-1020) ke 60 hezar beytan ra yeno meydan, ancî eserê Sadîyê Şîrazî (1193-1292) û yê Hafizê Şîrazî (seserra 14. ) kerd ke fariskî binê tesîrê erebkî ra vejîyo û newe ra bibo wayîrê prestîjî.

Edebîyatê kirmanckî de kitabo tewr verên Mewlûdê Kirdî yê Ehmedê Xasî (1867-1951) yo. No kitabê yewîn ê kurdan o ke Kurdistan de çapxaneyêkê modernî de ginayo çape ro. Kirmanckî de tekstê dîyin Bîyîşa Pêxamberî zî hetê Osman Efendîyê Babijî (1852-1929) ra nusîyayo. Seba ke ziwanê kurdkî qedexe bîyo her di kitabanê verênan ra pey hetanî serranê 1970an xebatêka nuştekî nêbîya. Polîtîkaya qedexekerdiş û înkarkerdişî nêvardayo ke nêzdîyê heştay serran kes ziwan ser o xebatêk bikero.

*1-Kayasandık, Ahmet. Efkar Meclisi, 3. Basım. Akçağ Yayınları, Ankara, 2014, r. 28.*

*2-Lezgîn, Roşan. "Averşîyayîşê Lehçeyanê Kurdkî de Rolê Edebîyatî". Şewçila, c. 9, r. 4.*

*3-Malmîsanij, Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekîr'de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920), Weşanxaneyê Vateyî, Îstanbul, 2010, r. 18.*

*4-Grûba Xebate ya Vateyî. Rastnuştişê, Çapa. 2. Weşanxaneyê Vate, Îstanbul, 2012, r.17.*

Peynî de çend welatperwerî vejîyay û binê Grûba Xebata ya Vateyî de dest eşt lehçeya kirmanckî. Na grûbe, ziwanî ser o xebitîyaya û şarê ma hîşyar kerde. Grûba Xebate ya Vateyî hetê nuştiş, standardîzekerdiş û termînolojî ra kirmanckî rê gelek xizmet kerdo. Grûba Xebate ya Vateyî 1996 ra nat ziwanê ser o xebitîyena. Grûbe, derheqê kirmanckî de gelek kombîyayîş viraştî. Kesê ke kombîyayîşan de amade bîy nê qeza û bajaranê cîya-cîyayan ra yê: Bongilan, Çewlîg, Depe, Dêrsîm, Erzîngan, Gimgim, Hênî, Licê, Palî, Pîran, Sewregi. Yanî zaf kesan na xebate de esta. Nika zafaneyê nuştoxan bi goreyê krîteranê Grûba Xebate ya Vateyî nusenê.

Kirmanckî de metnê modernî verê hetê Malmîsanijî ra nusîyayê. Nuşteyê Malmîsanijî serra 1979 de kovara Tîrejî de weşanîyayê. Malmîsanijî hîkayeya xo Engişte Keje bi kirmanckî nuşta. Na hîkaye, serra 1980 de hûmara dîyine ya kovara Tîrejî de weşanîyaya.

Kovara kirmanckî ya verêne Vate kî serra 1997î de, Swêd de dest bi weşanî kena. Kovara Vateyî cuya kirmanckî de cayêko zaf muhîm gêna.

Belkî Tirkîya de rojêk rejîmêko demokratîk ronîyeno û ma zî bi ziwanê xo perwerde benê. Eke kurdî biresê rewşêka serbestîye, hem şênê xo aver bêrê hem zî serkewtişanê zaf girdan qezenc bikerê û warê ziwanî de xo biresnê sewîyeya miletanê averşîyayan.

> Kurdkî nameyê panc lehçeyanê cîya-cîyayan o. Nê lehçeyî; kirmanckî, kurmanckî, sorankî, hewramkî (gorankî) û lurrkî yo. Lehçeya kurmanckî hem cografyaya hîra de hem zî welatanê bînan de yena qisey kerdene. No hal seba averşîyayîşê lehçeya kurmanckî yew avantaj o. La kurdê kirmancî tena mîyanê sînoranê îdarîyan yê Tirkîya de ciwîyênê.

Kitabêko muhîm:

# 1838 Yazında Kürdistan



Seke ma zanê derheqê tarîxê kurdan de di tewirê çimeyanê serekeyan ra yew zî seyahetnameyê oryantalîstan ê. Ma wazenê çimeyo ke winasî şima rê bidê şinasnayîş. No çime bi nameyê "138 Yazında Kürdistan" (Hamnanê 2018î de Kurdîstan) ye kitab o. Kitab notanê seyahetê konsolosê Erziromî yê Îngilistanî James Brantî ra awan beno. Brant hamnanê 1838î de zafaneyê Kurdîstanî ra gêrayo û muşadehanê (gözlem) xo 1840 de kovara Journal of the Royal Geographical Society of London de sey meqaleyêka derge weşanayo. James Brantî ke hema-hema her roj nuşto, eynî wext de cayê ke ci ra gêrayê, derheqê înan de hetanî detayan melumatî daye. Cayê ke James Brantî dîyê û înan ser o nuşto nê yê: Gimgim, Pasûr, Çiyayê Andok, Badika, Licê, Silwan, Hênî, Maden, Xarpêt, Pali, Çewlîg, Bongilan, Bidlîs, Tetwan, Westan (Gewaş), Wan, Erdîş, Elcewaz, Norşîn, Çiyayê Sîpanê, Xelat (Exlat), Gîyadîn, Bazîd, Qerekilîse, Zêtka (Eleşkirt)

No kitab hetê weşanxaneyê Rûpelî ra (çapo yewin 2014, Îstanbul) çap bîyo û 192 rîpelî yo. Merdim her çiqas notanê Brantî ra ca-ca tesîrê oryantalîstîye yo negatîf bivîno zî kitab seba ke derheqê rewşa sey nufus, sosyolojî, dîn û sewbîna taybetîyanê herêman yê ê wextan de melumat dano muhîm û erjaye yo. Xusûsen çend mintiqayanê kirmancan ser o melumatan îhtivakerdişê nê kitabî bi hawayo xususî bala ma ante û ma coka na hûmare de ca da ey. Ma wendoxan rê pêşnîyaz kenê ke wa nê kitabî biwanê.

Sernuşteyê kitabî wina yê: Notê weşanxaneyî, Erzirom ra ver bi Xinûsî, Xinûsî ra ver bi Mûşî, Mûş ra ver bi Pasûrî, Pasûr ra ver bi Licê, Licê ra ver bi Hênîyî, Hêni ra ver bi Madenî, Maden ra ver bi Xarpêtî, Xarpêt ra ver bi Palîyî, Palîyî ra ver bi Çewligî, Çewlig ra ver bi Bongilanî, Bongilan ra ver bi Mûşî, Mûş ra ver bi Bidlîsî, Bidlîsî ra ver bi Tûxî (Tetwanî), Tûxî ra ver bi Westanî, Westan ra ver bi Wanî, Wan ra ver bi Erdîşî, Erdîş ra ver bi Elcewazî, Elcewaz ra ver bi Xelatî, Çiyayê Sîpanî, Elcewaz ra ver bi Gîyadînî, Gîyadîn ra ver bi Qerekilîseyî, Qerekilîse ra Zêtka (Eleşkirt) - Korukoy ser ro Erzirom. (Herçiqas mîyanê kitabî de sernuşteyî ca bigîrê zî orîjîne metnî de çin ê, semedo ke wendişê kitabî rehet bo hetê weşanxaneyî ra îlawe bîyê.)

### Muhtewaya kitabî ra:

... Dewa Gimgimî cayêko berzîya xo 1474 metre yo de, gelîyêka şîrine de awan bîya. Vakurê dewe de Koyê Bîngolî ke ma senî ke Xinus ra vejîyayîme nêvejîyayîme dormeyê înan ra gêrênê estê. Eke merdim rayîr direk taqîb bikero û şoro eşkeno vîst saetî de bireso Erzirom û yew rayîro dîrekt o ke Koyanê Bîngolî birneno zî esto. Dewe yew weqf a (vakif) yan zî weqfa ke aîdê camî ya. Muxtar wayîrê şanê (unvanê) Şêxî yo û mensubê terîqetêkê derwêşî yo. Nufusê dewe hem bacê sâlyâne ra hem zî camêrdê dewe beşdarê artêşa nîzamî û hêzanê mîlîsan ra muaf bîy. Dewe de hîris keyeyê kurdî û teqrîben pancês keyeyê armenîyî ciwîyayêne. Ma ke deşta Hesenqela (Pasînler) ra vejîyay nêvejîyay mi hende erazîya ramite nêdîbî, erazîyê ke mi dîy bî zî zaf serûber û bêtîna ameybî ramitiş. Zaf cayan de dendikê heban (tahilan) hema ke serê erdî ra bîy. Na gelîye de normalî ra zêdeyêr erazî ameybî ramitene. Ma ra ame vatene ke erd/erazî berdar o û dewranê başan de toxim yewî rê diwês katî mehsul dano...

... Çevlî [bi nameyê xo yo ewroyin Çewlîg], îkametgehê fermî yê begê Cabakcur yan zî Çibakçûrî yo. Mintiqaya Çibakçûrî Paşatîya Dîyarbekirî ra ke goreyê vatişan tîya ra 24 saetî dûrî ya ra girêdaye ya. Merdim ke şoro Awa Mûradî ver bi başûrî di û nêm saetî encena û merdim şêno hamnan tayê cayanê aye ra bivîyaro bover... Çevlî kîşta serê dereyêko xorîn de, yew gelîya ke dîyar o hetê awe ra şekil dîyayo ci de awan bîyo. Dewe nêmêyê xo kurd, nêmeyê xo armenî 150 keyeyan ra yena pê. Asîyayîşê înan ra dîyar beno ke mîyanê refahî de [şertanê başan de] nêciwîyenê. Bego ke zaf zekî nîyo seba ke mi ziyaret biko ame dîyarê mi. Beg şeşetî dewî ke zafê înan qij, zafaneyê înan de panc yan zî des keyeyan ra vêşêr nufus nêciwîyeno rê hukm keno. Begî tim va ke ma Paşayê Mûşî û Begê Gêxî ra tedayan vînenê; her dîyînan zî hucûmê dewanê înan kerdo. Malê înan şelenayo û talan kerdo....

# Referandûm û Şair



BERKEN BEREH

Referandûma di 25ê îlona 2017 de li Herêma Kurdistanê bê pêkanîn, bêguman di nav civaka Kurd de bû cihê serbilindî û bextewariyê. Ji her qatên civakê; ji feqîr, maldar, siyasetmedar, akademîsyen...ta endamên hemû ol û ayînan kêfxweşiya xwe ragihandin -çi li ser tora medyayê, çi bi nivîs, hevpeyvîn, meş, panel, konferans.. û xwestin bi vê sekna xwe tesîrê li civakê bikin û raya giştî amadeyê giştpirsiyê bikin.

Helbet biryara referandûmê wek herkesi bandora xwe li ser edebiyatvanan jî kir.Gelekan bîr û ray û helwêsta xwe aşkere kirin. Lew şair û şi'ra Kurdî ku xwe dispêre dîrokeke hezar salan, her li gel civaka xwe jiyaye û li gor rewş û mercên civakê dirûv û teşe girtiye. Ji ber ku şi'r, di nav xir û cira jiyanê de bi goşt û laş dibe û bandorê li ser dil û giyanê me dike.

Şi'r, û şi'rnivîsandin seknek e li hember jiyanê. Nemaze di wext û demên teng de. Ev sekn, pencereyeke ku tê de hemû tiştine parzûnbûyî (ji xwe, ji hizr, raman, ji hawirdor û têkiliyên wî/wê) pak û zelal dixuye. Ango şair rastiya li dorhêla xwe li moxila helbestê dixe û wê rastiya gelek caran em nabînin û pê nahisin raberî me dike. Bêguman şairê ber bi cîhaneke din rêketî û bi sebr, aram û berxwedêriya xwe ne tenê xwe, hişmendî, feraset û ramana civata xwe jî vediguhêze.

Rojen Barnas, yek ji wan şairan e ku bi hostayî duh û îro digihîne hev û asoya me ya dahatûyê ronî dike. Bi şi'ra xwe ya bi navê Zarbienos ku di kovara Nûbihar hejmara140an de hate weşandin de bêyî ku navê wê hilde biryara referandûmê dike mijara şi'ra xwe. Zarbienosa Barnas, hawar û gaziyeke ji dil e li hizb, rewşenbîr, maqul û rençber, karsaz û kedkarên Kurd ku ev derfeta me bi saya pêşmergeyan bi dest xwe ve anî, bi goşt û laş kirî, badilhewa nebe.

Zarbienos û ruhê wî bangawaziyeke bo hemû Kurdan nexasim jî bo siyasetmedaran da têbikoşin, bo pêkanîn û avakirina serweriya Kurdan;

ZARBIENOS*
.....
Min şahek hebû tacdarê textek serbixwe
Veniştiyê li kela "Arbela"yê**
Şahek di riya serweriya welatê xwe têkoşer
Ji Şingalê ta raserên çavkaniyên Dîclê
Li ser axa xwe
Bi serxwebûnî
Û serwer.
-I-
Li giyanê te digerim
Di hejîna pelên li gulyê spîndarê
Di lemelema xulxulîna ava keviyan
Yên ji bêlanên çiyayên serî bimij...
Di xavika hevrîşmî ya wek pelek ewr
Ku wek xêliya xanimşahek, li esmanê havînê
Û di hênikahiya sirra spêdê
Ya sariya evînê.
Li giyanê te digerim Zarbienos,
Li giyanê te!
.......
-II-
Ez,
Li rê...
Destpêka wê nayê bîra min
Lê hê jî averê nebûme
Lê dikudînim.

Serwerîhebîn im Zarbiyenos
Loma bi evîn im, li kiryara te.
-III-
Di sariya evînê de
Li berwarên Zagrosê
Di bin Gola Şîn
Me destnimêja xwe girt
- a bi niyeta serweriyê -
Di sariya evînê de, em
Li ser destnimêja ezel û ebed
Bi mebesta serxwebûnê bi rê ketin.
Li vê riyê,
Me kudand
Û kudand
Û kudand....
Bi mebesta ku viyana xwe
Bi destê kesî re bernedin
Me xwe
Li riya azadiyê
Eynen bi mirina nefsa xwe
Xwe li rê şidand.
Ev, ew rê ye Zarbiyenos!
Ev, ew rê...
Ew riya ku te bi xwe jî
Çend laçînan lê peritand....

Jixwe Jusdanîs jî piştgiriya wî dike; "mîsyon û armanca dawiya dawî avakirin û xurtkirina dewleteke serbixwe ye."

Zarbienos, ne tenê şi'reke her wiha ew ayeteke ruhê Kurd e. Lewma Barnas, me dibe beriya zayîna Îsa, ku li wir, ferqiyetên ayînî, olî, çînî hwd. nebû an wek îro ne şûrên ji hev parçekirinê bûn. Ew ayet in ku "ilham ji esmanê welat in."

Bêguman Zarbienos, wek gelek şi'rên Rojen Barnas, şi'reke lîrîk î, bi coş û xiroş û xwedî gelek taybetmendiyên ciwankariyê ne. Vêca Zarbienos û ruhê wî yê tacîdarê "Arbela"yê û bo serweriya welatê xwe têdikoşa, îro careke din li ser piya ye û rabûye pêdarê, dixwaze bi rêya giştpirsiya ji gel, tu şik û gumanan nehêle li dû xwe û serxwebûna xwe ragihîne tevaya cîhanê.

Û bang û hawara min ev e ku hemû edebiyatvan piştgiriya vê hewldana pîroz ya "ruh"ê nû bikin.

**Helbet biryara referandûmê wek herkesi bandora xwe li ser edebiyatvanan jî kir. Gelekan bîr û ray û helwêsta xwe aşkere kirin. Lew şair û şi'ra Kurdî ku xwe dispêre dîrokeke hezar salan, her li gel civaka xwe jiyaye û li gor rewş û mercên civakê dirûv û teşe girtiye.**

**Ez jî bi şi'rek xwe tevlî bangawaziya R.Barnas û ya Zarbienosê hemdem dikim û hêvîdar im ew tacîdariya bi sedê salan e em bi hesreta wê dijîn vê carê ji dest me neçe!**

SIRÛDA REFERANDÛMÊ

Me işqek din navê ji bilî Zînê,
Ew Zîna Mem bo wê, xwe kire qurban.
Me serweriyek din navê j'bilî Kurdistan,
Ku bi hezaran mêrxas bo çûne gorê.

Min işqek din navê tu yî ruh û can,
Tu yî Roja dibiriqe li esmanê min,
Bibişir ey Kurdistan, da dinya bibişir,
Dar û nebat, heyv û tav, rabin govendê.

Îro ew roj e, Mem bigihe Zînê,
Îro ew roj e raweste, giryê Kurdistanê,
Bijîn keç û xort, pîr û kal, feqîr û maldar...
Dibezin ser sindoqan da bêjin belê!

Tu ey kurd, suryan û tirkmen, aşûr û kakey...
Hemû ol û ayîn; êzdî û krîstiyan,
Feylî û şebek...kurên Kurdistan,
Lehi rawesta, tariyê bar kir, xweşî vegerya !

Mizgîn li te ey Xanî, Simko, Qazî , Barzanî...
Seranser şahî û dîlan e li xaka welat,
Bi yek dengî diqîrin dibêjin belê;
Tu bi xêrhat ey serxwebûn, ey roja nû hilat!

# Dem e; birîna sedsalan bicebirînin



AHMEDÊ HEPO

*"Welat him dê ye,*
*Him bav e,*
*Him jî heyîna gel e"*

Dîroka gelê Kurd tim rewş bi rewş, rûmet bi rûmet û rêzdar bi rêzdar bûye. Ji ber ku vî gelê mêrxas bona azadiyê, serbestî û rizgariyê bêjimar serhildan, hejên azadiyê, dagerîn û şoreş di jiyanê de daye miyaserkirin û bona tewbûna welatê xwe tu dema şûrê xwe nekiriye kêlin. Lê ax û wax ew negihîştiye daxwaza xwe ya dawiyê! Daxweza dawiyê ya salzemanan a sedsaliyan, Ew bûye wek welatê xwe yê beş-beşî, kerî-kerî ya birîndar. Kurdistana xwe ya dewlemend a reng bi rengîn bi carekê ve azad kin. Lê sedem çi bi çi bûye, wekî ev gelê pirr mîlyon bi carekê ve nebûye xwedanê sîniya kakilê Azadiya welatê xwe? Kê xwestiye hatiye ji tixûbê wê re derbas bûye, çi xwestiye bona kêrhatina xwe miyaser kiriye. Paşê rûniştiye keniyaye, qerfê xwe bi me kiriye.

Sedemek, meniyek, malwêraniyek ew bûye, wekî dijmin nehiştiye Kurd yek bin. Cedandine yekîtiya wan bidin teribandin. Rasterast hinek xapandine, bi wedelî giliyên xwe yên şirîn dane wan, paşê hetahetayê bi xwe pariyên şirîn xwarine.

Vê nêtêra ku kalûbavên me bi hişkûrî, bi dûrdîtin gotiye:

Yek be,
Ciyê beg be.

Wê hêjayî gotinê be, wekî meniyeke reşeheşiyê jî ya ku bûye zincîrbenda serbestiya welat, bînin holê. Ew jî pirr qebiltî, êl, êşîrtî, pir-olî bûye, niha jî pirr partiyatiyê...

Lê îro dem ew dem e, gotî, hemû gelê Kurd bibe yek, pirsên ku bi sedsalan e nehiştine Kurdistan rizgar bibe, ser re qetrana reş bikişînin, ala welatê xwe nava alên dinyayê de bidin bilindkirin, guh bidin ser vê gazîyê:

-Ez bi gorî, nehêlin beraşên aşan roda herin, paşê pey çeqeçeqê kevin!

Giringe ser gotinên jordîn de wê yekê zêde kin, wekî pêşiya rêyên şerkariya azadiya gelê Kurd ku tu dema nehatiye girtin, ew bi navberiyên kurt û dirêj ve hey hatiye domandin. Wan hêjana, wan şerkariyana, wan herêkana bi serkarî, bi rêvebirên navnamûs jiyanê de hatine miyaserkirin û her yekî teqileyek daye serketinê, xemilek daye rûpel û giraniya dîroka gelê Kurd. Him jî bona neyaran xof bi pêş de anîne. Di gotareke kurt de emê nikaribin navê her xweşmêrî, yê ku bûye pêşewîtiyê gelê xwe, yê ku ji gelê xwe re navdengekî bilind aniye bikişînin, qewil, herêkên îro ferz re girêdayî emê ser navekî pîroz, navekî ku dîrok xemilandî, dîrok xuliqandî-Mistefa Barzaniyê tim zindî bi rêwîtiya lez bisekînin. Derbarê vî lehengê dîrokxemildarê gelê Kurd de gellekî hatiye nivîsîn, hatiye afirandin û ew karê pîroz wê ji vir pê de jî bi sedsaliyan bê domandin.

Mezinahiya her serkarî, rêvebirî di wê yekê de ye, gava qewmandinên dîrokê dixuliqin, ew li hev dialin û ew kes wan sererast dike. Lê ew serkar, ew rêvebir ê ku çareseriyê li çarenûsa gel dike û bona daxwaza gel dîrokê dixuliqîne, a yên usa dibin bê himber, çawa Melle Mistefa Barzaniyê tim zindî.

Ji çendî-çend minakan minakekê bînine holê. Gava sala 1947an Komara Demokratîk a Kurdistan bi destên neyaran hate hilweşandin, kesekî ji Mistefa Barzanîyê nemir re negot, berê xwe bide Yekîtiya Sovyetê. Vî hişmendiyê dûrdîtî ew rêya sîyasî bi xwe bijart û rastî jî rûpêlek di dîroka gelê Kurd de da xuliqandin. Îro jî ew 11 salên Barzaniyan a li Yekîtiya Sovyetê, ji ser nexşeya Kurdistanê ya sîyasî nehatiye hildan lê bi wê ve pirsa rizgariya Kurdan bi erênî tê niqaşkirin.

**Gava sala 1947an Komara Demokratîk a Kurdistan bi destên neyaran hate hilweşandin, kesekî ji Mistefa Barzanîyê nemir re negot, berê xwe bide Yekîtiya Sovyetê. Vî hişmendiyê dûrdîtî ew rêya sîyasî bi xwe bijart û rastî jî rûpêlek di dîroka gelê Kurd de da xuliqandin.**

Kurt bibêjim, vî nexşhûnanê dîroka gelê Kurd -Melle Mistefa Barzanî- herêka rizgariyê anî derxist ber şêmîka damezirandina welat, badeka çerxa wê da ewladê xwe, ewladê gel -Mesûd Barzanî ku ew çend sal bûn ciyê ku bavê wî piyê xwe datanî, wî serê xwe datanî.

Li vir meseleyeke gel wê cî bi cî be:
Mala zêran xirab dibe,
Mala mêran xirab nabe!

Ewladê şîrhelal her tim armancên bavê xwe diqedîne. Lewma jî warê bavê tim hêşin e, mal jî şên bi şên e.

Bê şirovekirin her tişt eyan e, zelal e û merem xweş e! Ev çi ku min ji hevoka ewilîn nivîsiye dilê xwe de, hiş-sewdayê xwe de referendûma ku wê Kurd û Kurdistanê ji berdestiyê, bindestiyê AZAD BİKE, ya ku wê DAXWAZA Rizgariyê, Azadiyê, Serbestiya sedsalan bike para vî gelê mêrxas, alandiye.

Îro çi binivîsim çi nenivîsim heq ew e, wekî daxwaza Azadiya sedî-sedsalan beqî Mesûd Barzanî hatiye derê me gelê pirr mîlyon biriye.

Îro, serok Mesûd Barzanî li dinyayê hatiye naskirin, çawa pêşekzan û stûnê pirsa gelê Kurd a ku bona gellek welatan hewceyî safîkirinê ye.

Wekî îcar em hev re-hev re nebin yek, neçin dengê xwe nedin referandûmê, dengê xwe nedin heyîtiya gel a Kurdistana rengîn, usa bizanibin em bi hev re neyariya dîrokî dikin! Teniya sêla reş qestbende hildidin, rûyê hev didin. Paşê çiqasî bikî nekî, tuyê, ezê, emê nikaribin wê teniyê bişon, rûyê meyê bi sedsalan bal dayikan, bal ewladan, bal gelê mayîn a sereke bal dayîka diya me Kurdistanê wê reş be, qetran be!

Xwendevanên hêja!

Biborînin ez çawa rûsîpîk, di dawîyê de dixwazim daxwezeke dilê xwe jî binivîsîm:

-Cara yekemîn ew kes, ew kesê ku wê dengê xwe bide "Erê"ya referandûmê ew hetabê dinyayê ye.Ya duyemîn; Her kesê ku wê here ser sandoqê dengê xwe bide referandûmê, bila xwe re bîranîn, belavokeke dîrokî binivîse: "Ez Hesoyê Bedo 25ê îlonê sala 2017an li bajarê Hewlêrê tevgelî dengdayîna referandûma damezirandina Kurdistanê bûme. Hejmara belgoka referandûma min ev e: №777."

Pey dengdayîna pîroz re vegerin cîwarên xwe, endamên malbata xwe, qewm-lêzimên xwe beşter bike û wana re bêje:

-Şukur birîna me ya salan, ya heyîna welatê me, ya damezirandina Kurdistanê kew girt, hat cebirandin!

Paşê rabe şipê bi şabûna dinyayê axaftina xwe bidomîne:

-Ev belavoka di destê min de nav, paşnavê min, dîroka roja dengdayînê û hejmara belgoka min hatiye nivîsarê. Ez şîret dikim, her kes pêwîst e vê belavokê ji silsiletekê, hetanî silsileteke din mîna bîbikreşaya çavên xwe biparêze. Ez bawer im sedsalî şûn de wê bê elam kirin; di mala kê de, belavoka referandûma sala 2017an heye, bila bînin, çawa xelat Ala Kurdistanê –heyîtî û serbilindaya xwe ya hetahetayê bistîne. Pîroz, sed car Pîroz!

(*)Endamê Yektiya Nivîskarên Azerbaycanê.

# Ziman û Netewbûn



ŞÊXMÛS SEFER

Hewce nake mirov gotinê zede dirêj bike, mirov bi kîjan zimanî bijî bixwaze jî nexwaze jî aîdî wî zimanî ye. Dibe ku tu Kurd be, li paytexta welatê xwe bijî, serbilindiyê bi bircên hezar salane bike û bêje; çi dîrokeke me ya kevnar heye lê dema tu bi Tirkî peyivî li bin siyên wan bircan, kodên te, hebûna te ya wê deme û pêşeroja te dibe Tirk/î. Mixabin me Kurdan piştî modernîzmê pir jixwexapandinê hez kir. Dibe li ser navê rojavayîbûnê be, dibe di wextê xwe de ji ber şermî an tirsa axaftina zimanê xwe be me li bakur bi hêsanî berê xwe da zimanê Tirkî. Sed heyf û mixabin ew ne bes îcar a niha li başûr jî ew bûye 'moda' ku gelek kes dema yekî bakurî dibîne dixwaze pê re bi Tirkî bipeyive! Ev jî di derûniya mirovan de xwe wekî ji rojhilatbûnê xelas bike û ber bi rojavabûnê (modernîzmê) bibe dide xuya kirin.

Di rastiya xwe de wê ev yek çawa bê çareserkirin û rê li ber vê yekê çawa bê girtin, divê hemû kes û saziyên peywendîdar serê xwe pê re bêşînin û di zûtirîn demê de alternatîfan pêşkeşî civakê bikin.

Ev yek jî mixabin bi dirûşmeyên 'zimanê me rûmeta me ye' 'sînorê me zimanê me ye' û hwd. nayên çareserkirin. Li bakur divê êdî daxwaza hînbûna zimanê dayikê ji amûrekê siyasete derkeve û bibe armanceke sereke. Yanî ne ku tenê siyaset li ser bê kirin û ji bo armancên siyasî ziman were bikaranîn. Ziman bi xwe bibe armanca sereke û eger siyasetek bê kirin jî bi wî zimanî bê kirin. Mixabin civaka rojhilata navîn li rol-modela dinêre û dema ku ew kesên di siyasetê de li pêş bin û ne bi Kurdî, bi zimanên serdestên xwe dipeyivin tu bikî û nekî wê civak bandoreke neyinî ji wê atmosfere wergire.

Bi kurmanciya reş eger em bibêjin; nabe parlementereke te ya jin di 8ê Adarê de li bajarekî Serhedê li hember bi hezaran dayikên Kurd bi Tirkî bipeyive! Ev şermeke mezin e berî her tiştî bo wan dayikan û bişaftina mezin tu bi destê xwe li gelê xwe dike. Naveroka wê axaftinê çi dibe bila bibe, çiqas bi wate dibe bila bibe, çiqas bi hêz dibe bila bibe di encamê de pûç e! Yek jê ji ber bi giştî ji ziman nayê fêm kirin û ya din jî ji ber xizmetê ji bişaftinê re dike. Eger em bi zimanekî din bêjin; nabe ku kesek bi zimanê gelê xwe nizanibe rabe ji bo wî gelî siyasetê bike! Ji ber civaknasiya wî gelî û derûnnasiya wî gelî eger tu zimanê wî zanibî pêkan e. Tiştekî tu nizanibî û nas nekî nabe ku tu rêberiya wê bikî.

Îcar mixabin heta a niha tiştên ku di siyaseta bakur de me dîtiye ev e ku ziman bêtir daxwazeke 'şeklî' ye û mixabin ji bo guhertin û hêvîkirinê jî tu gavên mezin nayên avêtin. Tenê dikarim bêjim di van salên dawî de ji bo pêşdibistanan çend mînakên baş xuya kirin lê ew jî ne siyaseteke giştî bû ku mirov karibe bêtir li ser bisekine û li benda berdewamiya wê be.

Li Başûr jî bi dehan salan e ku jiyaneke otonom heye û ji bo perwerdehiyê jî azadiyeke têr û tije heye. Bi taybet nifşên dawiyê hemû bi zimanê dayika xwe mezin bûn. Nabe ku li başûr kesek bi zimanê xwe nizanibe. Ev derfeteke pir mezin e û divê qiymetê vê yekê bê zanîn. Lê mixabin di meseleya alfabeyê de hikumeta başûr heta a niha tu gavên erenî neavêtiyê. Ji wî alî de tiralî û xemsariyeke mezin li başûr heye. Li gel ku gelek kesên ji başûr piştî şerê salên nodî derketin çûn Ewrupayê û rêjeyeke baş ji wan li Ewropa lîsans û doktora xwe kirine jî û hin ji wan di hukumet, parlemento û saziyan de bûne berpirsiyar jî di derbasbûna alfebeya latinî de yek gav neavêtin. Her çiqas tê fêm kirin ku ev yek bi hêsanî nabe û wext jê re divê jî lê mixabin tu gavên biçûk jî nehatine avêtin ku bo pêşerojê hêvî bide. Îroj piştî şerê li Iraq û Suriyê ji bo hin Erebên hatine Stenbolê, hema hema li hemû kolan, xwaringeh, hotel û hwd. bi tîpên Aramî (erebî) nivîs hene. Ev li gorî min bi du sedeman tê kirin. Yek jê polîtîk e ku dixwazin bi riya îslamiyetê an jî bi zimanê quranê peyama yekitiyê bi Ereban bidin an jî wê hîskirina manewî bi wan bidin xuya kirin ku xwe wekî xwediyên wan hemûyan bibînin û wan hemûyan di bin sîwana xwe de kom bikin. Ya din jî xwe wekî welateke baş û xweş bidin xuya kirin ku vaye em ji her neteweyê re alîkar in û ewqas jî demokrat in beyî ku tahamula yek peyva Kurdî bikin li kolaneke xwe!

Hukumeta başûr heta niha dikarîbû ji pêşdibistanan bigire heya zaningehê li ber alfabeya Aramî ya latînî jî deyne ber û bike ku hemû şagirt bi du alfabeyan mezin bibin. Ev yek wekî xuya dike ne zehmet e ewqas. Bêtir tercihek e û ev tercih jî jiyan û politikaya mirovan an dewletan diyar dike.

Bêguman xelasiya zimanê Kurdî bi polîtîkayeke zanist û jidil pêkan e. Li hin welatên mîna Baskê gelek modelên ciwan derketine û derdikevin pêş jî. Ji aliyekî hikumeta navendî her sal pereyekî vediqetîne ji bo perwerdehiyê lê ji aliyê din ve jî hêzên heremî ji destpêka hilweşandina faşîzma Franko dest bi xebatên xwe yên ziman kirine û îroj jî di asteke pir baş de ne. Benda hukumeta navendî nemane ku her tişt bi destê wan bibe. Pêşî wan daxwaz kiriye, wan pratîze kiriye û paş re dewlet mecbûr maye daxwazan pêk bîne. Di dema îroyîn de eger rast û rêkûpêk bibe, hebûna dewleta Başûr û modela perwerdehiyê dikare hêzeke mezin bide perwerdehiya Kurdî ya giştî ji bo hemû perçeyan. Eger mijara me Kurdî be em wê demê behsa çar perçeyên welêt dikin û divê rêçareyên wê jî li gorî şert û mercên her perçeyî lê di bin sîvaneke netewî û eger pêkan be bi yek alfabeyê be. Divê her alî di vê mijarê de pir baldar be eger bixwazin yekitiyekê saz bikin. Bêguman ew jî bi ziman dibe.

Prof. Dr. Salih Akın:

# Çarenûsa Kurdî bi statuya Kurdan ve girêdayî ye

**EVÎNDAR TEKÎN**



Van demên dawîn, ji ber şert û mercên awarte li seransera Kurdistanê nîqaşên li ser ziman, çand, dîrok û folklora Kurdî rawestiyane û raya giştî bi piranî bala xwe daye geşedanên siyasî û leşkerî. Lê me derfetek dît ku bi Zimannas Prof. Dr. Salih Akın re ku li Zanîngeha Rouen (Fransa) zimanzan e û bi salan e serê xwe bi zimanê Kurdî re êşandiye û kedeke mezin daye, hevpeyvînekê bikin. Wî jî bi dilgermî pirsên me bersivandin.

**Yek ji wan kêşeyên sereke ez bawer im standartbûna Kurdî ye. Tu vê pêvajoyê çawa dinirxînî?**

Belê, a niha pêvajoyek heye ku zimanê Kurdî ber bi standartbûnê ve diçe û ev yek bi şert û mercên siyasî û civakî yên Kurdan ve girêdayî ye. Berê Kurdan zêde hevûdu nas nedikirin. Tê bîra min di sala 1988an de di wexta komkujiya Helebceyê de bi hezaran Kurd koçî Bakur kirin, min cara pêşî Kurdên Başûr dîtin ku wê demê nedixwestin ji wan re bêjin "Kurd" digotin "Pêşmerge". Heta wê çaxê televizyonan qet behsa wan nedikir. Lê a niha bi riya ragihandinê, înternet, TV, radyo, bi riya rabûna sînorên di nav Kurdan de û bidestxistina statuyên siyasî Kurd, îro nêzîkî hev bûne. Sînora di nav Kurdan de hilweşiyane û çûnûhatin û danûstandina di nav Kurdên çar perçeyan de xurt bûne. Ev temasa civakî û însanî û her wiha bi riya înternet û amûrên ragihandinê Kurdan nêzî hev dikin û ev nêzîkahî bivênevê bandorê li zaravayên wan jî dike. Meriv dikare bibêje têgihîştina di nav Kurdan de îro zêdetir e li gor 10-15 salên bihorî. Ji ber ku Kurd Soranî dibihîzin Zazakî dibihîzin, Kurdên soran Kurmancî (bi piranî Badînî) dibihîzin. Dibînin ku ev 3-4 zaravayên Kurdî ev çend jî ji hevûdu ne dûr in. Ya balkêş ev e ku ev pêvajo bêyî alîkariya sazî û dezgehên siyasî, bêyî mudaxeleya desthilatî, jixweber dimeşe û bi ya min wisa çêtir e lewre wexta dezgehên siyasî destê xwe bixine navê dibe ku pêvajoyê ber bi xwe ve kaş bikin û tiştên siyasî bixine navê. Hin derûdor standartkirina zimanan weke kuştina dewlemendiya wan dibînin û neyînî dibînin lê ez wekî zimannasekî, tu problemê tê de nabînim û standardîzasyonê, pêvajoyeke hêja û girîng dibînim.

**Asayî ye bes li aliyekî jî Kurd mecbûr in hevûdu fahm bikin. Soran ji Kurmancan fahm bike, Kurmanc ji Zazayan û hwd. Gelo dermanê vê pirsgirêkê çi ye? Gelo siyaseteke neteweyî ya zimanî di nav desthilatên Kurdan de hene ku dest bavêjin vê pêvajoyê?**

Ziman herî baş bi dewletbûnê re dikare xweş standardîze bibe û a niha tenê li Başûr bingeha dewletbûnê heye. Tenê li wê derê siyaseta zimanî bê meşandin lê li wê derê jî ev siyaset gelek bi kêşe ye. 4-5 sal berê hin ronakbîrên Soran xwestin ku Soranî bibe zimanê fermî yê Herêma Kurdistanê. Gelek bertekên xurt hatin nîşandan û ev daxwaz hat paşvekişandin. Îro rewşeke wisa heye ku kes nikare zimanekî bi darê zorê qedexe bike an jî zaravayekî li ser zaravayekî din ferz bike. Divê pêvajoyeke dûvedirêj mirov bide ber xwe. Îro divê hem bi riya çapemeniyê hem bi riya perwerdehiyê pêvajoyeke pirzaravayî bê meşandin ku Kurmanc bikaribin berhemên Soranî bixwînin û soran jî bikaribin berhemên Kurmancî an Zazakî bixwînin. Bi vî awayî meriv dikare siyaseteke pirzaravayî bimeşîne. Dawiya vê pêvajoyê de kodeke hevpar wê derkeve holê. Bo nimûne zimanê ku a niha li Hewlêrê tê axaftin hem aliyên wî yên Soranî hene hem jî aliyên wî yên Kurmancî hene. Kurdekî ku qet Soranî nebihîstiye dikarin Kurmancî-Soranî ku li Hewlêrê tê axaftin bi hêsanî têbigihê. Çimkî Hewlêr bûye peytexteke kozmopolît ku hem Soranî hem Kurmancî hene, Kurdên rojava, bakûr û rojhilatî lê dijîn. Hewlêr weke laboratuarekê ye û encamên wê jî dê balkêş bibe bo pêşeroja zimanê Kurdî. Bo nêzîkbûna zaravayan gelekî erênî ye.

**Û her wiha heman pirsgirêk di warê elfabeyê de heye. Kurd a niha bi piranî du elfabeyan bikar tînin û Bakurî jî elfabeya erebî dûr e lê Başûr û Rojhilatî jî elfabeya erebî bi kar tînin. Peşniyara te li ser vê babetê çi ye?**

Berê Kurdan bi sê elfabeyan dinivîsandin. Elfabeyên Krîlî, Erebî û Latînî. Lê îro Kurd bi 2 elfabeyan dinivîsin. Her du elfabe jî ji bo taybetmandiyên Kurdî guncaw in. Mirov nikare bêje yek ji yekî guncawtir e. Em bixwazin nexwazin îro elfabeya erebî bûye perçeyek nasnameya Kurdên Başûr û Rojhilat. Divê meriv vê yekê qebûl bike. Ew jî nikarin bi hêsanî dev ji wê elfabeyê berdin. Meriv nikare daxwaza vê yekê ji wan bike. Çareserî ev e ku çaxê derfeta perwerdehiyê kete destê Kurdan, dikarin perwerdehiya bi 2 elfabeyan bimeşînin. Ev pêkan e. Di gelek modelên pirzimaniyê de pirelfabetî jî hene. Bo nimûne li Bakur elfabeya sereke bibe elfabeya Latînî lê digel wê mirov dikare elfabeya erebî jî bide hînkirin. Li başûr jî berovajî vê. Nifşên nû bila bi van herdu elfabeyan mezin bibin. Tu problem tune. Bes tenê li Başûr ev derfet heye lê ew jî mixabin siyaseteke baş a li ser zimên bi pîvanên neteweperweriyê nameşînin.

**Mamoste tu wekî Kurdekî Bakurî û wek pisporê ziman, rewşa Kurdî li Bakurê Kurdistanê çawa dinirxînî. Bo nimûne beşên Kurdnasiyê ku li hin zanîngehan vebûne, her wiha komele, kovar an çapxaneyan ji aliyê hejmar û çawaniyê ve?**

Bêguman ev beşên Kurdolojiyê ji bo zimanekî wekî Kurdî ku dîrokê jê re nebaşî kiriye û sed salî hatiye qedexekirin re derfeteke bêhempa bû. Li bajarên wekî Mêrdîn, Colemêrg, Amed, Çewlik û hwd. hatibûn vekirin. Lê beşa herî berbiçav ya Mêrdînê bû. Nêzîkî 30 mamoste û zêdetir ku ne tenê Kurdên bakur, Kurdên ji her parçeyan li wê derê civiyabûn. Bi rastî jî beşa Kurdolojiyê ya Mêrdînê bû ekol di warê Kurdnasiyê de. Gelek mamoste hatin perwerdekirin û gelek berhemên delal li wê derê hatin dayîn. Mixabin ev pêvajo hate qutkirin. Va salek, du sal in gelek mamoste ji kar hatin dûrxistin. Xebatên wan jî weke berê nayên piştgirîkirin. Ev cihê xemgîniyê ye. Me bawer dikir ku ev xebatên li Ewropayê an li Moskowayê dest pê kiribû êdî hêdî hêdî vegerin li ser xaka Kurdan. Bi vê baweriyê jî gelek lêkolînerên ku reviyabûn çûbûn nefiyê, vegeriyan welatê xwe. Mînakekê bidim, rektorê zanîngeha Mûşê hatibû Parîsê ku mamosteyan peyda bike û digot em dixwazin beşa Kurdnasiyê vekin bes mamosteyên kalîfiye tune. Îro ew pêvajo qut bûye, hêvî ev e ku ev pêvajoya ku piştgirî dida lêkolînên li ser ziman û çanda Kurdî cardin dest pê bike. Çapxane û her wiha derûdorên kovaran jî xizmeteke bêhempa dikin bo Kurdî. Lê mixabin hin gazinên çapxaneyan hene ku dibêjin xwendin gelekî kêm e li Bakur. Berê pirtûk tunebûn ku em bixwînin lê îro bi hezaran pirtûk hene lê li gor 20-25 sal berê ez dikarim bibêjim xwendevan kêm bune. Ev kêmasiyeke gelekî mezin e û divê sedemên wê bêne şopandin.

**Mamoste tu helwesta dewletê li hemberî zimanê Kurdî çawa dinirxînî?**

Bi rastî heta 2013-2014an hikumetê hemû astengên li ber bikaranîna zimanê Kurdî rakirin, hem nivîskî hem bi devkî. Lê mixabin tu statu neda vî zimanî. Bi min pirsgirêka herî girîng ev e. Wekî ku ji Kurdan re bibêje va me astengên li ber zimanê we rakir, êdî hûn li zimanê xwe xwedî derdikevin nakevin hûn dizanin, ev karê we ye, ne yê dewletê ye. Ev yek nayê qebûlkirin. Ji ber ku Kurd welatiyên vê dewletê ne, çawa bacê xwe didin, leşkeriyê jî vê dewletê re dikin divê dewlet jî mafê perwerdehiya bi zimanê Kurdî bide. Perwerdehiyeke ne tenê di dibistanan de wek ceribandineke pîlot û wek dersa bijarte. Lêkolînek li ser hatibû kirin û di wê anketê de derketibû holê ku hem xwendekar hem dê û bavên wan hem jî mamoste pir dilxwaz bûn bo perwerdehiya bi zimanê Kurdî. Lê mixabin ne materyal hebûn ne derfet hebûn. Diyar bû ku dewletê bi çavekî cidî li vî zimanî nedinihêrt. Ji bo vê divê bi perwerdeyeke giştî û fermî û di dibistanan de perwerdehiyeke bi mecbûrî be û bajarên ku bi piranî Kurd lê dijîn digel zimanê Tirkî zimanê Kurdî jî hebe weke perwerdehiyeke bi du zimanî bê dayîn.

**Tu dikarî hinekî behsa projeya li ser diyalektolojiya Kurdî ku bi hevpariya Zanîngehên Rouen û Manchesterê de tê meşandin bikî?**

Belê ev proje bi armanca nirxandina zaravayên Kurmancî û Soranî, dokumantekirina wan û danîna hîmê bi awayekî "database"ê di sala 2011an de bi alîkariya aborî ya British Akademiyê dest pê kir. Min û mamosteyek ji Zanîngeha Manchasterê Yaron Matras me bi hev re 2 salan projeyeke pîlot meşand. Li Dîasporayê me çend anket çêkirin da ku taybetmandiyên her du zaravayan binirxînin, dokumante bikin û wek databasê bingeha wê deynin. Dûv re me ev proje berfirehtir kir û bi alîkariya aborî ya Art and Humanities Research Council me nêzîkî 150 deverên Kurdistana Bakur û Başûr anket çêkirin û bi Rojava û Rojhilatiyan re jî me hevpeyvîn çêkirin. Di vê projeyê de me 500 peyv, hevok an gotin wergerandin zimanên serdest ên wekî erebî, tirkî, farisî, îngilîzî û hwd. da ku beşdarvan di bin bandora Kurdiya me de nemînin û me ji wan pirsî ev peyv, hevok an gotin li ba we çawa tên gotin û beşdarvanan jî bi Kurdiya taxên xwe, gund û deverên xwe li me vegeriyan û me jî ew tiranskirîp kirin û li malpera The Dialects of Kurdish bar kirin. Daneyên hêja derketin holê û portreyeke zindî ya zimanê Kurdî saz kir û bandora zimanên serdest li ser Kurdî, bikaranîna zindî, bondorên zaravayên din û nêzîkbûna zaravayan, rewşên zayend, ergatîviyê, bandora çapemeniyê hwd. zelal kir. Daneyên pir hêja derketin holê ku ên bi Kurdî re elaqedar in dikarin jê sudê wergirin. Mirov dikare metodên perwerdehiya zimên li gorî van daneyan derîne holê.

## Prof. Dr. Salih Akın ki ye?

Prof. Dr. Salih Akın ku bi salen e li ser zimanê Kurdî xebat û lêkolînan dike, ji Hezoya Batmanê (Êlih) ye. Piştî ku li Zanîngeha Dîcleyê Beşa Ziman û Wêjeya Fransî diqedîne, bi bûrsa hikumeta Fransayê derbasî Fransayê dibe û li wî welatî di warê zimannasiyê de master û doktoraya xwe pêk tîne. Ji sala 1998an û vir ve jî li Zanîngeha Rouenê kar û lêkolînên xwe birêve dibe. Di teza doktorayê de li ser navlêkirina têgehên "Kurd" û "Kurdistan"ê û zimanê Kurdî di gotarên zanistî û siyasî de xebitiye.

## Bextiyar Elî hêjayî xelata 'Nelly Sachs' hat dîtin

Nivîskarê Kurd Bextiyar Elî hêjayî mezintirîn xelata wêjeyî ya Almanyayê ya bi navê "Nelly Sachs" hat dîtin.

Komeleya Wêjeyê ya Dortmûndê ku xelata wêjeyî ya "Nelly Sachs" dide nivîskarên navdar yên cîhanê, ragihand ku xelata "Nelly Sachs" ya îsal dide nivîskarê Kurd Bextiyar Elî. Xelata wêjeyî ya "Nelly Sachs" du salan carekê û di salvegera jidayîkbûna nivîskar û helbestvana navdar ya Swêdî-Almanî, Nelly Sachs (10 Îlonê) de tê dayîn.

**Mezintirîn û kevintirîn xelata edebî ye**

Xelata "Nelly Sachs", ku mezintirîn û kevintirîn xelata edebî ye, ji ber romana "Hinara Dawîn a Cîhanê" ku bo zimanê Almanî hatiye wergerandin, bûye para Bextiyar Elî, hatiye dayîn. Nirxa xelatê 15 hezar euro ye. Kesên navdar yên mîna Erik From, Milan Kundera, Nadine Gordemir, Elias Canetti, Krista Volf, Daved Grosman û Margret Etud jî xelata "Nelly Sachs" wergirtine.

Nivîskara navdar Nelly Sachs 10 Îlona sala 1891 li paytexta Almanya, Berlînê ji dayîk bû, lê ji ber êriş û komkujiyên Naziyan neçar ma ku derbasî Swêdê bibe. Nelly li Swêdê sala 1970an de jiyana xwe ji dest da.





**CIWANMERD KULEK**

## Nasname

Sê nivîsên min ên dawî tên li meseleya nasnameyê disekinin. Nebûn û kêmasiya heqîqetên ku di van nivîsan de hatin diyarkirin meseleya me ya nasnameyê tevlihevtir û nakoktir dikin. Di cîhana îro ya ku rojeke wê ji rojeke sedsaleke berê bileztir diçe de, hêmanên nasnameyê me di gevzîkekê bê ser û ber de digijgijînin. Bê desthilatî, bêpariya ji rêveberiyeke 'adil û demokrat, bê ewlehî dihêle ku nasnameya kurdîtiyê hin caran bibe hepisxane ji dêvla ku bibûya pencereyek, zimanê me bibe tecrîdbûn ji dêvla ku bibûya pirek, kultura me bibe meytek ji dêvla ku bibûya dewlemendiyek. Bêyî dabînkirina şert û mercên pêwîst ji bo jiyandin û nimandina nasnameyê pesindayîn û şermezarkirinên li ser binemayê nasnameyê jî dibin mişkule. Ji ber nesaxlemî û arîşeyên di vê zeminê de ne bi pesindayînê kurdî û kurdîtî bi pêş de diçe yan xwe diparêze, ne jî bi tohmetbarkirin û şermezarkirinê aîdiyeta li vê nasnameyê zêdetir dibe û pêla asîmilasyonê kêmtir dibe. Tenê li pirsgirêkên xwe yên gihandina zarokên xwe binêrin ên ku, çi li derve çi li malê, gava ku hûn hewl didin bi wan re bi kurdî biaxivin û wan bi vî zimanî mezin bikin wan tûşî wan dibin. Kêferata hinkirina wan li aliyekî, ezabên wan zarokan ên ji ber nebûna tiştên ku jiyana wan ya zarokane bi wî zimanî bixemilînin li aliyekî dî. Kîjan jiyan, kîjan bajar, kîjan fîlim, kîjan listik, kîjan dibistan, kîjan heval, kîjan jîngê? Zarokekî hayê wî ji meseleyên nasnameyê tine be û bi ti zimanekî nizanibe daynin ber televizyoneke ku hezar qenalên wê hebin, gelo bi hemdê xwe û xweriskên xwê yên tabiî ew zarok ew ê li ser kîjan qenalan bisekine û bi wan şa bibe? Em nikaribin wan şert û mercan pêşkêşî wî zarokî bikin, em dikarin li wî bigirin û wî jê bikin berpirsiyar? Mixabin jiyana civakî ne di halekî ji halê vî zarokî baştir de ye û nasname çarneçar di nav nostaljiyeke xav, hemaseteke rijî, folkloreke rikuş de asê dimîne.

Dubendiyên li ser unsûrên dewletê, demokrasiyê û sînoran ên ku me di xelekên pêşî de diyar kirin, dema tê ser xala nasnameyê difeşkilin û sefên dîtir derdikevin holê. Heta ne sefên dîtir, bi giranî yek sefek dertê pêş, ew jî li ser bilindkirin, peyitandin, pîrozkirina nasnameyê ye. Bi pêşdeçûna –nisbeten – bi lez a li Başûr gotar û xwedîtiya eşkere a li nasnameyê li Bakur jî geş kir û pêla ku hebûn û parastina nasnameyê girêdayî desthilateke serbixwe (dewlet) dibîne ji berê zêdetir xwe îfade kir. Lê di nav vê pêla netewperweriyê de tişteki ku ez ji bo ayindeya netewîbûnê û îtibara nasnameyê xeternak dibînim rû dide. Hin caran ji bo mafdarî û pêwîstiya serxwebûna Kurdistanê "pîsî", "kirêtî", "hovî", "nemirovî" û hezar wesfên di ên xerab ên serdestan tê hejmartin û bi vî rengî hewildana pak û paqijbûna nasnameya kurdî, başî û rindiya kurdan tê misogerkirin. Eger ev "nebaşbûn" wek wesf û qerektera milletekî bê diyarkirin, ev ne netewperwerî ye lê regezperestî (racism/ırkçılık) ye. Ne tenê di dîroka mirovatiyê de, di dîroka ajelan û a hemû kozmosê de gen yan unsûreke irsî û biyolojik ku ti celebekî, nijadekî, azbetekê yan malbatekê ji alî etîk û mirovî de ji ya dî baştir yan xerabtir destnîşan bike nehatiye dîtin. Eger em kurd ewqasî bi nebaşiya mirovên dî zanibin û jê serwext bin, nexwe çima em di nav xwe û dîroka xwe de her tim pîs û nebaş û xayînên xwe dibînin? Bi min karesat ji wê mezintir nîne ku milletek nasnameya xwe li ser kîn û nefreta nasnameyên dî ava bike yan tarîf bike.

Mafê me yê perwerdehiya bi zimanê xwe heye ne ji ber ku tirk û ereb û ecem nebaş in, mafê me yê perwerdehiya bi zimanê xwe heye ne ji ber ku em baş in. Mafê me heye em xwe bi rê ve bibin ne ji ber ku tirk û ereb û ecem pîs in, mafê me heye em xwe bi rê ve bibin ne ji ber ku em qencên Xwedê ne. Mafê jiyanê, mafê azadiyê, mafên kulturî û civakî ne girêdayî wesfên şexsî ên cihê niqaşê ne. Mînak, rûsên dema Stalîn jî, elmanên dema Hîtler jî û fransiyên dema Mitterand jî, erebên siûdî jî, koreyiyên bakur û başûr jî xwedî van mafan in, tenê ne xwedî wî mafî ne ku êrîşî van mafan bikin.

Divê doza nasnameyê hêza xwe ji mafê me û mafdariya me bigire. Ji qewla ên berê "heq heq e." Qediya çû. Kîn û nifrîn mêjiyan pûç dike û berî her kesî zirarê dide xwediyê xwe. Eger em li vê bikudînin û vê gotarê bişidînin, piştî demekê em ê nema xwe bibînin. Qisûr û qebehetên aliyê hember dê piştî demekê bibe hincet û rûpoş ji bo xemsarî, kêmanî û qisûrên me. Wê çaxê dê di destê me de tenê bimîne zimanek, zimanê mexdûriyetê, ku zimanê herî dirêj û dewlemend ê cîhanê ye û ti carî dawiya gotara wê naye ku mirov derbasî kêmasî û meseleyên xwe bibe û gava xwe pêş de bavêje. Eger em li serbilindiyê digerin em li kar û 'emelên xwe binêrin û tiştê ku me li cîhana xwe zêde kiriye bibînin bes e.

Dema me ji stranekê hez kir ji ber ku bi kurdî ye lê ji yeke dî nefret kir ji ber ku tirkî ye, dema me ji fîlimekî hez kir ji ber ku kurdî lê ji yekî dî nefret kir ji ber ku farisî ye, dema me ji helbestkarekî hez kir ji ber ku kurd e lê ji yekî dî nefret kir ji ber ku ereb e, dema me ji keçikekê hez kir ji ber ku sunnî ye lê girrê me ji yeke dî çû ji ber ku 'elawî ye, dema me ji dikanekê danûstandin kir ji ber ku xwediyê wê misilman e lê ji yeke dî nekir ji ber ku xwediyê wê fileh e, dema me cinayetek şermezar kir ji ber ku kiryarê wê ne ji me ye lê yeke dî pesinand ji ber ku kiryarê wê ji me ye, wê çaxê nasnameya me dibe qeyd û bend, dibe hucreya herî tarî a cîhanê.

Şahesara Mezopotamyayê:

# Deşta Heranê

MEHMET ALI AYDIN

Rêjeya şaheserên Cîhanê ku ji dema antîk ta roja me û UNESCO qebûl dike yekem car ji aliyê Heredotê ku B.Z di sedsala 5. de jiyaye ve hatiye rojevê. Lê ji bo nivîskî bikeve dîrokê hê 300 sal mabû. Ev yek jî piştî 300 salî ji aliyê Antipatros ve bi berhema 'Li ser heft şaheserên cîhanê' hat nivîsandin. Di serdema me de jî şaheserên ji aliyê UNESCO ve tên qebûl kirin li gor vê metnê tên hilbijartin. Di nav wan şaheseran de tenê Pîramîda Keopsê maye û yên din hemû hilweşiyane û negihîştine roja me. Gelek piştî van dîrokan di sala 2000î de 'Dezgeha New7Wonders' ku navenda wê li Swîsreyê ye pêşbirkeke bi navê mîlenyûmê ku jê re dibêjin 'Heft şaheserên nû yên cîhanê' li dar xist. 21 Şaheser mane fînalê û bi dengdana 100 milyon kesî û bi berdewamiya 6 salan ev pêşbirk domandiye. Di encama dengdayînê de heft şaheserên cîhanê yên 'Nû' hatin hilbijartin. Lê belê UNESCO ji ber ku hilbijartin ne objektîf bû van heft şaheserên cîhanê yên nû nas nekirin.

Bêguman ev 7 berhemên ji dema antîk berhemdayîna mirovahiyê re bê mînak in. Lê belê Mezopotamyaya qedîm û bingeha wê Kurdistana qedîm gelek berhemên baş derxistine holê ji bo şaristaniyê. Ji bo şaristaniyê bûne bingeh. Diyarê Pêxemberan Riha bi her metreya xwe mînaka şaristaniyê ye. Him navenda wê him jî navçeyên wê bi xwe weke cihê şanoya dîrokî ye. Li hember şaheserên bi fermî hatine pesendkirî bi xwezaya xwe û hebûna xwe li ser piya ye. Weke abîdeya şaristaniyê ye. Herana ku bi şaristaniya xwe tê zanîn di nav dîroka şaristanêyê de weke durreke bêhempa ye. Heran, tava di nava şaristaniya medeniyetan de ye.

**Herana germahiya agirî û durra bazirganiyê**

Zanyariya nivîskî di derheqê bajêr de cara yekem digihîje B.Z 2000î. Avakirina wê jî tê texmîn kirin ku B.Z 5000î de ye. Navê vî bajarî, nêzîkî 4 hezar sal e bêyî ku biguhere gêhiştiye roja me. Weke navê xwe dîroka îskana wê jî bê navber gêhîştiye dema me. Sumer, Aşûrî, Romayî, Bîzansî û hwd. bi dehan şaristanî ji deşta bê ser û ber a vî bajarî derbas bûne, di bin tava wê ya germ de keliyane. Mohra xwe li her deverên vî bajarî xistine.

Navê bajêr di dîrokê de cara yekemîn li ser tabletên di sala B.Z 2250 de ku li Eblayê hatine dîtin derbas dibe. Li ser tabletan navê bajêr "Ha-ra-an" derbas dibe. Li ser tabletên B.Z 2 hezarî de jî navê bajêr "Har-ra-na" an jî "Ha-ra-na" derbas dibe. Li gor tabletên Hîtîtan ku B.Z 2 hezarî de hatine dîtin de li gor rêkeftineke di navbera Hîtît û Mîttaniyan de Xwedayê Hîvê (Sîn) û Xwedayê Rojê (Şamaş) li Heranê bûne şahidê vê rêkeftinê.

> Navê bajêr di dîrokê de cara yekemîn li ser tabletên di sala B.Z 2250 de ku li Eblayê hatine dîtin derbas dibe. Li ser tabletan navê bajêr wek "Ha-ra-an" derbas dibe. Li ser tabletên B.Z 2 hezarî de jî wek "Har-ra-na" an jî "Ha-ra-na" derbas dibe.

Navê Heranê ji peyva "Heran- u" ku di zimanên Sumer û Akatî de tê wateya gerê, karwanê hatiye. Di hin çavkaniyan de ev bi wateya "Rêyên hevbir" an jî " Germahiya pilebilind" de jî derbas dibe. Qewmê Nûh ku di Qurana Pîroz de, cihê Herranî ku di Tewratê de derbas dibe û welatê Sabiiyan ev Heran e. Li gor dîrokzanên Îslamî Heran ji aliyê neviyê Keynan an jî birayê Brahîm Xelîl Aran ve hatiye girêdan. Elbet rastiya van fikran jî heye. Heran her çiqas xwedî hewayeke germ be jî, di dorpêça deştên Mezopotamya û Deryaya Spî de dimîne ev yek jî wê dike navendeke bazirganiyê. Bazirganiya ji Anadoliyê bo Mezopotamya, ji Mezopotamya bo Anadoliyê di ser Heranê de dibû û ev yek jî çand û dîroka Heranê dewlemend dike. Ji ber vê yekê jî rîvayetên di derheqê Heranê de dibe ku rast bin jî.

**Dibistana felsefeyê ya Heranê û Zaningeha yekemîn**

Zaningeha herî kevin a cîhanê Zaningeha Heranê li vî bajarî ye. Dibistana Heranê (Zaningeh) ku ji dema yekem ve heta niha li ser piyaye di sala 1976an de di vekolînan de derketiye holê ku beşek ji Zaningeha Heranê ye.

Ji aliyê din ve wergera pirtûk û xebatên feylesofên Yewnanî di serî de ji bo zimanê çandî yê herêmê Suryanî hatine wergerandin. Piştî Îslamiyetê jî ji bo Erebî hatine wergerandin û Zaningeha Heranê weke navenda wergerandinê xebat kirine.

Li cîhanê sê ekolên mezin ên felsefeyê hene. Yek ji wan jî 'Ekola Heranê' ye. Sabit Bin Kura ku berhemên matematîknas, bijîşk û feylesofên Yewnanan wergerandine Erebî ji Heranê ye. Battaniyê (Ewropaî jê re dibêjin Albetegni, Albatainus) ku mesafeya di navbera hîv û cîhanê de rast hesap kiriye, Cabir Bin Hayanê ku îddîaya feylesofên Yewnanî ku digotin atoma made nayê perçekirin red dikir û ev parçeya ku tê gotin ku parçe nabe eger bi enejiyeke mezin bê perçekirin dê bajarekî weke Bexdayê bi carekî ji holê rake û weke bavê (mûcîdê) atomê tê zanîn jî ji Heranê ye û li Zaningeha Heranê perwerdehiya xwe dîtiye. Her wiha alimê Îslamê Şêx Îbnî Teymiye ji vî bajarê dîrokî şaristaniyê ye. Ev kes çend ji wan kesên Heranî ku ji her devera cîhanê tên nasîn in.

Heran, li Mezopotamyaya ku Hîv, Roj û Gerstêrk pîroz tên qebûl kirin bûye navenda baweriya polîteîst ku çavkaniyên wê digihîjin Aşûr û Babiliyan Paganîzmê (Putperestiyê). Ji ber vê yekê jî Astronomî li Heranê gelekî pêş ketiye. Baweriya di dema Babiliyan de 'Sîn'a ku weke " Xwedayê Xwedayan" tê qebûl kirin bi sedansalan e didome. Di çavkaniyên Îslamî de Heranî bi navê putperest tên bilêvkirin.

Li hember pesendkirina navenda Kirîstiyaniyê ya Rihayê, Heran bûye navenda Sabiiyan. Di wê demê de Kirîstiyanan ji Heranê re peyva "Hellenepolîs" bikaranîne ku di wateya putperestiyê de ye. Kirîstiyanan li Rihayê hikumraniya xwe serwext dikirin. Lê li Heranê jî Sabiî şaristaniyeke cuda ava dikirin. Li ser bingeha dîrokî û zanistê Sabiiyan hebûna xwe li Heranê heta Piştî Zayînê(P.Z) sedsala 11.mîn domandiye.



Ji serdema pêşîn ve Zaningeha Heranê perwerdehî didome û gelek zanistên navdar ên cîhanê li wir perwerdehî dîtine. Di dema Hikumranê Abbasiyan Harun Reşit de 'Zaningeha Heranê' bûye xwedî navekî navnetewî. Li seranserê cîhanê kesayetên bi nav û deng li vê zaningehê perwerdehî dîtine û xebatên zanistî kirine.

> Zaningeha herî kevin a cîhanê Zaningeha Heranê li vî bajarî ye. Dibistana Heranê (Zaningeh) ku ji dema yekem ve heta niha li ser piya ye di sala 1976an de di vekolînan de derketiye holê ku beşek ji Zaningeha Heranê ye.

## Malên Konê Mozhingivî yên Heranê

Balkêşiya herî navdar a Heranê ew e ku malên dişibin konê mozhingivî ku bi pergala daxistinê hatine çêkirin in. Dîroka malên bi kumik weke yên bi ban kevnar in. Lêkolînên li Mûsil, Tiflis û Kibrisê hatine kirin derdixîne holê ku dîroka malên bi kumik digihîje sedsala Beriya Zayînê (B.Z) 6. Di serdema me de bi giştî li deverên Deryaya Spî bi taybetî jî li herêma Apulya ya Îtalyayê him bi bajarî him jî bi gundî malên "Turullo" ku dişibin malên bi kumik ên Heranê gelekî hene. Taybetmendiya van malan, bi emrê xwe xwedî dîrokeke kevnar in. Li deverên Mezopotamyayê û nêzî Deryaya Spî mirovahî rastî van malên bi kumik tê.


Malên tholos ku îro hê jî li herêma Heranê tên dîtin dişibin hêlîna mozhingivan bi giştî ne. Ev malên ku îro di bin parastinê de ne, ne hatine rûxandin û ne jî nûjenkirina wan hatiye kirin. Ev malên ku ji bo geştiyaran cihê meraqê ye îro bi giştî weke axur û kadînan têne bikaranîn. Mixabin ev jî derî li rûxandina van malan vedike.

Malên Heranê ku 150 – 200 salî hatine bikaranîn ji xweliyeke taybet li navxistina rûnê gulan hatine çêkirin. Ji derve ve weke kovikan xuya dikin û bi qayîşan bi hev ve girêdayî ne. Çargoşe an jî şiklekî nêzîkî çargoşeyî ne. Li gor pileya germa herêmê hatine avakirin û havînan hênik zivistanan jî germ in. Herî zêde 5 metre bilindahiya wan heye û 30 – 40 tuxla rêzkirî ne.

## Çanda Halaf

Çanda Halaf ku li Kurdistanê derketiye holê em dikarin bibêjin ji aliyê bav û kalên Kurdan ve hatiye afirandin. Cih û warên ku yekem car çandan lê teşe girtine: Şanidar, Jarmo, Girê Oylim, Titriş, Qotê Çemê, Zeviya Çemê, Tepa Gewrê, Ganj Dara, Hureyra, Deh Luran in. Ev cih û warên navborî jî tev li Kurdistanê di encama vekolînên arkolojik de derketine holê. Ev çanda ku ji dîroka mirovahiyê re bûye dergûş her wiha ji bo Kurdan jî xwedî giringiyeke mezin e. Mezintirîn mîrasa dîroka mîrovahiyê çanda neolotîk e ku li herêmê bi giştî bi sazî bûye. Tê dîtin ku gava herî girîng ya mirovahiyê, gava ku dîroka şaristaniyê derdixîne holê ji aliyê vê çandê ve hatiye afirandin.

Di vê çandê de îro hê jî li Deşta Heranê tholos ku arkeolog wisa jê re dibêjin û dişibin hêlînên mozhingivan sereke bûn. Taybetmendiyeke sereke ya vê çandê jî ew bû ku qir û qafên pijiyane ne. Dîtina wan malên bi qûbbe nîşana sazîbûna çanda Halafê li Heranê bicih bûyî ye.



## Berhemên girîng yên Heranê

Keleha Heranê
Deriyê Mecma
Mizgefta firdevs camûharran (sîn mabedi/perestgeh)
Girêkê harran
Şêx Yahya hayat-el heranî
Şikefta Bazda
Şikefta Senem
Karwansera han-el ba'rûr
Dêrana Şuayp